.

•

# *Ji Zend Avesta heta Zen bûdismê*

•

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

***Ji Zend Avesta heta Zen bûdismê***

Weşanên SORAN e
.
Berlin-2015
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-98166-86-7-4

.

**Ji zend avesta heta zen bûdîsmê**

Ku mirov ji kûve binerê, ya ku mirov dibînê ku piştî ku aqilê mirov pêş dikeve û pê de, di çerçoveya hewldana fahmkirina di wê de û bi wê re, wê pêş bikeve. Hewldana fahmkirina biaqil, wê bi demê re pêş bikeve. Aqil, her wusa, weke bihîş dîtîna hewirdor û xwezayê ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aqilê mirov, bi xwe re weke rastîyek têgînî ya di derbarê jîyanê de ya. Zerdeşt, aqil, weke beşek sêyemin ya bi laş û gîyanê re hanî ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de weyna aqilê mirov jî divê ku mirov bi wê re werêne ser ziman. Têgîna biaqil dîtinê, wê weke felsefeyekê bê. Her wusa, hewldana fahmkirina bi aqil, wê weke hewldanaka bi demê re ku pêş dikeve bê. Aqil, serûwana wê ya bi dîrokê re, wê bi jîyanê a ku mirov wê dijî re wê bide dîyarkirin. Li vir, rastîya aqil, her wusa giringa ku mirov wê bi jîyanê re hilde li dest û fahm bike.

Têgîn, li vir, weke aliyekî jîyanê ê bi têgîhî ya. Her wusa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku fahmkirina jîîyanê û ankû tevgerên mirov ên di jîyanê de wê bi aqil re pêş bikeve. Ew care pêşî ku mirov bi wê biaqil bi hişkir û pê de, wê ji wê û pê de, êdî pêvajoyên pêşketina aqil wê pêş bikevin. Mijara fahmkirina navaroka aqil, her wusa, têkilîya aqilê ku hatî ser ziman û jîyanê û hwd, wê weke mijarna di çerçoveya hizirkirinê de wê werina lêkolîn bin. Hewldana ´fahmkirinê´, wê weke aliyekî giring bê ku mirov wê werêne ser ziman. Zerdeşt, hizrên xwe bi ´avesta´ re hanî ser ziman. Berhema avesta, weke berhemeka ku temenê nerîna têgînên hemdem ên li jîyanê diafirêne bê. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku hewldana fahmkirina jîyanê û rastîya wê ya ku heyî li berçav, wê bê xwestin ku di avesta de werina ser ziman. Avesta, şîroveyeka bitêgînî ya aqilê mirov a. Di derbarê jîyanê, jîyankirina li jîyanê û hwd, wê rastîyê werêne ser ziman.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku avesta, şîroveyeka ku wê temenê serdemên pêşketina bi aqil û her wusa aqilê felsefîkî ku biafirêne bê. Fahmkirina avesta, li vir, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Şîrove û nerîna avesta, divê ku mirov wê baş fahm bike. Emê, di serî de, li vir, hewl bidin ku rengê şîrovekirina jîyanê a avesta werênina ser ziman. Di serî de, li vir, em hinekî jî divê ku li ser navê avesta re bihizirin û wê fahm bikin. Navê avesta, wê têgînek baş di derbarê têgîn û fahma avesta de bide me. Gotina avesta, dema ku mirov

wê dahûr dike, her wusa, divê ku mirov wê di serî de werêne ser ziman ku weke rengekî nerîna ji jîyanê ya. Gotina ´avesta´ gotinaka ji zimanê kurdî ya û wate ya wê, ´awayê te´, ´awirê tê´, ´(nerîn)e te, ´ave yê ji te´, ´aves(nerîna te) tê´, û hwd, a. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotina avesta´, wateya nerîn, ditin û fahmkirinê û ankû fahma ji dîtinê dihêne ser ziman. Bihiş dîtinê, dihêne ser ziman. Di nava kurdan de, dema ku bahse ´avesta´ dihê kirin, bi gotina ´zendê´ re bahse wê dihê kirin. Gotina ´zend´ û ankû ´zen´ di zimanê kurdî de wateya wê "şîrove" û ankû "şîrovekirin" a. Her wusa, ev têgîna bi şîrove û ankû şîrovekirin´ê re, giringîya wê ew a ku di çerçoveya fahma ji jîyanê û ankû hişkirina bi jîyanê re dihê ser ziman. Di vê çerçoveyê de têgîna şîroveyî, weke aqilek, hişek û ankû têgîneka ji jîyanê û ankû jîyanî dihê ditin û ser ziman.

Fahmkirina têgîne şîroveyê, wê bi gotina ´di kurdîya berê de bi ya ´zendê´ re wê bi têgîna hişmendîyeka jîyanî xwe werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku di zimanê kurdî de dihê gotin ´zend avesta´, dihê gotin, ´şîroveyek´,, ´nerînek´, ´şîroveyek ji dîtinê´ û ankû ´nerînê´, ´dîtinek(şîroveyek) ji jîyanê´, ´´hişê jîyanê´ û hwd bi xwe re dihêne ser ziman. Di kurdî de dema ku bahse hzrên zerdeşt dihê kirin, bi gotina ´zend avesta´ re bahse wê dihê kirin. Gotina, ´zend´, têgîne şîroveyê dide me.

Li vir, em divê ku bi kinasî jî bê, gotina ´zend´ û ya ´avesta´, hinekî din jî hildina li dest. Her wusa, em pêşî gotina ´zend´ hildina li li dest. Bi demê re gotina ´zend´, dema ku bahse wê dihê kirin, dem bi dem ´d´´ya li dawîya wê dengê wê ne hatîya derxistin. Tenê weke ´zen´ hatîya xwandin. Di vê çerçoveyê de weke gotineka ku qasta wê şîrovekirina ji jîyanê bi pêşketina aqilê mirov re dike. Emê, vê têgîna ´şîroveyê´, weke ku em ji zend avesta´ fahm dikin, emê ji aliyê hundûrîn û dervayîya wê jî bisekin in. Ev aliyên wê jî, bi têgînî û felsefîkî li ser wê divê ku mirov bisekinê. Ji vê yekê jî, mirov wê baş fahm bike.

Têgîna Zend´ê, dema ku mirov bi wateya wê ya şîroveyî li dihizirê, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku li ser kokên kurdî ên weke ´ze´ û hwd, re wateya ´zayînê´ û ankû bûyînê jî, wê bi xwe re werêne ser ziman. Za´, weke rengê vê kokê ê ne tawandî, wateya ´ji dayikbûnê a di xwezayê de bi awayekî vekirî wê bide me. Heta roja me jî, dema ku di nava kurdan de bahse sawalên ku di nava xwezayê de çêlîkên wan çê dibin, ji wan re tê gotin "za ya" û hwd. Têgîna za´bûnê, di bi zindiyên di nava xwezayê de re dihê hanîn li ser ziman. Her wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku zend, li ser vê kokê, wateya şîroveyeka ku di

temenê xwe de za´bûnê, bûyînê û hwd dihawêne, dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de wateya zend´ê, divê ku mirov wê bi teybetî kifş bike û werêne ser ziman. Li ser gotinê re jî zend, weke ku ji di kurdî de mirov bi wê re fahm dike, pirr-wateyî bi wê re heya. Li ser gotinê re ´ze´, ´zen´, ´en´, ´za ên´, ´end´ û hwd, bi xwe re dihêne ser ziman. Ze, bûyîn û ankû zayînê dihêne ser ziman. ´Zen´, şîroveyek bi bûyînî û ankû zayînî dihêne ser ziman. ´En´, ya ku tê û ankû ´yek´ê dihêne ser ziman. `End´ jî, di hundurê demê de bahse hatinekê dike. Her wusa, li ser wateyê re jî, mirov bi heman rengî têgînên din ên nû jî fahm bike.

Têgîna Zend´ê, şîroveyeka ji jîyanê bi xwe re dihêne ser ziman. Teybetîya vê şîroveyê, mirov divê ku bi ´hiş´kirinê re werêne ser ziman. Her wusa, şîroveya ji jîyanê, wê weke dîmenekî wê yê din ku mirov bi aqilê xwe dîtîya bê. Şîroveya jîyanê, her wusa, li vir divê ku mirov wê werêne ser ziman ku pêşketina hiş re dihê kirin. Hiş, aqil a. Aqil, weke têgîneka razber ya ji jîyanê ya. Hewldana fahmkirina aqil û navaroka wê, weke armanca zelal kirina wê razberîyê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku fahmkirina navaroka wê aqilê û ankû dîtina wê, wê weke mijaraka vê şîroveyê jî bê ku mirov divê ku wê bike bê. Dîtin, piştî ku bi hiş pêşket û pê de, weke ´tiştekî´ di jîyanê de êdî bû xwediyê heyînê. Li ser vê heyînê re dema ku mirov dihizirê, her wusa wê weke têgîneka ku hin bi hin têgîna gîyanê jî, bi me re bide bitêgîn kirin bê. Ev têgînkirin, wê tenê, weke afirîna aqilê gîyanê bixwe bê. Piştre jî, wê êdî ew aqilê gîyanê, wê hebûna têgînê, bike ku bi xwe re werêne ser ziman. Li vir, têgîna weke ya ´hizirkirina gîyanê´ û ankû ´aqil ji gîyanê´, wê di vê çerçoveyê de hizirna bidina me. Her wusa, weke hizirna ku biriqîna ji vê hizra razber ya ji jîyanê a jîyanî bê. Li vir, ´pirsgirêka´ fahmkirinê, wê êdî bi demê re li ser wê têgîna gîyanê û aqil re biafirê. Bi wê aqilê re fahmkirina jîyanê, wê di temenê vê têgîna pirsgirêka fahmkirinê de bê. LI gorî jîyanê fahmkirinê wê, û ankû li gorî wê fahmkirina jîyanê û hwd, wê weke têgînna ku mirov werêne ser ziman bê. Bûda, Tao, Konfîçyûs û hwd, wê di vê çerçoveyê de li ser rengê hanîna jîyanê li ser ziman bin.

Di felsefeya zerdeştîyê ku zerdeşt bi zend avesta re dihêne ser ziman, dike ku jîyanê bixwe û bi serê xwe fahm bike. Di vê çerçoveyê de li navaroka jîyanê dihizirê. Hewldana fahmkirina jîyanê bi rastiyên wê ên ku hena di wê de re, wê weke cewherê vê fahmkirinê bê.

Rastîya şîroveya Zend avesta, hinekî jî di vê çerçoveyê de xwe dide dîyarkirin. Zend avesta, weke navê xwe şîroveyeka ji jîyanê bi xwe re

dihêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê rastîyê bi wê re werêne ser ziman ku fahmkirina ji jîyanê, wê weke aliyekî giring vê felsefeyê bê ku mirov divê ku wê werêne ser ziman bê. Felsefeya Zerdeştîtîyê, heta roja me, tenê bi têgîna dûalîteya gîyan û laş re de hatîya hanîn li ser ziman. Di zivr(çerx)a laş û gîyanê de li jîyanê nerîn, wê rengekî têgînî ê fahmkirinê werêne ser ziman. Lê dema ku mirov di çerçoveya heman felsefeyê de weke ku Bûda kir û nerî û hwd, ku mirov binerê, bi jîyanê re mirov wê rastî dîmenekî din ê bi fahmkirina bi aqilê xwe re werê. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku aqilê, mirov di wê re nerîn dema ku pêşket û pê de, êdî zêhn rû dide. Her wusa, weke kirdeyekê têrkerî hiildana zêhnê li dest, wê weke beşek sêyemin hildana aqil li dest bi laş û jîyanê a ji aliyê Zerdeşt ve wê bêne bîra me. ..

Di derbarê şîroveya zend avesta de, dema ku mirov dihizirê, her wusa mirov bi têgîna jîyanê re bi wê re hûr û kûr diçê. Li vir, mirov, vê rastîyê jî li vir kifş dike ku jîyan û hişê wê û ankû aqilê, wê, mirov bi vê re kifş dike. Zerdeşt, di wê hizrê, têgînê û bawerîyê de ya ku hemû dîyardeyên jîyanî ên kku hena û bi hebûnî na, wê di nava aqil de xwe bi wate bikin. Wê, ew werina ser ziman. Di vê çerçoveyê de li ser wan hizirî ya. Nerîna li jîyanê, wê di vê çerçoveyê de xwe bide dîyarkirin. Li vir, di serî de divê ku mirov vê rastîyê jî werêne ser ziman ku şêwayê hanîna li ser ziman a Zerdeşt û aqilê wî, di wê çerçoveyê de bi hebûnên di jîyanê de re xwe dihêne ser ziman. Yanî, dîyardeya wî aqilî jîyan û navaroka wê ya.

Li vir, li ser rengê hîyererşîya hizirkirina Zerdeşt a bi rengê ku di zend avesta de dihêne ser ziman de re jî divê ku miirov werêne ser ziman ku weke ´beşek sêyemîn´ hanîna li ser ziman a aqil bi laş û gîyanê re, wê her wusa, hinek xosletên vê rengê hizirkirinê bi teybetî bi xwe re werêne ser ziman û bi me bide fahm kirin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna aqilî, di vê çerçoveyê de dema ku wê bi serê xwe wê hildina li dest, wê çaxê, weke navendek ku hebûn aqil û û afirîna wê dide dîyarkirin, êdî tenê ew jîyane ku ew bi xwe re û di xwe de dihêne ser ziman dimêne li holê. Di vê çerçoveyê de hanîna li ser ziman a aqil, wê aqil, di çerçoveya hebûna jîyanê de bi xoslet û teybet bike.

Aqil û jîyan, li vir, êdî weke dûaliteyekê wê xwe bide dîyarkirin. Ev dûalîte, li ser ditin û hiş re bi nerîn û hanîna li ser ziman re dihê ser ziman. Di nava jîyanê de hertişt ku weke xwe were hanîn li ser ziman, di vê çerçoveyê de wê weke xosletê pêşî bê. Her wusa, têgîna aqil, li vir, mirov dibînê ku bi têgîna zend avesta re afirî ya. Zend avesta ku weke

şîroveya dîtinê û ankû jîyanê, bi xwe re bi wate dike û dihêne ser ziman, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi rastîya wê re werêne ser ziman. Di çerçoveya têgîna aqilê zend avesta de ti tişt ne dervî aqil a. Lê bi tevgerên jîyanî ên di jîyanê de re xwe dide hanîn li ser ziman û pêşxistin.

Watekirina tevgerên jîyanî û çûn û hatinên di wê de, wê her wusa weke aliyekî giring ê vê têgînê bê. Têgîneka ku bi aqil tevgerîn çawa dibê û ankû dihê fahmkirin, wê hewl bê dayîn li ser tevgerên jîyanî re were biwate kirin. Tevgerên jîyanî, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku aqil û têgîna wan diafirê, her wusa, wê bi wê re weke aqilekî bin. Her tevger û çûn û hatina di jîyanê de, dema ku mejiyê me bi aqilê me re dibînê, wê êdî weke têgînek aqilî ya jîyanî xwe bide dîyarkirin. Li vir, bi gotinaka din, dema ku mirov bibêje ku dema ku mirov bahse tevgerîyê bike, mirov weke ku bahse aqil û pêşketina wê jî dike. Her tevger, mirov nikarê bibêje ku bi mirov re bi hiş bûya. Her wusa mirov dikarê bibêje ku mirov bi aqilê xwe li ser xwezayê re ya. Divê ku li hemberî xwezayê dilnizm bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku aqil, li vir, dema ku mirov wê bi jîyanê re bike ku fahm bike, her wusa, weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov li ser wê bisekinê ya. Ji tevgerê û heta tevgerê, fahmkirina wê ahenga biaqilî, wê di vê çerçoveyê de di xateka aqilî de ya ku pêş dikeve de bê. Dualîteya di nava nerîn û jîyanê de ku heya, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê bibîr bike. Her wusa, divê ku mirov wê werêne ser ziman ku têgîna jîyanê, li vir, weke ku mirov bi aqilê wê re dibînê, hertişt bi sebeba xwe re dihê li holê. Hertişt, dema ku bû û ankû ku hebû û afirî, wê bi sebeba wê re bibe. Minaq, weke ku dema ku mirov birçî dibe, mirov xwarinê dixwê. Dema ku mirov diwastihê, mirov dirûnihê û ankû **dirazihê**.

Mirov bi aqilê xwe, her wusa jîyane xwe fahm dike. Fahmkirina jîyanê bi aqil, wê di destpêkê de, têgîna ´kirdeyî´ bi xwe re weke mijaraka têgînî, felsefîkî û her wusa aqilî a giştî, wê derxe li holê. Li vir, divê ku mirov vê yekê di serî de baş fahm bike ku hewldana fahmkirina jîyanê û di wê de mirov, wê di vê çerçoveyê de giring bê. Ahenge di nava mirov û mirov, mirov û jîyanê, jîyanê û xwezayê û hwd de, wê bi têgînî mijarak lêgerîn û lêkolînên ku werina kirin bin. Her wusa, Dema ku em bahse şîroveya jîyane dikin bi gotina ´zend´ê re, her wusa, ji aliyekî ve jî di kevîya mejiyê me de, zindî dibê ku bi hiş êdî ditin û fahmkirinê jî dike bîra me de. Li vir, dema ku em di çerçoveya têgînek felsefîkî weke ya ´zend avesta´ de bahse şîrove(zend)yê bikin, em divê ku di serî de

werênina ser ziman ku têgîna şîroveyê, wê bi xwe re weke dîmenekî jîyanê bide dîyarkirin.Êdî herwusa,hewldana fahmkirina wê şîrov(zendê)yê biserê xwe, wê ew jî weke mijarakê xwe bide dîyarkirin.

Li vir dema ku em têgîna ´zendê´ di vê çerçoveyê de bi têgîna şîroveya jîyanê de werênina ser ziman, em bi wê re êdî kifş dikin ku weke dîmenekî din ê jîyanê ku bi xwe re û di hundûrê xwe de dihawêne, derdikeve li ber me. Fahmkirin, bi serê xwe weke mijaraka têgînî ya felsefîkî ya di vir de.

Mirov, dema ku di nava jîyanê de dijî, wê çawa û bi çi awayê bijî, li wê dihizirê. Her wusa, têgîna jîyankirina jîyane xwe, wê weke mijaraka sereka ku mirov wê fahm bike bê. Mirov, di nava jîyane xwe de bi gelek, xoslet, teybetî û aliyên xwe re dijî. Di vê çerçoveyê de gelek tevgerên mirov dibin. Mirov, wan tevgerên xwe salix dike û dike ku wan fahm bike. Li vir, dema ku em bahse fahmkirina tevgeran di jîyanê de bike, wê bi du awayan derkevina li ber me. Tevgerên mirov ên kirinî(piretîkî) û tevgerên mirov ên têgînî(tevgerên ne piretîkî) û hwd in. Minaq, di jîyanê de bi tevgerî weke çûn û hatina bi meşîna mirov a bi lingên mirov re mirov nikarê xewnê fahm bike. Mirov nikarê tirsê **weke wê fahm bike**. Dema ku mirov li vir bahse têgîna tevger li ser vê xate felsefeyê re bike, li vir divê ku miirov di serî de werêne ser ziman, heyîna dervî hişarîya me û ya di hundûrê hişarîya me de weke mijaraka ku mirov li ser wê bisekinê ya. Çendî ku aqil pêşketîya, ew tişt û ankû heyîna dervî hişarîya me ku hatîya hizirkirin, li wê hatîya hizirin. Mirov, têgînek û ankû aqilekî dervî hişarîya xwe hizirkiriya. Hewldaya ku xwe bigihêne navaroka wê. Wê çawa wê fahm bike û rast bibînê, li wê hatîya hizirîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman, hebûna têgîna evîn û hêzkirinê, hêst û raman, aqil û fahmkirin û hwd, li wan di vê çerçoveyê de hizirîn. Tevgerên mirov, ku mirov wan di xwe de dirûninê û li gorî wan tevbigerihê, wê li vir, weke mijaraka ku teybet bê ku mirov li wê bihizirê. Mirov wê tevgerên xwe çawa fahm bike. Mirov, dikarê tevgerên xwe tenê bi hişarîya xwe û aqilê xwe re fahm bike? Û an jî kû, divê ku mirov, dervî hişarî û aqilê me ku bi jîyanê re bi têgîneka din ya aqilî re ku divê ku mirov fahm bike? Çi wan dide dîyarkirin. Ev, wê weke mijaraka ku divê ku mirov li vir, li ser wê serî biwastêne bê.

Dema ku mirov bi awayekî hesanî dihizirê, mirov dibînê û fahm dike ku weke ku tevgerîna me, weke ku ancama aqilê me ya. Li vir, ev ku çend ancama aqilê me jî bê, em nikarin bibêjin ku di mejiyê me de di derbarê wê de hişarî bi tememî heya. Mirov, carna, tevgerna û ankû

bertekna dide nîşandin ku nikarê wan bi tememî fahm bike û ankû werêne ser ziman. Wê çi îzahê ji wan re werêne, li ser wê serî diwastêne. Li vir, rastîyeka aqilê me ya ku dervî hişarîya me xwe bi vê rewşê re dide dîyarkirin.

Her wusa, Di nava aqil de, dervî hebûna hişarê û di hundurê hebûna hişarê de, wê weke aliyna têgînî bin. Her wusa li vir, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hinekî li ser wê bihizirê. Zerdeşt, aqil, dema ku weke beşek sêyemin ji laş û gîyanê didît, her wusa di vê çerçoveyê de li aqil weke qotîyekê dihizirî ku di hundurê wê de bicihbûn dibê. .. Di vê çerçoveyê de Manî, wê ji aliyê fahmkirina aqil ve hinekî din Zerdeşt bi pêş de bibe. Manî, wê li ser rastîya aqil pirr zêde bihizirê ku wê werêne ser ziman. Her wusa, divê çerçoveyê de divê ku mirov di serî de fahm bike, li gorî têgîna Zerdeştî, aqil, weke ´rastîyeka serbixwe´ ya ku pêş dikevê dihê hanîn li ser ziman. Bi wê re jî, wê jîyan û her tiştê jîyanê di wê de bi têgînî xwe werêne ser ziman. Aqil, li vir, wê bi jîyanê re xwediyê çerçoveyekê bê. Her wusa, aqil, di vê çerçoveyê de dema ku mirov bi jîyanê re li wê dihizirê, weke ku Zerdeştî, wê dihênina ser ziman, wê weke têgîneka gerdûnî xwe bide dîyarkirin.

Ev têgîna aqilî ya weke ya gerdûnî, em di vê çerçoveyê de heta roja me jî, ku em li civatên kurdan dirûnihin, mirov wê kifş dike bi rengê hizirkirina wan re. Her wusa di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku bahse aqil bi bawerî dihê kirin, dihê gotin ku ´yazdan, aqil daya" ya. Lê dema ku dervî wê bi felsefîkî, bahse wê hatîya kirin ku were hanîn li ser ziman, hatîya gotin ku ´aqil, ji jîyanê dafirê.´ Li vir, têgîna bi afirîna aqil a ji jîyanê, wê temenê wê li ser dîtinên mirov ên ji jîyanê bê. Her wusa, çavên mirov, di temenê heyîna dîtinên mirov de ya. Çav, weke amûrekî giring ê bi wê re ku mirov ji jîyanê digirê ya. Her wusa hebûna aqil, divê ku mirov werêne ser ziman ku li vir, wê pêşî ew çawa were fahmkirin û piştre jî, wê çawa bi wê û ankû ´di wê de´ ku wê were hanîn li ser ziman, li ser wê dihê hizirîn.

Têgîna aqilperezî, temenê wê li ser rengê dîtina bi jîyanê re ya. Her wusa, weke ku mirov bi dîtinî ku di jîyanê de çawa dît û bi xwe re di mejiyê xwe de bicih dike, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê were hanîn li ser ziman. Di rengê hizirkirina Zerdeşt de, ti tişt ne dervî heyîn û hebûna aqil a. Lê bi tevgerîyan re divê ku mirov li wê bihizirê û werêne ser ziman. Fahmkirina tevgeran û ahange di nava wan de û her wusa, bandûra wan ya li hevdû û ankû ji hevdû, di vê çerçoveyê de weke mijaraka ku li ser wê serî hatîya

wastandin a.

Tevger û aqil, dema ku mirov hilde li dest, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke mijaraka ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bihizirê ya. Her wusa divê ku mirov wê werêne ser ziman ku tevger, salixkirina wan, wê weke aqilekî hişarî jî xwe bide dîyarkirin. Fahmkirina naqşaya tevgerên mirov ên ku mirov dide nîşandin di mejiyê mirov de, wê weke jîrîyeka zêhnî ya mirov jî bê. Her wusa li vir, wê têgîneka dewrûdayîmîya aqil bixwe jî bê.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aqil û tevger, di vê çerçoveyê de li ser aqil re weke ku Zerdeşt li wê dihizirê, di çerçoveya hişarî û nasînê de mirov dikarê bahse wê bike. Dema ku mirov li rengê hizirkirina Zerdeşt dihizirê, mirov wêre nakê ku gotina ´hoyandinê´ bo têkiliya nava aqil û tevgerê werêne ser ziman. Li vir, ´dervî aqil jî hebûna tevgeran´, wê weke aliyekî din ê ku mirov bi aqilê xwe kifş dike bê. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku tevger, weke heyîneka serbixwe xwe dide dîyarkirin. Ya ku tevgerê li xwe dihoyêne(hoyandin) jî wê jîyan bixwe bê. Vê yekê li ser têgîna darêjkê re jî dihêne ser ziman. Darêj, valahiyekê dihêne ser ziman. Ji wê ne cûdatira. Lê valahî jî, wusa ya û ji wê ne cûdatira. Bi heman rengî, li ser vê têgîna darêjkê re bahse afirandinê û bûyînê dihê kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov gotinekê li ser têgîna gûharînê re jî bibêje. Bi vê têgînekê re ya ku dihê dîtin û fahmkirin ku ti tişt ne pêdandî ya. Her tişt, bi şert û merc û sedeman ve girêdayî ya. **Her** wusa bi jîyandina jîyanê re wê ew xwe bide dîyarkirin. Li vir, jîyan û tevger, weke du rastiyên ku mirov divê ku bi hevdû re hilde li dest in. Lê li vir, divê ku miirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku weke ku mirov bi têgîna Zerdeştî û şîrove(zendî)ya wî re dibînê jî, hertiştî di xwezayaka ne jidahî de di hundurê têgîna jîyanê de weke ku dihilde li dest. Ev têgîna xwezabûnê, divê ku mirov hinekî li wê bihizirê û bike ku wê fahm bike.

Li vir, tiştekî ku heya, divê ku mirov bahse xwezaya wê bike. Xweza, li ser heyînê û hebûna wê re xwe bi wate dike. Bi wê re jî, dema ku mirov bi aqil li wê dihizirê, her wusa aqilê xwezayê jî, di wê çerçoveyê de divê ku mirov bi wê rehetî û xwezayîya wê re li wê binerê û bihizirê. Ev jî, weke ku çawa ku mirov li rehetî û xwezayê dihizirê ku mirov di hizirkirin(zendîya)a xwe de jî ku rehet û xweza bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna jîyanê, bi heyîn û hebûna wê re, wê têgîneka ´xwezayî ya jîyanê´ jî bi xwe re bide fahmkirin. Li ser wê fahmkirinê re dema ku mirov li wê dihizirê, her

wusa divê ku mirov wê vê yekê jî bi wê re werêne ser ziman. Xwezaya heyînê, bi hebûna wê re ya.

Ya ku li vir, mirov hinekî jî bi **dilber** dike di dema hizirkirina wê de têgîna gûharînê ya vê felsefeyê ya. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werêne ser ziman ku hertimî, liv û tevger di jîyanê de xwe dide dîyarkirin. Li wê re gûherîn di jîyanê de heya. Her wusa, di xwezayê de ti tişt weke xwe namêne. Xweza, digûherê. Demsalên ku tên û di buhûrîn, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke aliyekî giring ê vê rastîyê ya.

Divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna xwûdê, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov dibînê ku bi vê rengê aqil û hizirkirinê, weke aliyekî sêyemin(gîyan) ji laş û aqil cûda li wê dihizirê. Jîyane, weke şenberîyeka ku yazdan jî di wê de û ankû dervî wê dijî ya. Çendî ku yazdan bi têgîna afirandinê dihê hanîn li ser ziman jî, di vê çerçoveyê de bi jîyanê re bi aqil di ahengekê de dihê hanîn li ser ziman. Rastîya aqil, weke ku Zerdeşt jî li wê dihizirê, bi ´destpêka jîyanê´ re heya. Ya ku me mirovan hanîya ser ziman, ya ku bi hiş **bûya** a bi **me** re ya.

Li ser rengê hanîna li ser ziman a têgîna zerdeştîtîyê a felsefîkî ku mirov dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de mirov aqil weke têgîneka ´şenber´ ya li jîyanê wê kifş dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov çawa li jîyanê dinerê û wê dibînê û her wusa çawa wê dixwêne, di vê çerçoveyê de wê aqil, weke têgîneka şenber ya temen bê. Hizir, li vir, dema ku mirov wê di hilde li dest, mirov bi wê re jîyanê dibînê. Her wusa, rengê dîtina ku mirov bi aqil re ya.

Aqil, weyna wê di dîtin, nerîn û her wusa fahmkirin de, wê giring bê. Temenê nerîna ku mirov a li jîyanê, gavavêtina mirov û hwd, ew wê bide dîyarkirin. Aqil, weke ku di Zerdeştîtîyê de jî bi ´zend´ê dihê hanîn li ser ziman, şîroveya ji jîyanê ya. Ev têgîna şîroveyê, weke têgîneka şîroveyî ya teybet divê ku mirov li ser wê bihizirê. Her wusa, ev têgîna ku em bi gotina ´zend´ê re bi wateya şîroveyê re dibînin, her wusa, di çerçoveya fahmkirina felsefîkî û hwd de jî, di wê de gelek wateyên din ên ku divê ku mirov wan li vir kifş bike wê hebin.

Têgîna zend´ê di kurdî de jî bi wateya ´şîroveyê´ ya. Mirov dikarê vê têgîna şîroveyê, weke têgîneka bi rengê ´şîroveya ji jîyanê´ jî bixwêne. Li vir, gotina ´zend´ di kurdî de dema ku mirov li ser koka wê dihizirê, her wusa, wê têgîneka heta ku herê gotina ´zanînê´ ku li ser heman kokê ya, wê bi xwe re werêne ser ziman. Li vir, bo fahmkirinaka baş, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku gotina, zanînê, koka wê li ser ´za´

ya. Rengên tawandina gotina kokî a ´za´yê, bi rengên weke ´ze´, ´zê´, ´zî´, ´zi´ û hwd re mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, li ser wê re bi heman rengî, dema ku mirov dike ku wê fahm bike, mirov gotina ´zend´ê di çerçoveya têgîneka ´zanînî´ ya bihiş de jî wê dixwêne. Her wusa, weke gotina koka ´zend´ê ´ze´, koka ´ronahîyê´ dihêne ser ziman. Her wusa, dema ku bi ´zen´ê mirov bike ku wê fahm bike û werêne ser ziman, her wusa mirov bibînê ku ´zen´, dikeve wateyên weke ´zen kirin´ ê û hwd de jî. `Zen kirin´, li ser têgîneka zanînî re têgînên weke ´întîba´, şibandin´, û hwd bi xwe re bi rengekî têgînî û nirxî dihêne li holê û dide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku zend, di vê çerçoveyê de weke ku di kurdî de dihê dîtin ku mirov bi wê re kifş dike ku bi rawêjî zend, şîroveyeka ku di keviya meji de gûmanê jî bi xwe re dihawêne dihêne li holê. Li vir zen, hinekî jî, vê temenê û têgînê dide dîyarkirin. Zen, her wusa weke aqilekî şîroveyî ê jîyanî xwe dide dîyarkirin.

Li vir, dema ku mirov bahse têgîna zend(şîrove) bi aqilî dike, mirov weke dîmenekî jîyanê weke ku bahse wê dike. Her wusa mirov di kûve li jîyanê dinerê, mirov wê dibînê. Teybetîya vê şîroveya zendî ew a ku weke neynikekê ku mirov di wê binerê û bibînê ya. Mirov, dema ku di neynikekê re dinerê, mirov xwe dîbînê. Her gavavêtin û hal û rewşa xwe ya ku di wê de û dike dibînê. Her wusa, mirov bixwe bi mejiyê xwe dibînê ku mirov çawa ya. Mirov, hal û tevgerên xwe dibînê.

Li vir, dema ku mirov di çerçoveya vê têgîna felsefîkî de dinerê, mirov hal û tevgeran û her wusa rewşa wan ya nirxî û sentetîkî giring dibînin. Li ser tevgeran re fahmkirina rastiyê, wê weke aliyekî giring bê. Minaq, weke carna kurd dibêjin, ´li rewşeka pirr cidî nîşandina nêzîkatîya pir sivîk´, weke tevgerîyeka ne li gorî rewşê dihê şîrovekirin. ´Ku karekî mirov ê ku divê ku mirov bilez bigihiyê de û ku mirov hêdîka herê û dereng bimêne, wê ew weke ne gihiştinekê tenê nemêne.´ Li gorî rewş û têgînan, nîşandina nêzîkatî û tevgeran, her wusa, di çerçoveya ahenge rewşan de divê ku mirov werêne ser ziman. Mirov, dema ku ji dil bişahî û kêfxweş bê, wê tevgerên xamgînîyê xwe bi mirov re nedina nîşandin. Dema ku mirov digirî, mirov nakenê. Mirov nikarê ken bi tevgerîyeka dilêşî re werêne ser ziman. Êş jî, weke hêsta hijkirinê û ya Mîhrîvanîyê xawênîyê dihênin ser ziman.

Di jîyne mirov a asayî de mirov pirr zêde rastî wê heya. Ku bîrînek piçûk û ankû mazin ku di laşê mirov de hebe, mirov bi wê nakêne û

dilşahîyê nadê nîşandin. Mirov, êşê dikişêne. Bi wê êşa ku dikişêne, wê tevbigerihê û bertek û tevgerên xwe **bide nîşandin**.

Dema ku mirov bahse jîyane bike, divê ku mirov jîyandina di nava wê de bike. Her wusa, di hundurê jîyanê de jî heyînên ku hena, bi wan re bahse wê bike. Di Zerdeştîyê de dema ku şîroveya jîyanê pêş dixin, her wusa, jîyane weke şenberîyekê û heyîneka heyî wê şîrove dikin. Li ser kifşkirinên di jîyanê de ji aliyê têgînî û felsefîkî ve baldayîna li ser wê ahenga jîyanê, wê weke aliyekî giring ê vê rewş bê. Têgîna xwûdê, di nava jîyanê de jîyane wê, weke aliyekî ku divê ku mirov di vê çerçoveyê de li ser wê bihizirê. Her wusa, têgînên weke bi ´ahrîman´ û ´ahûra mazda´ re wê, wê çend ku weke aliyekî dûaliteyî jî bê, wê çerçoveyeka fahmkirina jîyanê ya bi têgînî bi xwe re bide dîyarkirin.

Ji hevdû cûdakirina bi teybetî a di nava jîyanê de wê li vir, weke aliyekî giring bê ku mirov li ser wê bisekinê bê. Zerdeştî, wê li ser vê re giringîya fahmkirinê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku zêhnê mirov weke nirxeka giring û têgînî ya. Wê di nava jîyanê de temenê fahmkirina mirov bê. Bi têrkerî heyberîya tiştî û her wusa bi kirdeyî razberîya wê ya têgînî, her wusa, li vir, bi wê dûaliteya ku mirov wê werêne ser ziman, wê temenekî têgînî ji me re bide dîyarkirin. Jîrî, weke ku di nava kurdan de heta roja me jî bi nirxî bahse wê dihê kirin, wê weke têgîneka tevgerî ku bi tevgerê re dihê hanîn li ser ziman a. Jîr, ji mirovê jîr û ku dikarê di cih de fahm bike û derxê têgîhiştinê re dihê gotin. Em divê ku di vê çerçoveyê de weke zêhnê jîrê jî, bi darêjkê re werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de jîrî, li ser tevgerîyê re bi kirdeyî, weke rengê tevgerek zaneyî ya bi fahm a.

Hinekî jî, dema ku mirov ji aliyê şîrove(zend)yîya têgînî ve li wê dinerê, mirov di vê çerçoveyê de bi giringîya wê re êdî wê fahm bike. Li vir, dema ku mirov ji vê aliyê ve li şîroveyê û ankû li zendê´ dinerê, mirov wê weke têgîneka hem fahmî û her wusa weke têgîneka rewşî jî mirov wê kifş dike. Zend, weke têgîneka felsefîkî ya jîyanî ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke têgîneka jîyanî ya. Bi têgîneka zendî, dema ku mirov dinerê, li jîyanê weke dahûrvenek mirov rastî vê rewşê tê. Mirov, bo ku jîyanê û ankû rewşê fahm bike, wê dahûr dike. Her wusa, Fahmkirina ji jîyanê, wê weke dîmenekî têgînî ê dîtinî bê.

Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku Naskirin, temenê wê li ser hişkirinê ya. Li vir, bo fahmkirina vê fahmkirinê, mirov dikarê vê yekê werêne ser ziman. Têkilîya di nava naxweşekî û bijîşkekî, mirov

dikarê weke minaq bide. Bijîşk, wê bike ku rastîya nexweşîyê ya bi mirov re fahm bike. Bo vê yekê, wê hewl bide ku rewşê fahm bike. Wê hewl bide ku zanibê. Derûnvanekê, wê bike ku bigihê temenê destpêkê ê ji wê neşxweşîyê destpêkirîya. Ev, wê weke rewşa fahm kirinê bê.

Bijişk, wê nexweşê xwe dahûr bike. Di mejiyê xwe de, wê dîmenekî di çerçoveya zêhnê xwe de bo fahmkirinê derxe li holê. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku dema ku em bahse bijîşk û nexweş bikin ku herdû jî zîndî na, wê çaxê, weke ku çawa ku bijîşk, wê dahûrîyê dike bo fahmkirinê, wê nexweş jî, bi dîtin û fahmkirina xwe, di mejiyê xwe de bijîşk dahûr bike. Ew jî, wê çerçoveyeka zêhnî ya bi dîmenî di mejiyê xwe de derxe. Her gotinên ku werina gotin, wê li wan û ahenga nava xwe û rewş û her wusa bijîşk û xwe de bi wan bike ku bihizirê û fahm bike. Fahmkirin, di aslê xwe de, li vir, weke bijîşkvanê herî giring a li jîyanê ya. Dema ku mirov fahm dike, mirov dike ku bersivê bide. Mirov dikarê vê bişibêne, pirsekê. Dema ku mirov pirsê baş fahm bike, mirov wê bersiva wê jî, bi wê fahm kirinê bide. Her wusa, pirs û bersiv, bi fahmkirinê re hena.

Li vir, weke xale pêşî, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi şîroveya zendê re giringîya fahmkirinê û rohnîkirina bi têgînî, divê ku mirov bin wê xat bike. Bo şîroveyê, ku mirov bike, weke xale din a pêşî jî, divê ku mirov bijî bê. Ankû serborî bê. Li vir, ew serborî, her wusa, weke jîyaneka hatî jîyîn, wê temenê wê şîrove(zendê)yê biafirêne. Weke têgînekê, li vir, mirov dikarê vê jî, werêne ser ziman. Farqê, di nava jîyankirin û fahmkirinê de, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman. Şîroveya zendî, teybetîya wê jî li ser jîyankirinê re fahmkirin a. Bo baş fahmkirinê, jîyankirina wê, bi giringîya xwe re derdikeve li holê. Her wusa, hîskirin û piştre hîskirin, di vê çerçoveyê de, wê temenê pêvajoyên fahmkirina şîroveyî a zendî bin. Bo vê yekê ya ku Zerdeşt, giringî bi dîtin, jîyankirin û piştre fahmkirinê li dûv hevdû daya.

Em dema ku li seer têgîna ´**zend avesta**´ dihizirin, her wusa di vê çerçoveyê de li jîyanê dihizirin, em dibînin ku wateya têgîna şîroveya zendê dide me, ew a ku mirov, pêşî bi serborîya xwe re hebûna jîyan û jîyandina xwe ku fahm bike, weke têgîneka hûnerî û têgîhiştinî jî radixe li berçav. Di vê çerçoveyê de weke şîroveyekê zend, ku temenê wê pêşî li ser fahmkirinê ya, divê ku mirov wê hilde li dest û werêne ser ziman a. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku weke ku mirov bi qarakterê Zerdeşt re jî kifş dike, giringîya têgîna azadî û azadbûnê, li vir, derdikeve li pêş. Heta roja me jî, di nava civatên kurdên

berê de gotinaka ku dihat gotin, weke gotina pêşîyan, hê jî dihê vegotin. Ew jî, ew a ku tê gotin ku ´bi zanebûn û fahmkirinê, mirov Azad a.´ Li vir, em divê ku hinekî li ser vê têgîna azadîyê ku li vir dihê ser ziman bisekinê. Li vir, mirov dibînê ku bi şîroveyî têgîna zend avesta, li ser fahmkirinê re weke ku di rêwîtîyeka dinava jîyanê de ya. Her wusa, çendî ku fahmkirin dibe, wê ewçendî jî bi wê re azadbûn û xortbûn xwe bide dîyarkirin.

Fahmkirin, weke aliyekî giring ê têgihiştinî, divê ku mirov li vir balê bikişêne li ser wê. Li vir, dema ku em li ser fahmkirinê re herin, wê çaxê, di nava têgîna fahmkirinê de têgîna zendê, weke heyîne vejenî ya jîyanî ku mirov wê bi jîyanê re û bi dîtina jîyanê re ku wê kifş dike, xwe dide dîyarkirin. Hêza jîyanê, her wusa, mirov dikarê, di vê çerçoveyê de bi wê gotina zendê´ ya di zend avesta re werênina ser ziman. Her mirov, hinekî jî, ew hêza jîyanê heya. Lê bo jîyankirina wê, şert û mercên xwe divêt. Mirov, dema ku di nava jîyane xwe de, ew derfeta jîyanê û xwe hanîna li ser ziman ne dît, mirov wê çawa bi wê re bijî, hinekî jî, fêrbûna wê ya di jîyanê de ya têgîna zend.

Mirov, çendî ku xwe nas dike, wê bi wê re hanîna wê li ser ziman bike. Ew vejene mirov, ya ku mirov xwe bi wê re dijî lê ku bi wê re derfet nedîtiya ku xwe werêne ser ziman, hinekî jî, di serî de di destpêka hanîna li ser ziman de kifşkirina wê jî, wê li vir, weke karekî fahmkirinê bê. Mirov, li vir, di nava wê wê fahmkirinê de, wê bi kîjan aliyê ve herê û rêya xwe bijêrê, di vê çerçoveyê de fahmkirina wê dûaliteya ´baş´ û ´ne baş´ ya bi ´ahrîman´ û ´ahûra mazda´ re wê giring bê. Li vir, gotina, kifşkirina ´aliyê xwe yê baş´, di vê çerçoveyê de, wê wateyeka wê hebe. Bo şahîbûneka ji dil, ew hêz û karîgerîya mirov heya. Lê mirov wê nakê. Carna jî, mirov ji nedîtî ve tê. Dilê mirov, dixwezê ku mirov bikenê û ji dil bertekekê bide nîşandin. Lê mirov xwe digrê. Mirov, nahêle ku keseyetîya mirov wê xwesteka xwe werêne li cih. Mirov, pêşîya xwe bixwe digirê.

Mirov, dema ku tiştekî di xwe de digirê, ew tişt di hundûrê mirov de zorê dide mirov ku mirov wê werêne ser ziman. Carna jî, ew tişta ku weke ´nepenîyekê´ û ankû ´sûrrekê´ ku mirov di xwe de girtî, wê bike ku mirov bertekna ku mirov weke ku ´ne di farqê de bê´ ku bide nîşandin. Her wusa, ev hemû, hewldanên xwe hanîna li ser ziman in. Mirov, di xwe de weke ku bûbê, du mirov û ankû du alî. Herdû, wê kêlîkê, bi hevdû re ne weke hevdû dihizirin ûû ankû ne di heman hizrê de na. Ji hevdû cûda bi têgîn in. Yek, weke ku li hemberê ya din bê. Di vê çerçoveyê de, wê

mirov, weke ku di xwe de bi xwe re tekoşîn bike, wê rewşa wî derkeve li holê. Zerdeşt, vê weke ´aliyê mirov ê baş´ û ´ aliyê mirov ê ne baş´ dihêne ser ziman. Her wusa, têgîna `ahrîman´ ku weke ´ne başîyê´ û ´ahûra mazda´ ku weke ´başîyê´, mirov dikarê li vir, bibîr bike û fahm bike. Di vê çerçoveyê de, dema ku ji aliyan ve li ser tevgerên mirov re ev hatîya şîrovekirin, weke têgîneka ´azwerîyê´ jî di temenê wê de lê hatîya lêpirsîn. Têgîna ´xirabiyê´ ew ne başî bi wî da kirin´ û ankû ´qanciyê´ ew başî bi wî da kirin´ û hwd, di vê çerçoveyê de li ser mêyl û xwesteka mirov re dihê ser ziman. **Mêl û xwestek**, bi azwerîyê re, dihên ser ziman. Her wusa, mijara mêl û xwestekan, weke têgînek felsefîkî ku li wê dihê lêpirsîn, wê pirr li ser wê were sekin in. Her wusa, dihê gotin ku ”di temenê azwerî´ û gelek hêstên weke wê de mêl û xwestek heya. Bi heman rengî, nexweşî û ne rehetî jî, di temenê xwe de hinekî têgîna nexweşî û mêlê dihawêne. Hin zanyar û fîlosofên vê xatê ku kirina ku Bûda û ankû serdemên berî wî fahm dikin, gotina ku ´dema ku mirov ji xwestekên di dilê xwe de dûrket, mirov wê rehet bibe.´ Hizrên weke ´xwe ji xirabîyan dûr bide sekinandin´ û ankû ´nehêle ku xirabî li wî serdest bibe´, wê weke têgînna ku li vir ku mirov wan kifş dike bin. Bi wê re, mirov dikarê hizre ´bi **edeb** bûnê´ û ankû ´**terbîye** kirina nefsa xwe´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de hizirna bidina me. Lê ev têgîn, ji wê zêdetirî, weke ku mirov di vê çerçoveya têgîna zendî û ankû zend avesta´ de ku kifş dike, weke ku di hundûrê mirov de vejeneka jîyanî û zindî hebe, wê hizrekê jî di serê me de bide çêkirin. Ji xwe, şîroveya zendî a di vê warê de, dihêne ser ziman ku mirov di nava alozîya di hundurê xwe de ya baş çi ya ji ya ne baş ku karibê vaqatêne, weke hizreke hîmî dihêne ser ziman. Ew hizra Zerdeşt a bi rengê ´alozîya hundûrînî´, wê weke hizrekê û têgînekê bi Bûda re jî xwe bicih bike û werêne ser ziman. Li ser vê re li aramîya navxweyî ya hûndûrîn lêgerîn di nava jîyanê de, wê di vê çerçoveyê de weke lêgerînekê xwe bide dîyarkirin. Zerdeşt, weke ku ew dibînê, xirabî û hizra xirabiyê, armanca wê heya ku tevlîheviyê çê bike. Ev ku di hundurê mirov de jî bê, wusa ya. Bo vê yekê, fahmkirina Ahûra Mazda giring a. Ji ber çi giring a? Ji ber ku mirov karibê, wê ya xirab nas bike û fahm bike û karibê xwe ji wê xilas bike.

Weke ku mirov ji vê hizrê û têgînê fahm dike, ew a ku di hundurê mirov de qancî jî û xirabî jî bi hevdû re dijîn. Her wusa, dema ku mirov jîyane xwe ya ku dijî binerê, mirov wê vê yekê jî kifş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman, xirabî û qancî, vajî hevdû na. Levnakin. Weke ku Zerdeşt jî dihêne ser ziman û Piştî re Bûda

jî dihêne ser ziman, ku mirov bi aqil û zanebûnî karibê tevgerîyên xwe bi fahm bike û li ser wan re karibê, xirabiyê têk bibe. Ew rêzkarî(**disîplîn**)ya ku mirov bi tevgerîyan re çê bike, wê li ser fahma qanciyê re bê. Her wusa, li vir, birêxistinkirina tevgerîyên xwe, wê hinekî jî, weke rewşna zêhnî û jîrî xwe li vir bidina dîyarkirin. Li vir, ya ku mirov kifş dike, ew a ku ti tişt ku ne dervî aqilê mirov a. Bi tevgerên mirov re jî, rastkirin û başkirina di jîyanê de, wê xwe bi fahmekê re bêne ser ziman. Tevger û ankû gavavêtin, her wusa, jîyandine mirov a di jîyanê de ya. Jîyan û fahmkirin, li vir, wê hevdû bi kirinan û hiş re bidina dîyarkirin. Kirinên mirov, wê fahmkirina mirov û ankû ne fahmkirina mirov a di jîyanê de bidina dîyarkirin. Kirin, her wusa sedemeka wan ya ku mirov werêne ser ziman heya. Weke ku xwarin bo jîyanê ya û hwd. Mirov, ji ber çi pêwîstî bi xewkirinê dibînê? Her wusa mirov, ji ber û di ancama çi de xewnê dibînê di dema ku mirov di razihê de? Her wusa, ev jî, weke rewşna ku mirov divê ku wan werêne ser ziman in. Xewn jî, rastîyna mirov ên jîyane, ku di temenê xwe de dihawênin. Rastîya jîyankirinê, di vê çerçoveyê de bi fahmkirina wê re wê weke mijara şîroveyên zend avesta bin. Her wusa, fahmkirina a jîyane xwe ya ku dijî, wê li vir, mijara sereka bê. Her kêlîk û tişta ku mirov ew jîya di jîyane xwe ya roja ne de, wê di derbarê jîyane de gotinek jî bê. Di serî de divê ku mirov vê yekê fahm bike. Kirina ku hatî jînkirin, wê rastîyeka jîyankirî bê. Ev rastîya ku hatî jînkirin, bi xwe re têgînekê jî li ser zindîtîya mirov a jîyanî re dide ku mirov wê kirinan bike. Kirin û jîyan, têkiliya wan, li ser jîyane mirov re bi hevdû re hena. Her wusa, kirin û jîyan, hinek jî rastiyên jîyane mirov a ku mirov wê dijî na. Ev rewşa, weke ku mirov di xwe de du alî ya, wê, di vê çerçoveyê de, weke rewşeka ku mirov di vê ku temenê wê jî li ser fahmkirinê re ku werêne ser ziman a. Di temenê ne weke hevdû hizirînê de, du hizrên cûda hena.

Di serî de, divê ku mirov li vir werêne ser ziman ku di vê çerçoveya wê dubendîya di nava mirov de, wê têgîna zendî ya şîroveyî, wê bixwezê ku fahmkirinekê û ankû rohnîkirinekê ku bi mirov re bide çêkirin bê. Her wusa, di nava wê dubendiya weke dudilî de ku mirov çawa û bi ´kîjan aliyî´ de berê xwe bide û tevgerihê, weke ´ya baş´ a, wê hinekî jî, weke mijara wê bê. Ew dûalîteya ku temenê wê li ser têgînên ´başî´ û ´ne başîyê´ ya, wê di serî de di vê xalê de zêdetîrî fahmkirinekê bi dilê mirov re bide me. Mirov, bi dilê xwe re çawa rehet a, ew weke ya ji mirov re baş a. Her wusa, mirov xwe çawa ji dil rehet û baş hîs dike, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov li ser wê bisekinê û

bike ku werêne ser ziman.

Li vir, têgîna zendê, hinekî jî, di nava vê dudilîyê de ku aliyê baş bê û ankû aliyê ne baş bê, koka wê başîyê û ankû aliyê baş li ser çi temenê ya û yan jî ku koka wê aliyê ´ne baş´ ku li ser çi temenê ya, weke mijaraka jîyanî ku dike ku bi jîyanê re di nava wê de kûr û hûr bi pêşketina zanîna mirov re pêde herê. Ya ku di aslê xwe de, wê nepenîya têgîna şîroveya zendê ku ji şîroveyên olî zêdetirî weke şîroveyek felsefîkî ku bi jîyanê re werêne ser **ziman** jî, wê **ev bê**.

Dema ku mirov bahse rastîya felsefîkî bike, divê ku mirov hinekî jî li ser kirde û heyberîya têrkerî re li vê rewşê jî bihizirê. Ji ber ku li vir, weke mijaraka giring, kirdeyetî û ankû aliyê mijarê ê teorîkî xwe weke aliyekî giring dide dîyarkirin. Her wusa, dema ku mirov aqilê mirov pêş dikeve û pê de, hewldana fahmkirina destpêka dûnyê û jîyanê, tişt û hebûna wê ya di jîyanê de, xwezaya xwûdê û her wusa vîn û keseyet û hwd, piştî ku pêş dikevin û pê de, wê weke ´tişt´na werina fahmkirin wê xwe bidina dîyarkirin. Di nava jîyan û kevneşopîya jîyane civatî û hwd de, hizirkirin û ankû hewldana fahmkirinê ya van rastîyan, wê xwe bide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov van mijaran jî baş fahm bikin, weke têgîneka felsefîkî, têgîna ´nakokîyê´ ku pêş dikeve, wê hinek bawermendên Zerdeşt, weke ´sînorê aqil´ jî werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de, piştre wê gelek zanyar jî aqilê xwe pêş bixin û werênina ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman, ku têgîna ´nakokîyê´ divê ku mirov baş fahm bike. Nakokî û ankû ´nenakokî´, weke du rewşên jîyanî ên vajî hevdû jî dikarê bi xwe re werêne ser ziman. Û ankû dihêne ser ziman jî. Li vir, dema ku mirov li ser nakokîyê dihizirê, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku nakokî, ne sînorê hizirkirina me ya. Lê nakokî, sînorê aqilê ne bi nakokî ya. Di vê çerçoveyê de ku mirov werêne ser ziman, wê rasttir bê. Ji ber ku bi nakokîyê re jîyan bi dawî nabê. Lê bi nakokîyê re ne bi nakokîya mirov bidawî dibe.

Di nava jîyanê de mirov bi dîtina xwe re kifş dike. Her wusa, li ser vê re mirov divê ku werêne ser ziman ku aqilê mirov, li ser kirinîyên jîyanê re bi wê hişmendiya ku dihê bidest xistin re weke ku xwediyê ceribandinekê jî ya. Aqil, bi dîtina xwe re ya ji jîyanê, ji xwe weke xwediyê têgîneka bi kirdeyî ya vêşarî a bi azmûnîyê re ya. Aqil, bi dîtina xwe re weke ku xwediyê têgîneka kirdeyî ya azmûnî ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têgîna felsefîkî a zend avestayî, her wusa, weke ku mirov wê dibînê, bi hişmendî ji temen ve li ser

hêstawarîyna ava ya. Bi jîyanê û jîyandinê weke rastîyekê jîyanê herêkirinê re ev felsefe, dibê xwediyê hinek rastîyna jîyanî ku mirov bi wê fahm bike na. Li vir, gûharînerîya jîyanî, her wusa, weke rastîyeka ku mirov li vir bibîr bike ya.

Bi dîtin û tecûbeyên mirovî ku mirov navaroka wan bi kirinan dadigirê û hwd re, têgîna zend avesta li jîyanê dinerê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku nêzîkatîya Zerdeşt a li aqil jî, di vê çerçoveyê de xwediyê wateyekê û zanînekê ya. Dema ku ew aqil, bi laş û gîyanê re weke beşa sêyemin dihêne ser ziman, bi ser wê ve jî dike ku wê bi jîyanê û jîyandina li jîyanê re wê navaroka aqil tişî bibe. Her wusa, jîyan, wê qayda wê di nava aqil de bibe. Aqil, rohnîya jîyanê ya. Aqil, di vê çerçoveyê de bi jîyanê re dihê hanîn li ser ziman. Aqil, li ser dîtina bi wê re ya di jîyanê de re rohnîya jîyanê ya. Em di vê çerçoveyê de divê ku werênina ser ziman ku rastîya hizirkirinê, wê dinava aqil de weke meşandina aqil bê.

Weke ku mirov di têgîna zendê de jî kifş dike, prensîbe wî herî girîng ya bilevkirina bi xwezayê re ya. Her wusa li ser têgînê re jî, ji aliyê olî û civaknasî ve, ku ku di her mijar û xalê de tevgerên xwe mirov biguharanê, hebûna wê hemûkî dike nava xwe de. Ji ya herî serî re, ji rastitiyê(realite) re berg dike û bawer dike ku tim mirovahî wê rastitiyê farq bike. Li gorî têgîna zendî, baweriya wê dojehê an ji lenetkirina ebedî nîn e. Tenê di ´Vaishnavvism Dvaita´ ye ku pêştî zayîn li sadsala 13. afirî de heya. Madhva, rewşa giyanê li sê beşan cudekiriya û aniya ser ziman. Ev şîrove bi Zerdeştîtîyê re wê piştre bi zen bûdîsmê û Hîndûîsme ku bi demê re pêş bikev re de jî bicih bibe. Ev hersê gîyan, weke ya ku gihiştîya qûdretê ku ya bi ya yazdana re dihê ser ziman a û Weke gîyanên gihiştina Mokşa jî ji wan re dihê gotin. Bi wê re ya duyem gîyana ´Nitya-samsarins´ ku di çapraza mirinê de mana û gîyanên ´Tamo-yogyas´ ku heta dawîya jîyanê ku wê di nava êş û azabê bê ku bijîn in.

Her wusa, divê çerçoveyê de mirov dibînê ku bi Zen bûdîsme re wê di nava olên hîndûyî de jî bi vî rengî wê bicih bibin. Em dema ku hewl bidin ku li ser ´lîteratûra´ zendê re bikin ku werênina ser ziman, divê ku bi serekeyî herî kêm, bi zen bûdîsmê re Hîndûîsmê jî di dewama piştre a Zerdeştîtîyê û ankû têgîna zend avesta de werênina ser ziman.

Weke hîmê nêrînan, hemû tê dîtin ku nêzîkatiya perspektife ya monîst û dûalîtî weke olên mezopatayayî ji xwûdeyekî weke ku di felsefe wê de tê ser ziman "deîzm" yek yazdantî, riyên pir-yazdanditiyê hemûkan erê dike. Hemûyan di nava rastîya jîyankirina di jîyanê de di hundûrê aqil de

dihêne ser ziman. Riya Hîndû, hêzdarî, ji zore dûr, tevgerên baş û rastitî, zagona wê têne ser ziman. Hemû "karma", paqijbûn û ta ku xwûde kifş bike her hebûn wê careke din bi laş bibe. Ev wê wilo domê. Ew parastgahên pir xweşik û di malên hîndû de, ew ola ku tişî rehetî û hûzûr, Metafîzîk û Yoga, awayê zanistê jî di afirêne.

Şîroveya Zendî, her wusa li vir, divê ku mirov bi mistismekê werêne ser ziman. Bi felsefîkî, weke olaka Mîstik a jî. Di vê têgînê de, hundûrê şaxsiyetê û rastîyê bi şaxsi tecrûbe bike, wê di dawiyê de xwûde û mirov bike YEK baweriya wê ye ku mirov digihêne asta wê ye herîbilind. Her wusa Zend avesta, bi felsefîkî têgîneka dûnyayê ye herî kevn a. Em berî Zerdeşt û her wusa bi Mîtra re pêşketina wê dibînin. Bi têgînên weke li ser Zerwan, ahrîman û Ahûra Mazda û hwd, re wê êdî kevtir herê. Serê wê, ne kifşe ku kengî bûya. Haya berî deme dîrokê ya ku tê nîvîsandin diçê. Her wusa Piştî pêşketina zend avesta re, têgînên weke zen bûdîsmê û Hîndûyîzmê û hwd, ku dîroka xwe haya ku berî zayînê û dîroka nivîsandî dibin, divê ku mirov hinekî jî di vê çerçoveyê de bi tecrûbe fahm bike û werêne ser ziman. "Vada"yên wê hatina nivîsandin, diçê berî wê. Berî zayîne di demên Pre-Harapa û harapa de Hîndûyîzm ola Şaristaniya Îndûsan bû. Ji vê demê ku maya hin şûnpê ji "Şîva"hatina dîtin. Yê ku wê avakiriya, bi nav nayê ser ziman.

Tiştên ku mirov di jiyana xwe de dike, hîs dike, û hizir dike, diyarde û lajwerdên wê, wê şaxsiyat û di paşarojê de tiştên ku bike û xosletên wî û baxtê wî wê kifş bike. Bi awayekî din ji li gor têgîna zend avesta ku mirov fahm dike û piştre ku di pirranîya bawerîyên ku di vê xxatê de ku bicih bûya jî, ku mirov di farqê de ji bê û ne di farqê de ji bê, mirov baxtê xwe kifş dike. Xwûde, ji wê baxtî, ku bandûraka "xirab" bike, mudahala nake. Wekî dî ji, tiştên ku di jiyana mirov de xirab dibin, di pişt wan de "xwûde" nîn e. Lê ku ji xwûde re ji dil û di hundur de ber(dua) bê kirin, hingî wê xwûde bi awayekî baş bandûrakê jî lê bike.

Her wusa, Piştî Zend avesta re wê Zen bûdîsm, şîroveyek nû pêş bixe. Li ser wê re wê êdî weke oleka felsefeyî wê pêş bikeve. Her wusa, têgînên mîtîk, felsefîkî û her wusa hizrî, wê bi hevdû re werina hevîrtin. Di felsefeyeka jîyanî de ku dîyardetîyê ji xwe re weke ku temen digrê, li şûna wê weke têgînekê nepenîyek mîstismî wê xwe bi Zen bûdîsmê re bide dîyarkirin. Di aslê xwe de, ev rewşên ku Zen bûdîsm, dihêne ser ziman, wê weke salixkirinna ku li ser rewşna têgînî ên zend avesta re ku dihên pêşxistin bin.

Em li vir, hinekî din li ser zen Bûdîsmê re herin. Li gor zen bûdîsmê, tişte ku tê serê mirov weke xirabî û tofanan tê eleqe wan bi xwûde re nîn e. Xwûde, bi ti awayî nabe sedeme xirabî û tofanan ji bo mirov. Xwûde, weke ku zagonên fîzîk û xwezê afirandin, wilo jî yên karma afirand. Li gor wê jî, mirov xwe bixwe wê baxtê xwe bînivîsêne. Ji ber ku xwûde "hêzkirina", ku mirov dil û di hundûr de jê re berg bike, hingî wê ew bi awayekî baş wê bandûrakê li karma mirovan bike. Sê awayên karma hena. Ew jî, 1. Sanchita karma, 2. Prarabdha karma, 3. Kriyamana karma´ na.

Her wusa, di dewama Zen bûdîsmê de li Asya dûr, wê bi herîkîna bawerî û felsefîkî ya Hîndûîsmê re jî ev rengê têgînî xwe werêne ser ziman. Li ser vê re, çend ku di hanîna gotinê de deng û nûans, car bi car cûdahî jî weke ku bi wan re hebe jî, wê li vir di çerçoveyekê de bin. Her wusa, ew cihane ku zend avesta hanî ser ziman û gerdûna wê, Wê Zanyar û fîlosofên weke Bûda û hwd, bi awayekî ahengî wê bike ku şîroveyna ji wan re werêne ser ziman. Weke ´gatha´yên zend avesta, wê ´Vêda´yên zen bûdîsmê û di dewama wê de ên Hîndûîsmê û hwd, pêş bikevin.

Di dewama wê de li ser têgîna hîndûîsmê re mirov dikarê gotinekê werêne ser ziman ku wê li vir, vegotinbar bê. Li ser têgîna gûharînê re, Prrabdha karma, awayê karma yê ku naye guharandina. Ji ber vê jî, "ancama" wê bê jîn kirin. Divêt ku bê qat kirin. Li vir rewş dihê şibandin li derketina tîr ji kavan. Ku tîr ji kavan derket, êdî "ew baxtê wê jîn bike". Tiştekî li ser tîr bike nîn e. Ya tenê bike jî, ewe ku "kriyamana karma", yanî ew rewşa ku heyî an ji wê, piştre careke dî weke wê bê jîn kirin, li gor wê xwe amede bike. Ku tîrekî dî ji kavana wî derket, wê baş cihê ku wê heriyê de kifş bike. Li ser wê bi hizire. Mirov, haya ku ji hemû karmayên xwe paqij bibe, wê êdî hertimî bi mire û bibe. Ev jî, "samsara" ya. Wê li samsara bimêne, haya hingî. Êdî ku tiştekî fêr bike û jîn bike nema, Cihê ku jê re dibêjin "Mokşa" yanî cihê ku wê lê xilas bibe, wê gihê wir. Êdî wê samsara mirin û bûnê wê jê re bidawi bibe.

Ev şîroveya Zendî a ´karmayî´, awayekî wê, mirov dema ku li ser Mîtra re dihizirê, di mejiyê mirov de bi zelalî xwe dide dîyarkirin. Têgîna tîr û her wusa biwate kirina wê, wê metranên Mîtra, wê bikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de, weke vegotinna karmayî, wê pêş bikevin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Zend avesta, wê şîroveyekê di çerçoveya cihaneka bi vî rengî berî Zerdeşt, bawermendên Mîtra ku bi têgînî û felsefîkî hanîna li ser ziman re wê were hanîn li ser ziman.

Em li vir, em divê ku hinekî di dewama wê de bo fahmkirinê li ser têgîna felsefîkî re hinekî jî divê ku werênina ser ziman. Li vir, wê, mistisme şîroveya zend avesta a zendî, wê li vir xwe bide dîyarkirin. Her wusa, çendî ku bi têgîna gerdûnê re kûrbûn dibê û hewldana fahmkirinê dide dîyarkirin, wê weke xalekê ew mistism, nepenîya xwe bide dîyarkirin. Emê li ser vê hê bisekin in. Ji ber ku ev alî, weke aliyekî giring a. Mîstîsme zend avesta, weke têgînek û ankû şîroveyek giring a **vê felsefeyê ya**.

**Mistîsm**, temenê wê wasf û hêjahîyek a. Her wusa, li vir, dema ku mirov ji mistîsmê, gavê biavêje û bike ku werêne ser ziman, divê ku mirov hinekî têgîna hêjahîyê jî li vir li berçav bigrin. Di jîyanê de di hundûrê aqil de kirde û tiştê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa li ser aqilê mirov re bi kirdeyî wasîfîya ku mirov wê bi têgînê re kifş dike, weke aliyekî giring ê vê fahmkirinê ya. Wasîf, aliyekî wê weke çengekî wê, fahmkirin di temen de heya. Weke aliyê din ê duyem û ankû çengê wê yê duyem jî, bi wê fahmkirinê li jîyanê nerîn a. Her wusa, bi aqil re di jîyanê de zanîn, tişt û wasîfîtî û hwd, di vê çerçoveyê de mirov wê kifş dike. Di ancama pêşketina aqil de hişkirin û fahmkirin pêş dikeve. Bi hişkirin û fahmkirinê re jî wasîf(nîtelîk)îtî xwe dide dîyarkirin.

Dema ku em li ser aqil re bi zanîn û tiştê re û ankû bi kirde û heyberê re ku mirov dihizirê, li vir, mirov wê bi wasîfê(nîtelik) re wê vê aliyê werêne ser ziman. Li vir, wasîfîtî, herî zêde wê xwe bi fahmkirin û pêşketna zanînê re bide dîyarkirin. Di serdemên berê de bawerîyên anamîst û totemîst de, dema ku mirov li wan dinerê, her wusa, di nava jîyane xwezayê de mirov dijî. Di wê jîyanê de mirovê herî zêde biaqil û bi fahm, wê derkeve li pêş. Her wusa, wasîfîtî, temenê wê li ser fahm û zanînê ava ya. Her wusa, dema ku mirov dihizirê, mirov dibînê ku têkiliya bi xwezayê re wê weke aliyekî giring derkeve li pêş. Di serdemên berê ên Kurdistan û Mesepotamiya de, weke ku di bawerîyên demên kevn ên berê de dihê ditin weke ´ga´ û hwd pîroz in û w wasîfîtî de bi wan were kirin. Ji wan re berg were kirin. Ji xwezayê û tiştên şenber re berg kirin, wê di demên ku bawerî nû pêş dikeve ên weke anamismê û totemîsmê û hwd de, wê hin bi hin keseyet jî bi wê re di ahengekê de reng û awa bistêne. Keseyet, li ser wasîfîtîyê re wê xwe bide dîyarkirin. Hanîna li ser ziman û ankû bi zanebûnî, pêşavanî kirin û hwd, wê xwe bide dîyarkirin.

Dema ku ez li vê rewş dihizirim, rewşeka pirr giring a ku heta roja me jî di nava civate kurd de heya dihê berbîra min. Heta roja me jî, di

nava civate kurd de, mirovên pîr û kal, weke mirovna serdest û ên zane na, xwediyê serwerîyeka mazin in di nava civatê de. Bandûra wan pirr zêde heya. Her wusa, dema ku ez li vê rewşê dihizirim, weke ku di demên berê de bi ´mirovê şaman´ û ankû ´mirovê pîroz´ re heya, ew dihê berbîra min. Ev rewşa pîr û kalên kurd, ku di nava civate wan de wan di asta ´çîneka serdest´ de dihêne li holê weke bi serdestî, vê rewşê bi xwe re dide dihêne bîra mirov. Gelek teybetîyên ku di vê çerçoveyê de mirov dikarê bi mirovê pîr û kal ê kurd re werêne ser ziman hena.

Her wusa, mirovê pîr û kal, weke mirovê ku bi demê re dijî û dibînê. Ev jî, bi aqil û dîtina wî re, wê di mejiyê wî de wasîfîyekê bide çêkirin. Li ser wê wasîfîyê re ew wê derkeve li pêş. Wê bi gotina xwe re derkeve li pêş. Weke ´mirovê zane´, wê piştre kirasê, pîrozîyê li xwe bike. Her wusa, di rengê bawerîyên demên bûhûrî de, ku mirov bi pêşketina bi keseyetîya xwe re û bi zanebûna xwe re ku gav bi gav xwe mazin dike. Mirovê, ku gav bi gav bi zanebûna xwe re mazin dibe, wê derkeve li pêş. Her wusa, bi gotina wî re, ew derdikeve li pêş. Wê mirovê zane, bizanebûn û keseyetîya xwe ya ku bi wê zanebûnê re birêzkar(disîplîn) kirî re wê hin bi hin pêlik bi pêlik wê bilind bibe. Heta ku weke ku Mirov bi zanebûna Mîtra û Zerdeşt re dibînê û piştre bi ya Bûda re jî dibînê û hwd, mirov bi pêşketina xwe re gav bi gav pêş dikeve û pêş de diçê. Yanî, bi gotinaka din, her asta ku gihiştiyê de ew wê bi tahb û zanebûna xwe re herê û bigihiyê de û wê bimaf bike. Ev bilindbûn, heta ku weke asta ´pêxemberîyê´ û hwd de jî, wê bibe. Cudahîya, li vir, di nava bawerîyên yazdanî de ji ya olên semewî û hwd ew a ku di bawerîya olên semewî de tê gotin û bahse "wahî" dihê kirin bi gotina ´hatina pêxemberîyê´ re. Gotina pêxemberîyê ji kurdî ya.

Lê ev rewşa bilindbûna û gihiştina asta ppêxemberekî, wê di vê çerçoveyê de bi vê têgîn û felsefeya zendê re wê di çerçoveya ku mirov bi zanîn û asta xwe re xwe bigihinêyê de. Di vê çerçoveyê de hemû jiyan û tişt û mirovên ku jîn dibin, ku pîroz in û rêze maf dikin, zagona ku zirerê nede ti tiştekî, "Ahîmsa" dihêne ser ziman. Ev rewş, wê di çerçoveya fahmkirina wasîfîyê de bike ku mirov bigihijê têgînekê jî. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Wasîfî(nîtelik)ya di jîyanê de, di çerçove û têgîneka bi rengê ku dihê hanîn li ser ziman weke ´hemû hebûn, ku haya ku pêvajoyên xwe yên peresendinê temem dikin, hertimî dîsa û dîsa bi laşbûna wan´ dihêne ser ziman. Ev têgîn taqabûlî reankarnasyonê dike.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku

mijara fahmkirina wasîf(nîtelik)îyê, wê xwe hertimî bide dîyarkirin. Fahmkirina wê wasîfîyê, û pêvajoyên wê yên di jîyanê de û biaqil û hwd, wê di vê çerçoveyê de bi hewldanên fahmkirina jîyanê re wê xwe bide dîyarkirin. Di hundûrê aqil de û her wusa bi tevgerîyên jîyanî û hwd re ku mirov divê ku bike ku fahm bike û werêne ser ziman, wê di vê çerçoveyê de rewşekê bide dîyarkirin.

Ku hemû hebûnên ku bi kirin, hizirkirin û hîskirin û hwd, baxtê xwe kirî û çêkirî, di jîyanê de bi têsîr û bertekê re weke zagonekê wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku têgîna pêşketina jîyanê, li vir, weke têgîneka ku di vê çerçoveyê de bi vê felsefeyê re mirov fahm bike ya. Hizirkirin, piştî ku bû û pê de, wê weke tiştekî ku heyî wê bê. Her wusa, di vê çerçoveye de têgîna fahmkirina hebûnê, li ser têgîna afirandinê û bûnê re xwe dihêne ser ziman. Têkiliya di nava bûn û hebûnê de, di vê çerçoveyê de bi têgîneka weke ya gerdûnî re xwe bide dîyar kirin. Her wusa, emê hinekî din jî li ser têgîna têsîr û bertekê bisekin in. Li vir, pêşî em di çerçoveya têgîna bûn û hebûna de bi têgîna gerdûnî re vê bibêjin ku weke têgîneka giring wê bi rengê gerdûn, herdayimî di bûn û parastin û di pêvajoyên tinekirinê de buhurtîya û dayimî piştre bi xwe afirandinê re bûya. Li vir, li ser vê re emê hinekî li ser têgîna têsîr û bertekê bihizirin. Ev, wê weke aliyek giring bê. Her wusa, weke têgîneka ´ku hemû hebûna ku bi kirin, hizirkiirn û hîskirin û hwd, baxtê xwe kirî û çêkirî, weke zagona Karma jî ya ku bi têgîneka zagonî xwe bi têgîna têsîr û bertekê re dihêne ser ziman a.

Her tişt, bi wasîfkirina wê, weke têgînekê li vir wê xwe bi aqil re bide dîyarkirin. Aqil, weke aliyê wasîfîya jîyanê jî bi xwe re dihêne ser ziman. Her wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna têsîr û bertekîtîyê jî, weke têgîneka di vê çerçoveyê de ku mirov bi aqil wê fahm bike ya. Felsefeya têsîr û bertekîtîyê, wê di çerçoveya fahmkirina jîyanê de wê bandûraka wê ya giring wê hebe. Her wusa, her tişta ku di jîyanê de heyî, ya beremberê wê çi ya, hewldana dîtin û fahmkirina wê, wê di vê çerçoveyê de xwe werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ´kifşkirina bi başî´ û hwd, di vê çerçoveyê de êdî di ahengekê de jîyankirina bi wê re, wê li lêgerîna wê jî bê lêgerîn. Di jîyanê de tiştên ku bandûrên ne baş li mirov dikin çi na? Her wusa, bi hêrsbûn, nexweş ketin, girîn, û ankû vajî van ´şa bûn´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de bi têgîna têsîr û bertekê re xwe weke têgîneka zagonî jî bide dîyarkirin. Êdî aqilê mirov, li wê digerihê ku hertimî ´ya rast´ çi ya, wê

kifş bike ku ´ya baş´ êdî bijî. Hizrên Zerdeşt, ên di çerçoveya ´baş bibînê, rast bibêje û karê qanc´ wê di vê çerçoveyê de têgînekê bidina me.

Têgîna rastîtîyê, wê her wusa, di çerçoveya rastîya jîyane mirov de û bi jîyankirina mirov re wê xwe werêne ser ziman. Tişta ne baş wê bandûra wê ne baş bê. Her wusa, mirov, li ser wê dihizirê ku dema ku mirov bi têsîr bibe, mirov şa dibê û ankû xemgîn û ne baş dibê. Li wê dihizirê. Ev rengê hizirkirinê, wê di çerçoveya têgîneka dûalîteyî de xwe li ser hizirkirina li ser ´kokê´ re xwe bide kûr kirin. Emê li jêr, hinekî din jî li ser wê bihizirin. Lê li vir, pêşî em hinekî din divê ku vê rewşa têgîna têsîr û bertekê baş fahm bikin û werênina **ser ziman**.

Li vir, divê ku mirov ji rewşa bi bandûrbûna ji dûnyaya derve gavekê biavêjin û bikin ku wê werênina li ser ziman. Hizra, bidestxistina zanînê, wê weke aliyekî fahmkar bê li vir. Ji têgîna zend avesta, mirov ya ku fahm dike ku ew a ku aqilê ku mirov di mejiyê xwe de digirê, biriqîna dûnya dervî mirov a. Yanî, weke ku mirov ji fahm gotina zendê a zend avesta fahm dikin, weke ´şîroveyekê´ ew bidestxistina hişî ya dimejî de dihê ditin û şîrove kirin. Her wusa her biyên mirov ên weke ên destlêdan û bihîstin û dîtinê û hwd re rêyên bidestxistina aqil dihê hanîn li ser ziman. Her wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku çerçoveyeka felsefeyên ´emprîkî´ ên hemdem ên roja me ku bi xwe re afirandina, her wusa, mirov di wê demê de dibînê ku Zerdeşt û piştî wî re Bûda hanîna li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku navaroka aqil, her wusa, wê Bûda li "ezîtîyekê" bigerihê. Her wusa, li ser aqil û ankû şîroveya ji dûnyaya li derve, wê bike ku aqilekî werêne ser ziman. Şagirtê Bûda bixwe Bodhisattva, piştî fêrbûnên mazin ku ji Bûda digirê, wê bihizir bi renge ´medîtasyonê´ û hwd, wê bigihijê, wê têgînê ku ´darêjk, ji valahiyekê û bide ne ti tiştek a. Valahî jî, ji darêjkê ne cûda ya. Heman tişt, bi hêstê, derkkirinê, bûn û hişarê re jî bi heman rengî bûhûrîner a. Hemû dîyarde, di rastiyê de valahî na. Ew ne afirîna û ne jî hatina tûna kirinn, ne lewitîna û ne paqij, ne zêde na û ne jî kêm in. Ji ber vê yekê, di valahîyê de darêjk, hêst, derkkirin, bûn û hişar tûna ya. Çav, gûh, bêhvil, ziman, laş û ankû zêhn jî tûna ya.´ ..

Her wusa, ev hizrên şagirtê Bûda, wê piştre, di serdemên piştî Bûda de, wê weke ku çendî ku bina temenê hizirkirinaka mazin û ku bi xwe re ronekbîrîyekê pêş bixin, wê bi heman rengî hizrên cûda û dibistanên cûda jî bi xwe re biafirênin û pêş bixin weke hizrên cûda. Di vê çerçoveyê de, ev cûdahîya ku diafirê, wê weke ´mezheb´na felsefîkî û hwd jî bin. Her

wusa, hizrên Bûda, wê ronekbîrîyekê biafirênin li Asya ya dûr. Navê Bûda bixwe jî, wê bi wateya ´rohanîyê´ û hwd, wê were şîrovekirin û hanîn anîn li ser ziman. Şagirtên Bûda, wê navê Bûda, weke rohniyekê di mejiyê xwe de naqş bikin û li ser wê re bikin û hizra xwe pêş bixin û bi wê re fahmkirinê bikin.

Em li vir, divê ku vê yekê, werênina li ser ziman ku hewldana fahmkirina, jîyanê, gerdûn û her wusa aqil û derkkirina ji dûnya, wê di temenê hemû pêşketinên felsefîkî de bê. Her wusa, Zerdeşt, hewldana famkirinê, weke têgîneka bingihîn, di felsefeya xwe de bicih kiirîya. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî, dûbare werêne ser ziman ku navê zendê jî, di wateya şîroveyê de di kurdîya dema Zerdeşt de.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku bi zanînî, wê her tişta di jîyanê de bi ´fenomenên´ ku ji hevdû cûda û ankû hevdû temem dikin û an jî kû bi hevdû ve hena, lê ku di cewherê xwe de serbixwe na, ji wan heya. Têgîneka ´qatkan´ mirov di vê çerçoveyê de ji vê têgînê di cih de têdigihê. Her wusa, yekî ku bi hesanî bike ku vê felsefeyê fahm bike, wê bigihijê wê wê hizrê ku hertişt, di jîyanê de ji qatkan afirîya. Ev fenomen jî, her wusa, wê bi hebûna xwe re zanînê werênina ser ziman û bidina dîyarkirin. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de dihizirê, her wusa mirov têgîne zendê, bi wateya wê ya şîroveyî hinekî din baştir fahm dike. BI gotinaka din, aqil, ku tenê weke biriqîna, di vê çerçoveyê de bi wê aqilê re zêhn, ew darêjka wê tişta di jîyanê de ya.

Di vê çerçoveyê de bi wê têgîna şîroveyî, ev têgîn bi mirov re di cih de bi gotina zendê re diafirê ku pêşî aqilê mirov hertiştî bi rengê ku dibînê de di mejî de naqş dike. Yanî pêşî dihilde. Piştî hildanê, êdî dike ku wê fahm bike û werêne ser ziman. Fahmkirin û ankû bihişarkirin, weke pêvajoya duyem ya piştî hildanê ya.

Her wusa, li ser vê rewşa aqil û fahmkirinê re mirov ya ku bi têgîna zend avesta jî ku kifş dike û her wusa bi Hizrên Bûda re jî fahm dike, ew a ku bi çêkirina ahenga di nava laş û gîyanê de û her wusa derkkirina û ankû fahmkirina kirde û heberîya têrkerî a jîyanî re mirov wê bigihijê zêhnê jîyanê û ankû jîra jîyanê. Ev jî, bi rêbazên weke ´medîtasyonê´ û hwd re dihê kirin. Di vê çerçoveyê de ya ku mirov kifş dike jî ew a ku nerîna rast weke ku aqil û ankû zanîn a. Her wusa, sekna baş û rast jî, bi nîyetê û hwd re xwe dide dîyarkirin. Divê çerçoveyê de kifşkirina rast û baş jî, ku hertimî hem bi bûjenî(´maddî´**)** û hem jî **arîşenî**(´manavî´) gûharîner a. Di vê çerçoveyê de jî, weke têgînna ku mirov li vir fahm

bike, weke têgînên jîyan, hertimî biqadre, sekna rast a zanînî, fahmkirina sedemên hertiştî, minaq weke fahmkirina sedema êşê û hwd, wê weke temenê bi ser hertişt ve hatin û temenê serkevtinê bê.

Her wusa li vir, di vê çerçoveyê de dema ku mijar hewldana fahmkirina hişarê û ankû zanînê, wê Zerdeşt jî û piştre jî Bûda jî, wê li ser rewşa şîyarbûna mirov û rewşa di xewê de bûna mirov serî biwastênin. Zerdeşt, xewê û her wusa dîtina xewnê jî di nav de, weke hişarîya hundûrîn hanîya ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ev hizrên weke hişarîyek hundûrîn dîtina xewê û xewnê, wê li ser wê pirr zêde hizirkirin werina kirin. Di nava Jîyane kurdên berê de jî û ên piştre de jî, ´dîtina xewnê´, weke ku mirov dibînê bi şîroveyî weke têgînna ku mirov ji wan karibê peyamna fahm bike hanîna anîn li ser ziman. Mijara xewnê, di nava têgînên xate yazdanî de ku Zerdeşt jî ji wê afirîya, wê weke têgînek hîmî bê. Her wusa, fahmkirina xewnê, weke hişarîyeka ku jîyan jî û nerîna li jîyanê, bi têgînî û hwd daya kifşkirin. Keyê Medî Qiyakser, xewnekê dibînê ku keça wî mîz dike û ew mîza wê dibê bahr. Çîya bi ser de dihên xwerê. Ew ji rêmildanên Medî dixwezê ku xewna wî şîrove bikin ku ew xewna wî çi peymanê bo pêşaroja wî û desthilatdarîya wî di xwe de dihawêne. Li ser wê rewşê, rêmildar ji wî re dibêjin ku wê zaroyek ji keça wî re çê bike ku wê dawiyê li serdestîya tûxmê wî werêne. Ew jî, dema ku zaroya keça wî çê dibe, wê zaroyê digrê û dide wezirê, xwe ku wê bibe û bikujê. Lê Wezir, zaro nakujê. Piştre, key, heya wî ji wê çê dibe. Piştre key kurê wezirê xwe(´Harpagos´) jî dikujê. Li ser wê, ew wezir jî bi wî kurî re dibê yek û dawiyê li desthilatdarîya tûxmê keyê medî key Qiyakser tînê. Li vir, li ser xewnekê çawa bûyar di jîyanê de li hevdû hatina hûnandin û jîyan, dane kifşkirin, bi vegotinî dihên hanîn li ser ziman.

Ev rewşa bi xewnê re, wê weke rewşeka giring bê ku mirov li vir, hem weke hişarîya hundûrîn xewnê baş fahm bike û her wusa bi wê re kifşkarîya wê ya di jîyanê de bi têgînî û nerînî, ku mirov wê kifş bike û werêne ser ziman. Her wusa, di xewnê de dîtina tiştan weke nan, av, kevir û hwd, tişt bi tişt ku tên çi wateyê, bi nirxî hem hatina biwatekirin û hem jî bi wan re li gorî wan şîrove bi xewnê re hatina pêşxistin.

Xewn, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke dîtineka giring a ku divê ku mirov wê fahm bike ya. Xewn, çawa ku weke hişarîya hundûrîn a her wusa şîyarîya mirov a navarojê û hwd jî, weke hişarîya derveyî û temenê wê hatîya ditin û şîrovekirin. Di vê çerçoveyê de divê

ku mirov werêne ser ziman ku têgîna rewşa şîyarî û ya xewnê, wê hem bi hevdû re û hem jî ji hevdû cuda bi cûda, wê bandûrên wan, zêde hebin. Her wusa, weke rewşa şîyarîyê û rewşa xewê, ku weke ku me bi rewşa key û rewşa xewna wî re hanî ser ziman, bandûra wan li hevdû di çerçoveya têgîna têsîr û bertekîya li jîyanê de mirov wê bi hevdû re **kifş dike**.

Li vir, em divê ku hinekî din jî li ser hişarîya hundûrîn, bisekin. Ji ber ku ev alî wê di vê xale felsefîkî de pirr zêde li ser wê were sekin in. Her wusa, Piştî zerdeşt re ku hatîya Bûda, hizrên wî(´Dharma´) dema ku bahse wan kirîya, wî bixwe gotîya, ´li şûna ku win hizrên min pêşî herê bikin, pêşî bi rêya medîtasyonê li hundûrê xwe bihizirin û bi wê re rastîya wê kifş bikin.´ Her wusa, li vir divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di dawîya vê hevokê de gotina, ´... li hundûrê xwe bihizirin û bi wê re rastîya wê kifş bikin´ heya. Ev gotin, her wusa, têgînekê dide me. Ev têgîn jî, ew a ku hizirkirina mirov a hundurîn, weke astakê dihê ditin.

Ev xale hizirkirina hundûrîn, wê weke xaleka ku di nava vê xata felsefîkî de weke rêbazekê hizirkirina li hundûrîn û ankû ´medîtasyon´ were û bicih bibe. Medîtasyon, her wusa, di vê çerçoveyê de weke rêya hizirkirina mirov a bi xwe re ya. Rêya hizirkirina mirov a di xwe de ya. Her wusa, dema ku mirov dihizirê, di mejiyê xwe de, wê hingî, di çerçoveya meji û hizirkirina xwe de wê têgîna xwe biafirêne. Wê bi bawerî û rastteqînîya xwe de nerîna xwe biafirêne. Li ser wê re, wê êdî dîtina xwe werêne ser ziman.

Li vir, dema ku mirov li hizirkirina li hundûrîn dihizirê, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku dîtina hundûrîn ya bi hizirinê û hwd, weke ´sawêrîya(´xiyala´) ku mirov dibînê´ jî hatîya ser ziman. Medîtasyon, li vir, aliyekî wê yê ku giring heya ku divê ku mirov werêne ser ziman. Mirov di xwe de dihizirê. Her wusa, wê bi hizirkirina xwe re bike ku ya rast çî ya, li gorî aqilê xwe kifş bike û werêne ser ziman. Li ser wê re jî, wê bike ku fahm bike. Bûdîsm jî, weke ku bi Zerdeştîyan re heya, rastrast fêrkirin û alimandin, giring a. Weke rêbazeka fêrkirin û perwerdekirinê, rastrast, fêrkirin û ji yên ku fêr dikin re hanîna li ser ziman, wê weke rêbazekê fêrkirinê bê. Bo vê yekê jî, xaleka destpêkê ya rast û dûrûst, pêwîsta. Bi wê re jî, bi wê xale dûrûst û rast re xweşbînîyeka mihrîvanî pêwîsta.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku Zerdeşt, di destpêkê de bi wê gîyanê zend avesta hanîna ser ziman ku laş û gîyan ji hevdû cûda dikarê bijî ya. Laş, li jîyanê, heya. Lê

ne dayimî ya. Piştî ku laş mir û pê de jî, wê gîyan bijî. Gîyan, wê pêşî herina azmana. Heta roja me jî, di nava kurdan de ew bawerî heya ku "her mirov stêrkeka wî/wê ya li azmana heya." Li gorî başî û ne başîya mirov, wê rohniya wê stêrê û geşîya wê dîyar bibe. Ev têgîn, her wusa, têgînekê di derbarê vê fahmê de jî dide me.

Em li vir, divê ku vê yekê jî, werênina ser ziman ku têgîna gîyanê a ku ´piştî mirina laş re wê bijî´ jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî li ser wê bisekinê. Ev têgîn, wê weke têgîneka ku ji temen ve hertimî dide kifşkirin bê. Her wusa, di nava bûdîsmê de jî, wê bi rengê ´her zindî, di nava dewr û dayimîya bêdawî a mirin û ji nû ve bûnê de ya.´ Li ser vê têgînekê de têgîna ´reankarnasyon´ her wusa hatîya şîrovekirin û ser ziman. Wate û têgîna ´reankarnasyonê´ ew a ku ´piştî laşê mirov mir, wê gîyane mirov nemirê. Gîyane mirov dikarê carek din bi laşekî din were dûnyê û bijî. Her wusa, piştre, di serdemên me yên hemdem de, hin têgîn di vê çerçoveyê de hatina pêşxistin û hanîn ser ziman, ku gîyane mirov, di jîyane xwe ya di laşê xwe yê berê yê ku di wê dema ku di wê de dijî, çi û çawa jîya ya, ew di xêva wê de heya. Gelek tişt û bîrhanîn, ku mirov ne farqê de jî bê, dihêna berbîra mirov. Her wusa, gelek xewn û bîrhanên ku mirov nikarê di jîyane xwe de wateyê di wê kêlîkê de bidiyê de, bi wê re hatina hanîn li ser ziman.

Rengê hizirkirina reankarnasyonê, weke rengekê hizirkirinê ê li ser gîyanê re ya. Her wusa, laşê ku mirov bi wê dijîyanê de dijî, tenê weke amûrekî ku gîyan bi wê dijî dibînê. Weke amûrekî ku gîyan ku karibê xwe bi wê bijî û werêne ser ziman dibînê.

Gîyan, li vir, her wusa, mijara jîyankirina wê ya piştî mirina laş re, wê hema bêja di nava hemû rengê felsefîkî û têgînên bi bawerî û hwd de pêş bikevin. Li ser wê re jî, her wusa divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna reankarnasyonê, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîneka gîyanî ya bi aqil a. Divê ku mirov vê têgîna gîyanî ya bihiş, hinekî jî bi aqil re mirov wê werêne ser ziman. Her wusa, têgîna gîyanê, weke navikeka ku mirov dikarê wê bi ´ezîtîyê´ re jî werêne ser ziman a. Lê ew ezîtîya ku mirov bixwe jî, di fahmkirina wê de ku dikevê de zorê de ya.

Mirovê ku xwe nasnekê, her wusa, divê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Ne naskirin jî, temenê wê li ser nezanî û ne fahmîyê ya. Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku hebûna aqil, her wusa divê ku mirov weke destpêkeka hizirkirinê û ya hizirkirinê jî, weke ku Zerdeşt bi têgîna zendê re dihêne ser ziman, divê ku mirov, bi

şîroveya jîyanî re bi fahmkirinê re werêne ser ziman. Her fahmkirin, weke têgîneka ezîtî, wê navikeka wê ya weke dendikî wê hebe.Gotina ´ez´ û ankû ´ezîtîyê´ ku em di kurdî de bikardihênin, têgîna ´keseyetîyê´ jî bi xwe re dide me. Her wusa, li ser vê têgîna keseyetîyê re jî mirov bi rehetî têgîneka gîyanî jî bidest dixe. Ev jî, her wusa, wê temenê fahma gîyanê û heyîna wê bixwe jî bê.

Têgîna reankarnasyonê, her wusa, di vê çerçoveyê de temenê wê bi dûaliteya laş û gîyanê re ya. Lê reankarnasyon, bi têgînî, dihê wateya serdestîya gîyanê jî. Divê çerçoveyê de jî divê ku mirov wê werêne ser ziman û fahm bike. Her wusa, li ser wê re jî, rewşa fahmkirinê dihê ditin.

Lê têgîna reankarnasyonê, bi hebûna ezîtîyeka ku ji hewirdora xwe ne qût(´annatta`) û her wusa bi têgîna her tişt di pêvajoya xwe ya gûharînê(´Anicca`) de ya re dihêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de jî, dema ku bahse kifşkirina baxtewarîyê dihê kirin de jî Bûda bi xûypakî[fezîletê=kusala] re û her wusa tişta ku vajî xûypakîyê ku zirerê bide jîyane mirov nexûypakîyê[akulsala] re, bahse men(´fenomen`)ên ku baxtewarîya mirin û piştre jinûvebûna gîyanê re ku dide kifşkirin. Ev, taqabûlî ´ahrîman û ahûra Mazda´yê tê. Li vir, divê ku mirov li ser vê têgîna başî û ne başîyê re bi têgîna ´karma´ re jî werênina ser ziman ku Şagirtên Bûda ku ji wî fêrbûna, dibêjin ku "tişta baş û ne baş ku bû, wê di çerçoveya wê jîyane ku dihê jiyîn de wê ji nifşên piştre jî wê bizrê xwe bihêle.´ Her wusa, di vê çerçoveyê de têgîna Zerdeşt, ya bi rengê wê ji kirina mirov wê mirov û zaroyên mirov jî ancamê bigrin, dihêne berbîra me.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werênina ser ziman ku di vê xalê de piştî Zerdeşt re wê Manî, pirr zêde bihizirê. Her wusa, Manî, wê weke hizreka bi ancamî ku ji zende avesta girtîya, dihêne ser ziman ku ´mirov wê bi kirinên xwe re pêşarojê jî bide dîyarkirin.´ Têgîna kifşkirina pêşarojê, li ser rêmildaran re wê di nava Zerdeştîyan de jî û her wusa, di xate Zerdeştîyê de di demên berê Zerdeşt de jî, wê hebe. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov **dîsa Mîtra bibîr bike**.

Têgîna felsefîkî a Bûda, wê li Asya, her wusa bandûra wê bi pêşketina wê re xwe bide dîyar kirin. Em divê ku Têgîna Bûda û pêşketina bi hizrên wî jî, di nava rengê pêşketina xate yek-xwûdayîyê ya yazdaniyê re werênina ser ziman. Vê xat yek-xwûdayî ya yazdaniyê, serdemna bi hezaran salan ên dirêj bûhûrandina. Her wusa, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman, ku ji Misra kevn û heta mesopotamiya(kurdistanê û her wusa di dewama wê de Îran û Asya û

hwd de, wê di xateka mazin de rengê pêşketina yek-xwûdayî ya yazdaniyê bi hebûna xwe re xwe bide dîyakirin. Li Misre Kevn, ku şoreşek ol û bawerîyê di çerçoveya vê yek-xwûdayî ya yazdaniyê de wê bike, Akhanaton û têgîna wî, wê bi bandûra xwe re wê hebê. Her wusa, Akhanaton, bi hebûn û bandûra xwe re, ji koke xwe ve bi Mîtannîyan ve dihê girêdan. Heta ku gelek, nameyên ku Amarna hatina ditin, di wan de dihê ser ziman ku Akhanaton, kalkên wî Mîtannî na. Her wusa, di heman nameyan de tê ser ziman ku Akhanaton, zawaca xwe jî ji Mîtannîyan dike.

Ev rengên pêşketinê, di dema Mîtannîyan de, wê di çerçoveya şoreşek bawerîyê de xwe bi Mîtra re bide dîyarkirin. Em nikarin, hebûna pêşketina Mîtra ji rêzê şîrove bikin û werênina ser ziman. Heta roja me jî, yanî heta sedsala me ya ku di wê de dijîn a sedsale 21´ê jî, em nikarin bibêjin ku Mîtra bi rastîya xwe re baş hatîya fahmkirin. Yê ku temenê yekkirineka bi bawerîyî li gorî pêşketina aqilê felsefîkî afirand û kir ku li ser wê re mirov aqilê xwe werênina ser ziman, wê Mîtra bê. Her wusa, Piştî Mîtra re Zerdeşt, di vê çerçoveyê de wê derkeve. Zerdeşt, rastîyeka hemdem ya civatî û şariştanî dihêne ser ziman. Şîroveyên Zerdeşt, wê bandûra wan pirr zêde wê hebin. Her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku Zerdeşt, rastîya wî giring a ku mirov ji nûve û ji nûve wê dûbare hilde li dest û fahm bike.

Zerdeşt, weke ku bi navê ´avesta´ re jî dihêne ser ziman ´zendê´ bi wateya şîroveyî dihêne ser ziman. Avesta, ku di wateya nerîna wî û ankû nerîne te´ de ku mirov dikarê werêne ser ziman, dema ku gotina ´zendê´ dihilde li pêşîya xwe û bi rengê ´zend avesta´ dihê nivîsandin, wê wateya şşîroveyeka bi nerînî ku taqabûlî têgîna felsefîkî û şîroveyeka felsefîkî û hwd dike, wê bi xwe re werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de weke nerîna li jîyanê jî, mirov dikarê wê werêne ser ziman. Di jîyanê de salixkirina, rewş, heyîn û hebûnan û her wusa rewş û tevgerîyên zindîyî û hwd, wê di vê çerçoveyê de giring bê. Her wusa wê ev rewş û şîrovekirin, bi gotina ´zendê´ re werina ser ziman.

Em dema ku bahse şîroveya li jîyanê bikin, li vir, em dikarin, bahse her ´çar rastîyên pîroz´ ên ku Bûda bahse wan dike ku bi heman rengî bi şîroveyî mirov ji zend avesteya Zerdeşt jî, rengna wan kifş dike, mirov dikarê bahse wan bike. Rastîyeka ku Bûda weke rastîyeka pîroz hanîya ser ziman ew a ku ´êş, beşek ji jîyanê û bûyînê ya(dukkha)." Li ser vê rastîya pîroz Bûda hinekî din dihizirê û bi wê re dihêne ser ziman ku ´ya di hîmê êşan de xwestekên mirov in(samudaya). Di dewama wê de jî,

dibêje ´ku mirov, ji xwestekên xwe dest berdê, mirov wê dawiyê li êşên xwe jî werêne(nîrodha). Her wusa, Bûda, di dewama wê de weke rastîya çarem ya pîroz jî heşt rastîyên din dihêne ser ziman. Wan jî, bi vî rengî rêz dike; ku rast fahmkirin, hizra rast, gotina rast, çalakîya rast, qizinckirina bi namûsî(rast), tahba(kêferat) rast, Jîrbûn û ankû ku mirov ne şevekorî bê û çav vekirî bû û mijulkirin(konsantrasyon)a rast bû û pê de, wê dawî li êşan werê hanîn.

Ev rastîyên ku mirov wan kifş dike ku Bûda hanîna li ser ziman, her wusa mirov dibînê ku bi têgînên weke "tevgera rast, gotina rast, û kirina rast" û hwd re Zerdeşt jî hanîna li ser ziman. Li ser tevgerîyan re, adilandin û rast tevgerîn, wê weke ku di navaroka vê fahmkirinê de bê. Mirovê di vê çerçoveyê de fahm dike ku li rez aqil, tevgerîtî û ankû çalakîtîya rast, her wusa, hatîya danîn û ankû bicih kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binê wê xat bike û werêne ser ziman ku Têgîna rast û ankû fahmkirina rast, wê weke temenê rast fahmkirin û nêzîkatîya bi wê re bê. Mirov, dema ku gotina xwe de got ku çawa rast a ku ew gotin were gotin û hwd, di vê çerçoveyê de li wê dihê nerîn. Bi gotinaka din, li ser tevgerîyan re bi rêzkar(disîplîn) kirina nêzîkatî û gavavêtinên mirov, wê giring bê. Her wusa di vê çerçoveyê de fahmkirin, weke aliyekî girin a. Tişta ku dibe temenê êşan û hwd, weke xwestek û azwerî û hwd, li ser wan bi tevgerî û biaqil re dihê hizirîn.

Gotinên Zedeşt, ên weke ku balê dikişênina li ser hizirkirina rast û tevgerî û ankû çalakîya rast, li vir, wê weke têgînna felsefîkî, hinekî fahmkar bin. Her wusa, di vê çerçoveyê hizirkirina mirov, wê li ser wê bisekin in li tevgerîyan û ankû çalakîyên mirovî re. Zerdeşt, hizra wî ya ku berpirsîyarîyê, li vir, divê ku mirov bibîr bike. Zerdeşt, di wê têgînê de ya û dihêne ser ziman ku `mirov, ji kirin û gotinên xwe yên bike berpirsîyar a.´ Her wusa, bi heman rengî Bûda jî, di nava şîroveyên xwe de hanîya ser ziman ku Mirov, ji kirinên xwe û gotinên berpirsîyar a. Her wusa, Bûda, vê jî, dihêne ser ziman ku Nifşên piştre jî, wê ji wan kirin û gotinan (êşê) bikişênin. Her wusa, wan kirin û gotinan Bûda, wê were fahmkirin ku wê xirabî ku weke bizrê wê, wê ne başîyê di nava nifşên piştre de jî çê bike bê. Bi heman rengî, rengê gotinê, ku bi başî bê, wê çawa ku bi başî, nifşên piştre ji wê ancamê bibînin, biheman rengî ku gotin û ankû kirin ne baş bin, wê dîsa biheman rengî ji wê nifşên piştre êşê bikişênin. Yanî, weke ku Zerdeşt hanîya ser ziman Bûda jî hanîya li ser ziman, ku wan ji kirin û gotinên mirov, nifşên me yên piştre jî bi başî û ankû ne başî ancamê bibînin û bikişênin. ..

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov têgîna rastîyê baş, werêne ser ziman. Li vir, weke ku mirov di kurdî de jî, dihêne ser ziman, ku çendî ku gotina ´başîyê´, têgîna herênîyê bi xwe re dide dîyarkirin, dikarê li ser nêzîkatîya baş û ne baş re jî, xwe bide dîyarkirin. Kirina ne baş û kirina baş, wê her wusa bitêgînî werina li ser ziman ku li ser wan were hizirîn. Di jîyanê de weke ku Zerdeşt û piştî wî re Bûda jî hanîya li ser ziman ew ahenga di nava qancîyê û xirabîyê de, wê jîyane mirov di nava ahenga wan de werê dîyarkirin. Bo vê yekê bû, ku kurdên berê ku di dema hûrî û mîtannîyan de jî û di dema Medîya de jî, wê weke ku çawa ji gîyane baş re boraq(yasna)ê bidin, wê biheman rengî bo ku xirabiyê bi wan nekê û ew aheng were çêkirin, wê ji gîyane ku bi xirabî(´daeva´) dihê zanîn re jî boraq bidin. Ev rewş civate kurd ya demên bûhûrî, wê pirr vegotinbar bê di vê çerçoveyê de û di vê rewşê de.

Li vir, ew têgîna çêkirina ahengê di nava jîyanê de di nava qancî û xirabiyê de di vê çerçoveyê de bi fahmî di mejiyan de hebû. Her wusa, di nava kurdan de heta roja me jî, ku bahse gîyanên ku bi ne başî û ankû xirabî dihên zanîn ku dikin, dibêjin ku ´divê ku mirov wan bi hêrs nekê.´ ..

Ev gotin, bi serê xwe wê hizrekî di vê çerçoveyê de di çerçoveya têgîna çêkirin û parastina ahengê di nava başî û ne başî de, wê hizrekê bide me. Jîyan, li vir, divê ku mirov, weke heyîna bêalî jî li vir, werêne ser ziman. Ji ber ku weke ancama vê têgînê, ev derdikeve li holê. Ya ku li ser tevgerîyan re ku qanciyê û ankû xirabiyê didina kirin, her wusa divê çerçoveyê de wê têgîna baş û ya ne baş bê. Ev jî, weke ku Zerdeşt bi ahrîman û ahûra Mazda re dihêne ser ziman, weke ku Bûda bi kûsala û akûsala û hwd re ku dihêne ser ziman, mirov divê ku lê binerê. Hizra jîyanê, li vir, divê ku mirov wê baş fahm bike. Her wusa, jîyan, weke mirov bi Zerdeşt re û bi têgîna wî ya zend avesta re fahm dike ku weke rûpelekî paqij ku li ser ti tişt ne hatî nivîsandin a. Ya ku wê êdî wê binivîsêne wê mirov û kirinên mirov ên baş û **ankû ne baş bin**.

Kirinên mirov, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku Zerdeşt dihêne ser ziman, li ser wê dihê hizirîn. Zerdeşt, bi têgîna ´rast tevgerîn´ re li ser wê dihizirê. Her wusa, li vir, bi têgîna ´tevgerên rast´ re wê têgîna ´gotina rast´ jî weke navê Zerdeşt, wê bi wî û têgîn û felsefeya wî re wê were ser ziman. Zerdeşt, bi têgîna gotina rast, tevgera û her wusa hizra rast ´ re wê bihizirê. Ev gotinên Zerdeşt, wê hertimî bi navê wî re werina ser ziman. Piştî wî Bûda jî, wê hinekî din jî li van xalan zêde bike. Her wusa, Zerdeşt, li ser temenê bi têgîna ´awayê jîyane

rast´ re van hersê xalên xwe dihêne ser ziman. Her wusa, di nava jîyanê de mirov wê çawa rast û dûrûst bijî, di wê çerçoveyê de Zerdeşt dike ku felsefeya wê werêne ser ziman. Dûrûstîtî û rastîtî, weke du gotinên hîmî ên vê felsefeya zerdeşt a ku bi gotinên ´hizra rast, tevgera rast û gotina rast´ û hwd dihê ser ziman a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku di jîyane mirov de jîrektî û ankû weke ku jîrîtî, di çerçoveyeka ku mirov bi hey û heyîdr bê ji hewirdor û dordora xwe, wê bi gotina ´şîyarîbûn´ û heyîderbûnê´ re wê were ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku di jîyanê de heyîderbûn û ankû şîyarîtîya bi tevgerî, gotinî û her wusa hizrî û hwd, bi aqilê mirov re ya. Yanî, bi gotinaka din, wê nîşanaka aqilî û hebûna zanebûna mirov jî bin. Ev, gotinên weke ´hizre rast, tevgerîya rast, gotina rast, awayê jîyankirinê ê rast, şîyarîtî û heyîderîtî, wê weke têgînna ku bi wan mirov dike ku xwe bigihêne rengê jîyan û jîyankirina baş û rast. Her wusa, wê çawa baş û qanc bijî, di vê çerçoveyê de, weke ku lêgerînek di serê mirov de li ser aqil û zanîna aqil re heya.

Mirovê ku hertimî, di hizirê û dike ku bi hizirkirina di serê xwe de ku xwe bigihêne rastîyeka baş di jîyanê de, di vê çerçoveyê de wê ev gotin, weke refaransna wî yên baş bin. Her wusa, di jîyane mirov de, car bi car, di civatên kurdan de dihê gotin ku "mirov, ku qanc bê, wê yê li hemberê mirov jî ji mirov re qanc bê.´ Û ankû, weke gotinaka xalkî ya di nava civate kurd de ku tê gotin ku ´mirov, bi gotina qanc, dikarê mar jî ji qûla wî derxe.´ Ev gotin, li ser rast tevgerîna mirov re dihên gotin. Yanî, mirov ku bi kirin ûû tevgerên xwe rast û baş bê, bi hizir û gotina xwe ya ku got re rast û qanc bê û tişta xirab ji devê mirov dernekeve, her wusa, wê di vê çerçoveyê di jîyanê de weke ancama wê, yên li hemberê mirov jî ji mirov re rast bike.

Li vir, têgîna ku ji van gotinan derdikeve li holê ew a ku mirov bi kirin û gotina xwe re helwest û tevgerîya yê li hemberî xwe jî bixwe dide dîyarkirin. Dema ku mirov çîra û ankû sêf ji yekî re kir, ew wê ji mirov hêrs bibe û ew jî, wê bi heman rengî bersivê bide me. Lê dema ku mirov bi gotina xweşik û baş werêne ser ziman û bahse rastiyê û ya baş bi rastî bike, hingî yê li hemberê mirov jî, wê bi heman rengî û bi rêz û hûrmet nêzîkî mirov bibê. Di vê çerçoveyê de felsefeya Zerdeştî, weke felsefeyeka nirxî, her wusa, di çerçoveya kifşkarîya tevgerîyan ku çawa di çerçoveya têsîrkirin û dayîna bertekîtîyê ku ancam derdikeve li holê, mirov wê dibînê. Manî, dema ku mirov li ser hizrên wî yên ku tenê di

nava civatê de dihên axiftin ku li ser wan dihizirê jî, mirov digihijê wê ancamê. Manî weke Zerdeşt, dibêje ku ´qanc ba, dakû yê li hemberê tê jî ji ter qanc bê´. Her wusa, têgîneka bi baxtî, di vê çerçoveyê de xwe dihêne ser ziman. Ew têgîna ku Bûda bi gotina ´karma´ re bi hizrên xwe re dihêne ser ziman û ankû bi navê wî dihê hanîn li ser ziman, li vir dihê berbîra me.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku Zerdeşt, li ser qanciyê, di vê çerçoveyê de dihizirê. Bi teybetî gotina ´hizra rast, ya ´gotina rast´ û ya ´tevgerîya rast´ bi sê-dîmenî dihêne ser ziman. Dema ku li tevgerîyê dinerê, wê bi sê-dîmenî binerê. Ji aliyê têgîna wê kirinê ya rast û weke gotinê çawa rasta û dikarê bi rastî werê ser ziman, di wê çerçoveyê de nêzîkî wê dibe. Her wusa, dema ku nêzîkî hizir jî dibe, weke ancama wê hizrê, di kirinê û jîyanê de, wê kirînîyeka çawa bi tevgerî derkeve li holê, li ser wê dihizirê. Dema ku ancama wê hizrê, di vê çerçoveyê de di jîyan û kirinê de rast bê, weke fêkîyê wê, hingî, ew hizir rast a. Li vir, levkirina wê hizra rast û jîyanê, wê rastîtîya wê di jîyanê de bi wê hizrê re bide dîyarkirin. Li vir, levkirin, giring a. her wusa hizra, Zerdeşt, ya ku heta roja me jî di nava civatên kurdan de dihê ser ziman ya bi rengê, ´bi gotin û jîyane xwe re yekbûn´, di vê çerçoveyê de wate distêne. Her wusa, ev gotina bi gotin û jîyanê re yekbûn, di wateya ku mirov bi rastteqînî û gotina gotina xwe re jî yek bê´, di wê çerçoveyê de jî dihê hanîn li ser ziman.

Rastteqînîtî, hinekî jî, cewherê hizir, gotin û kirina mirov a. Her wusa Zerdeşt jî, di wê çerçoveyê de dihêne ser ziman. Di wê çerçoveyê de li wê dinerê. Rasttqînîtî, her wusa, weke têgîneka ku mirov çendî ku mirov bi hizirkirina xwe re hûr û kûr çû û pê de çû, mirov wê bigihiyê de bê. Her wusa, hizra bi navê ´yazdanê mazin´, di vê çerçoveyê de wê weke rastîtîyeka wê rastîtîyê bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna yazdanîtîyê, û ankû weke ku di roja me de jî di nava kurdan de dihê binavkirin a ´êzdayîtîyê´ û hwd, di vê çerçoveyê, wek gotin û ola vê rastteqînîyê jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Ola êzdayîtîyê, weke xate stûnî ya hemû bawerîyên yazdanî ya. Her wusa, Biqasî ku Zerdeşt fêkîyê wê ya, her wusa Bûda jî fêkîyê wê ya. Di serê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev felsefe, wê di serî de hizirkirinê, her wusa, weke fenomeneke serbixwe di jîyanê de lê ji jîyanê werêne ser ziman.

Zerdeşt, dema ku bahse aqil dike, wê aqil weke xale ssêyem bi laş û gîyanê re werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de biqasî ku mirov fahm

dike, Zerdeşt, gelekî bi bawermend û şagirtên xwe re ew nîqaş jî kirîya ku ka wê piştî mirina mirov wê aqil winda bibe û yan jî wê winda nebê. Di ancamê de, gelek hizrên ku wê aqil winda nebê û wê bi gîyanê re bimêne, bi serdestî hatina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de aqil, wê weke xaleka ku di wê de jîyan bi hebûna xwe re bi dîmenî dihê qaydkirin, wê lê were nerîn. Her wusa, hinek hizrên bi vî rengî wê werina ser ziman ku ´her tişta ku bi aqilî di derbarê me de hat nivîsandin, ew êdî wê mayînda bimêne. Piştî ku mirov mir û çû, wê di dadgehkirina gîyane mirov de, ew tişta bi jîyane me re ku bi wî aqilî e hatî nivîsandin, wê şahîdîyê ji me re û ji kirinên mirov re bike bi bi başî û ne başî. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Piştî ku nivîsandin bû û pêşket û pê de, êdî wê di derbarê nivîsandinê de jî têgîn pêş bikevin. Weke gotinaka ku ji wan serdemên Zerdeştîyan ên berî zayîna Îsa maya, di nava kurdan de dihê gotin ku ´li ser herdû milên her mirovî du ferîşte hena ku qancî û xirabiyên wan dinivîsênin.´ Her wusa, ev gotina bi rengê ´li ser herdû milên her mirovî du ferîşte hena ku qancî û xirabiyên wan dinivîsênin´, wê piştre di nava bawerîyên din ên kurdistanî ku piştre derdikevina li holê de jî bi hin rengna wê bicih bibe. Di çerçoveya wê têgîna dûalîteya bi ´qancî û xirabîyê´ re wê cûda kirin bibe. Qancî, wê hertimî, di çerçoveya sekna mirov, pêşxistina keseyetîya mirov û her wusa axiftina mirov de li wê werê lêgerîn. Mirov, çendî bizane dikarê biaxivê û werêne ser ziman, çendî dikarê bi dûrûstî bijî û jîyane xwe bide domandin, çendî dikarê rast bê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê hewl bê dayîn ku were fahm kirin. Li gorî Zerdeşt, aqil jî weke jîyane mirov navaroka wê vala heya. Lê mirov, dema ku bidest jîyandinê kir û pê de, wê navaoka wê êdî tişî bike. Her wusa di vê çerçoveyê de li wê dihê nerîn. Aqil, wê valahîyê bitêgînî dide dîyarkirin. Ya ku navarokê tişî dike, jîyan kirin a. Her wusa, mirov çawa navaroka wê tişî dike, wê bi heman rengî rengê pêşketinê xwe bide dîyarkirin. Dema ku tişt qanc bê, wê ancama wê ya ku piştre werê jî wê qanc bê. Her wusa di vê çerçoveyê de di dewama wê de divê ku mirov bibêje ku kirin û tevger, her wusa, ancamên wê hena. Têgîna kirinê(piretîkê) her wusa li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bi felsefeya Zerdeştîtîyê re pirr zêde li ser wê were sekin in. tevger û kirin, li rex aqil, lê bi aqil re wê li ser wê were sekin in. Her wusa, bi rêxistin û rêzkarî(disîplîn) kirina tevger û kirinan, wê di vê çerçoveyê de bi têgînekê bibe. Mirov, çawa kirin û ankû tevger kir û pê de, wê ew tevger û kirina ku bûyî, êdî weke bûyîneka ku bûyî, wê xwediyê heyînekê bê. Di wê çerçoveyê de wê ew bi qancî bê û ancama wê baş bê û ankû wê bi

xirabê were şîrovekirin û ancamên wê ne baş bin, ew jî, wê êdî bi jîyankirinê re xwe bide dîyakirin. Bi heman rengî, weke ku di demên destpêkê ên zerdeştîtîyê de li ser tevgerîyê û kirinê hatîya sekin in, wê biheman rengî bi Bûdîsmê re li ser wê were sekin in. Hebûna tevgerê û ankû kirina di jîyanê de a ´piretîkî´, wê bi gotinî jî weke xaleka têgîhiştî li ser wê **were sekin in.**

Kirinên mirov, dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi têgîneka felsefîkî re dihên ser ziman. Her wusa li vir, li ser tevgerîyê re divê ku mirov bahse gîyanê jî bi têgînî bike. Hizra têgînî ya tevgerî, her wusa di vê çerçoveyê de dema ku mirov bahse wê bike, mirov divê ku mirov werêne ser ziman ku bi têgîna ´anatta´, weke heyîneka jîyanî ya ´mayînda´ bi wê re xwe dihêne ser ziman. Her wusa, em vê rengê têgînê ê bi têgîna mayîndatiyê re ê bi gotina ´anatta´ re divê ku werênina ser ziman. Têgîna mayîndatîyê, li ser cewherekî jîyanî re dihê hanîn li ser ziman. Bi têgînê û felsefîkî, têgîna mayîndatiyê, mirov di vê xate felsefeyê de dibînin ku pirr li ser wê hatîya sekin in. Di temenê her dîtbarîyê û dîtinê re li ´rastîyekê´ lêgerîn, wê weke têgînê ku di temenê vê hizra mayîndatiyê de bê.

Li jîyanê, rastîya ku mirov wê dijî, di vê çerçoveyê de bi hizrekê re dihê ser ziman. Hizir, bi xwe re wê temenê weke şîroveyekê dihêne ser ziman. Mirov, tişta ku dibînê, wê dihêne ser ziman. Di wê têgîna ku mirov wê dibînê de di cewherê wê de têgîna rastîyê mayîndatiyê heya ku mirov wê kifş dike ku heya. Li vir, ew rastîya ku di temenê wê dîtbariyê de, wê hebûn û temenê têgîna metafîzîkî ya vê felsefeyê jî werêne ser ziman. Li vir, dema ku mirov li vir, li ser vê têgîna mayîndatiyê re dihizirê, her wusa bi xwezayî ew hizra ´birahmanîsmê´ dihê berbîre me. Ev têgîna mayîndatiyê ku bigîyanîyeka rastîyî ku di temenê hemû dîtbarî û dîtinên mirov ên ku mirov de ya, bi gotina "*ātman"* dihêne ser ziman. Têgînê *´ātman´ê, her wusa* weke têgîneka ku mirov divê ku bi têgîna gîyanê re jî ku divê ku werêne ser ziman. Birahman, ez bi kurdîya xwe ya ku bi wê dinivîsênim ku li wê dihizirim, dibînim ku dihê wateya ´gîyane min´ û ankû ´rûhê min´. Her wusa, têgîna *´ātman´ê ′yek me′ û ankû ´cewherê me´ jî bi heman rengî bi re werêne ser ziman. Lê ev têgîna ´bi cewherî, wê weke têgîneka gîyanî jî bê. ...*

Li vir, divê ku mirov, vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna *´ātman´ê,* weke têgîneka felsefîkî ku di wê de ´nebûhûrînerîyê´ û ´negûharînerîyê´ bi xwe re bi întîbayî didê mirov. Wê ev jî, bibê sedema ku di serdemên piştre de, wê hin bi hin bûdîst ku hizrên xwe re berembrî

wê jî werênina ser ziman. Her wusa, di demên piştre de, wê hinek bûdîst bi awayekî vekirî jî, wê red bikin. Li vir, li ser vê rewşê re, wê cûdahîya ku di Keve nava bûdîsmê û birahmanîsmê de wê bi demê re biafirê.

Bûdîsm, wê hebûna ´keseyetîyê´ û ´ezîtîyê´ dernexe li pêş. Di vê çerçoveyê de wê li jîyanê binerê. Bi vê nerîna xwe re jî, wê bike ku jîyanê û rastiyê fahm bike. Her wusa, ´ezîtî´, weke ku bûdîsm dibêje li pêşîya xwe nûkirinê jî dikarê weke asteng bê. `ezîtî´, hinekî ji wê wirdetir, egoîsmê di xwe de dihêne ser ziman. Mirov, dema ku xwe kira navenda hertiştî û hertişt bi xwe re hanî ser ziman, wê çavên wî ji wî û pê ve, wirdetir nebînê. Bo vê yekê, wê li pêşîya zanebûna wî jî bigrê. Bo vê yekê ya, ku bûdîsm, ezîtîyê, nêzî nezanîyê di rewşek egoîsmê de şîrove dike.

Her wusa, li vir, dema ku mirov bi vir ve girêdayî dihiziê, mirov her wusa, vê hizrê di dewama wê de divê ku werêne ser ziman, ku hertişt, di jîyanê, di ahengekê de bi hevdû re girêdayî, mirov dikarê wê fahm bike. Her tişt, ku beremberî hevdû ku bi hevdû ve girêdayî, di nava sedem û têsîrê de xwe dide dîyarkirin. Her wusa, ev têkilî û rengê wê, wê di jîyanê de jî temenê afirandinê jî bê. Her wusa li vir, dema ku mirov li ser têgîna bûdîsmê re li ´bende kokî´ dihizirê, her wusa bi wê re ´girêdanîyê´ û her wusa, têgîna dema bûhûrîner´ jî divê ku mirov li wê bihizirê û werêne ser ziman. Bi hevdû ve girêdanîya hertiştê, wê weke rengê tehera hizirîne felsefeya bûdîsmê bê. Em, vê rengê hizirkirinê, her wusa li ser kokê ve girêdayî, mirov bi Zerdeştîtîyê re kifş dike. Zerdeştîtîyê, ji ber vê yekê, di serdemên wê ên piştre de, wê nîqaşên azadbûnê û ne azadbûnê wê bi wê re êdî destpê bikin.

Hewldana şîrovekirina, wê ´koka girêdayî´, wê xwe bi gelek nîqaşan re werêne ser ziman. Her wusa, mirov, çawa girêdayî ya û çawa tê girêdan, li ser wê hizirkirin dibê. Mirov, di jîyanê de çawa girêdayî ya, wê li ser wê re hizirkirin bibe. Her wusa, weke ku zerdeşt bi mînaqî dide û dibêje, weke ´gava mirov a li dûv ya li pêş´, wê her wusa hizirkirina di ahengekê de xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de girêdana bi jîyanê re, wê wrê hanîn li ser ziman. Kirineka mirov, çawa mirov bi xwe ve girêdayê dihêle, û ankû, mirov çawa li ser kirin û tevgerên xwe re di rewşek honayî û hoyandî ya, wê di jîyanê de weke rewşna ku mirov hewl bide ku fahm bike bin.

Bo vê yekê ya ku tevgerên mirov, giring in ku mirov li ser wan bihizirê û wan fahm bike. Her wusa, tevgerên mirov, girêdanîya mirov çawa bi xwe ve dikin, di vê çerçoveyê de wê rengekî hizirkirinê li ser

tevger û kirinan re xwe bide dîyarkirin. Têgînên weke ´berpirsîyarîya mirov a li kirinên mirov´ re, wê temenê nîqaşên li ser tevgerîyan bide kirin. Zerdeştî, weke ku dihê dîtin ku di nava wan de vexwarîna şerebê, heya. Lê Zerdeşt, dema ku hinekî bi hizrên xwe re li ser derketina dervî hiş a tevgerên mirov ku piştî vexwarina şerebê, êdî dikeve gûmanê de ku ji wê re bêje herê û yan jî na. Bo vê yekê, ev nîqaşa li ser şerebê, wê piştre, bê temenê wê ku Zerdeştî, beşek ji wan vexwarina şerebê bi xwe jî li xwe qadaxa bikin.

Hewldana fahmkirina tevgerîyan di çerçoveya hişarîya mirov de û bi wate kirina wan, wê di vê çerçoveyê de temenê hizirkirina mirov bê. Her wusa, bo vê yekê ya, ku wê piştre, li şûna ku ji mejî li tevgerî û gavavêtinan were hizirîn, wê ji tevgerî û gavavêtinan li mejî were hizirîn. Her wusa, di vê çerçoveyê de ku tevgerên mirov, çawa rengekî hizirkirinê bi xwe re didina dîyarkirin, wê li ser wê were hizirîn. Ev rengê, hizirkirinê, piştî Zerdeşt re, wê hinekî xwe bi Bûda re bide dîyarkirin. Piştî Zerdeşt û Bûda re, wê xwe bi Manî re jî bide dîyarkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de Manî, wê li ser tevgerîyan bihizirê. Hin gotinên Manî, ku heta roja me jî di nava civate kurd de bi rengê´ ku mirov li tevger û gavavêtinên xwe mûqayet bê´, wê werina ser ziman. Ev gotina bi rengê ´ ku mirov li tevger û gavavêtinên xwe mûqayet bê´, wê weke gotineka ku balê bikişêne li ser tevger û gavavêtina mirov bê. Her wusa, ´mirov, çawa, kirinê dike û çi dike, divê ku mirov li ser wê bihizirê.´ Têgîna ´mirov, çawa, kirinê dike û çi dike, divê ku mirov li ser wê bihizirê´, weke têgîneka ku mirov divê ku wê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman a. Mirov, dema ku gotineka ne baş ji yekî li hemberê xwe re got û dilê wî şikand, wê ew şikandina dilê wî mirovî, weke ancama wê gotina mirov bê.

Dema ku mirov gotineka ne baş got û dilê yekî bi wê gotinê şikand, wê ew şikandina dil, weke ancama wê gotinê ya ´mayînda´ bê. Wê ew gotina ku dilê wî mirovî şikandî, wê di hişê wî mirovî de bimêne. Her ku bibîr kir, wê xamgîn bibe. Dema ku mirov bi bazê, mirov wê weke ancama wê bazînê, mirov wê biwastihê.

Fahmkirina tevgeran û wekw ancamên wan, têgînên ku bi vî rengî bi nirxî ku di mejî de diafirin weke bandûra wan gotinan, di vê çerçoveyê de wê li ser wê were hizirîn. Dema ku mirov gotinek got û bi wê dilê mirovekî şand, mirov wê piştre xamgîn bibe. Mirovê ku ew gotina ne baş kir û ancama wê bi mirove li hemberî xwe re bi rastî dît ku ew jî pirr dilêş bûya, wê ew jî xamgîn bibe. Heya ku piştre ji xwe bixwe re bibêje

ku ´xwezî ku min ev gotin ji wî re nekiriba.´ Lê wî ew gotin kirîya. Ew, weke têgîneka ku bûya û afirîya. Her wusa, wê ew ne wê ji holê rakirin. Dema ku mirov nikaribê demê bi şûn ve bide û wê tiştê ku weke ku nebûyî ku bike, hingî divê ku mirov bahse têgîneka baxtewerîyekê jî li vir bike.

Rastîya tevgeran, li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku weke aliyekî giring a ku divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, gotina mirov, weke ahenge wê têgîîna wê kîjan tevgerê li ser wateya xwe re bi mirov dide kirin, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, mirov rewşeka ku mirov divê ku wê fahm bike, mirov rastî wê tê. Her wusa, gotin û tevger, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, bi aqil re divê ku mirov li ziman bihizirê. Ziman, weke rengê aqil, wê ew salixkirina bi têgînî û wateyî ya li ser wê re, bi wê re û bi hişarîya mirovî ya di mejiyê mirov de re divê ku mirov li wê bihizirê. Her wusa, salixkirina gotinan, wê weke ew rastîya ku têgîna Bûdîsmê weke di temen û hîmê dîtbarîyê û kirinîyê re ku lê digerihê jî, wê bi xwe re weke ku werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov baş fahm bike ku fahmkirin û hişarî, wê giring bê.

Di nava sînorê aqilê mirov de, tevger û gavavêtinên mirov, weke ku dibin. Lê li vir, mirov nikarê tenê bi çerçoveya wê fahmkirinê a mejiyê re wê rastîya tevgerînê, weke ku werêne ser ziman. Her wusa, piştî ku tevger û gavavêtin bû û pê de, wê şenberîyeka ku mirov dike ku wê fahm bike a li ser tevger û gavavêtinan re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, fahmkirina tevgerîyan, divê ku mirov hinekî din jî kûr li ser wê bisekinê bi tevgera mirov a jîyanî re.

Aqilê mirov, ya ku bi dîtbarî dîtîya, li ser wê re fahmkirina xwe dike. Li vir, ew têgînîya ku em bi wê re bahse cewherê dikin, di vê rewşê de hertimî bûya mijara nîqaşê ku ka tê fahmkirin û ankû nayê fahmkirin. Her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku mirov di hîmê hemû tevger û dîtharî û dîtînên xwe de ku li ´rastîyeka cewherî´ lê digerihê, her wusa di vê çerçoveyê de ew gûmana fahmkirinê wê li ser wê têgîna rastîya di hîmê dîtbarî û dîtînên mirov de bi xwe re diafirênê. Di vê çerçoveyê de, emê hinekî din jî, li ser tevgeran û ancam û têsîrên tevgeran rawastihin. Ev, wê weke mijaraka ku divê ku were **fahm kirin bê**.

Mijara rastîya tevgeran, her wusa divê ku mirov bi têgînîya ku li ser wê re di jîyanê de dihê hanîn li ser ziman re wê werênina li ser ziman. Bi tevgerî, mirov divê ku her wusa, weke aliyekî din ê tevgerîyan, her wusa, bahse têgînên giring ên li ser hebûna jîyanê bûyîn û rastîya wê re bikin.

Her tevger, dide nîşandin ku mirov dijî. Her wusa, mirov dikarê tevgerê, weke nîşanaka jîyane xwe jî werênina ser ziman. Tevger û rastîya jîyanê, her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne li ser ziman ku ji aliyên hebûnî ve li hevdû hûnandî û hoyandî ya. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku di kurdî de dema ku bahse bûyînê were kirin, bi gotineka din jî mirov dikarê bahse bûyînê bike. Her wusa, li vir, divê ku mirov hinekî li ser koka têgîna bûyînê bi tevgerîyê re mirov rawastihê.

Her wusa têgîna bûyînê, mirov dikarê di kurdî de bi wateya ´jêbûnê´ re jî werêne ser ziman. Têgîna jêbûnê, her wusa bi gotinaka din, di wateya ya ku ´jê hatî´ û ankû ´ ya ´jê tê´ mirov dikarê bi gotinî, gotina ´jêtî´ werêne ser ziman. Di kurdî de, gotina ´jêtî´, dihê wateya bûyînê, bûyîna ji dayikê û her wusa afirandinê û hwd, mirov dikarê werêne ser ziman. Dema ku mirov li zend avesta jî binerê, her wusa, weke gotinaka navê bûyînê û ankû jêbûyînê, mirov dikarê ´jêtî´ biafirêne û werêne ser ziman. Lê dema ku em li gorî morfolojîya kurdîya zend avesta ku mirov li wê bihizirê, her wusa divê ku mirov dengê ´ā´ li şûna ya ´ê´yê bicih bike û wê werêne ser ziman. Wê çaxê jî, dema ku em ´jêtî´ binivîsênin em divê ku bi rengê ´jāti´ wê binivîsênin. Her wusa, mirov divê ku werêne ser ziman ku wê piştî Zerdeştîtîyê re wê di nava têgîna bûdîsmê de jî ´jāti´ weke navê ´bûyînê´ û ankû navê têgîna ´destpêka bûyînê´ bicih bûya. Her wusa, weke gotineka wê giring jî di wê de bcih bûya.

Bûyîn, her wusa, dema ku mirov wê werêne ser ziman, weke têgîneka ku divê ku mirov wê baş fahm bike û werêne ser ziman ku têgîna ´destpêkê´ bi xwe re dihêne ser ziman. Wateya afirandinê, her wusa, wê jî, divê ku mirov bi wê re werêne ser ziman. Fahm kirina têgîna bûyînê, wê di vê çerçoveyê de biwateyekê were fahmkirin.

Li ser têgîna jîyanê re mirov li dîtbarî û ´rûyê´ jîyanê dihizirê. Têgîna dîtbarî û rûyê jîyanê, ew têgîna ku jîyanê ku dîtîna bi aqil û hiş ya jîyanê jî dike nava xwe de. Dema ku mirov li jîyanê dihizirê, mirov bi navî dibînê. Li ser wê re her wusa mirov digihijê têgînekê û hişekî. Mirov, wê hişê di mejiyê xwe de şenber dike. Li ser vê rewşê jî, bi têgînî bi awa dike. Bi têgînî biawakirin, wê taqabûlî zêhnê mirov û pêşketina wê bike di jîyanê de.. Her wusa, awa û ankû şekl, weke zêhnekî jîyanî ya bi mirov bi hişê xwe afirandîya ya.

Mirov, bi aqilê xwe dema ku dît, bi wê dîtînê re bi dîtbarî, weke ku têkilîya mejî û tiştê bi hiş bibe dibê. Her wusa, mirov bi aqilê dibînê. weke ku di hundurê mejiyê mirov de çavekî mirov hebe li mirov dihêt. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotina ´veda´ bixwe jî, wê di

wateya dîtina bi aqil bê. Lê bi wê re jî, xweşbûneka bi dîtinê re ku bi mirov re rehetîyê çê dike, wê jî bi xwe re dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de têgîn û ankû hiş, weke aliyekî ku temenê wê li ser dîtina bi dîtbarî a jîyanê ya.

Mirov, dema ku dike ku biaqil bike, rêyên ku mirov bi wan digrê, her wusa, dîtina bi çav, hiskirin(bihîstin)a bi gûh, têj(tahm) kirina bi ziman, Bêhn kirina bi bêhvilê û laşê mirov ê ku dema ku mirov bi destlêdanê li wê dike û bi wê bi bîyên mirov, êdî ku mirov digirê ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna hişî, her wusa, li ser van aliyên mirov ên bi mejî û têkiliya wan ya bi mejî re ya. Mirov, divê ku vê yekê jî, werêne ser ziman, ku her wusa, hişê ku mirov bi van rêyan digirê, wê rengekî zêhnî jî bi xwe re bide dîyarkirin.

Em li vir, di kurdî de bi rewşekî bahsê bikin. Dema ku mirov di kurdî de bi mejî hiş kir, ew hiş û ankû zêhn a. Lê dema ku mirov aqilî li ser tevgerên xwe re da nîşandin, ew weke ku di kurdî de jî dihê hanîn li ser ziman, ji wê re ´jîr´ dihêt gotin. Her wusa, gotinên weke ´hiş´ û ´jîr´, di kurdî de weke gotinna navdar in. Li vir, em dema ku bahse jîrîya tevgerî dikin, emê gotina ´jîrê´ wê li vir werênina li ser ziman. ´Tevgerên mirov, wê aqilekî çawa bidina nîşandin?´ Di nava kurdan de, gotinaka pir navdar hebû. Dihat gotin ku ´mirovê jîr, di hêka xwe de kifş a? Bi wê re jî, li kirinên mirov ên di jîyanê de dihê nerîn ku çendî bi rêzkar(disîplîn) û aqilane ya. Her wusa, ew jîrîya ku dihê xwestin ku ji kirin, tevger û gavavêtinên mirov were xwandin, wê li tevgeran were nerîn û bê xwestin ku were dîtin.

Jîrî, rast û bi aqil, dîtina tevger û kirinê jî ji mirov dixwezêt. Lê li vir, ev têgîna jîrî ku dihê xwestin ku were ditin û fahmkirin, bi demê re jî xwediyê wateyekê ya. Her wusa, minaq, mirov bi aqilî, çendî jîyane xwe buhûrand û kêm kêmesî kirin, wê di vê çerçoveyê de bi têgînî jîrîya mirov bi aqilê mirov werêne ser ziman. Hişmendîya aqilê mirov, di temenê gotina jîrê de heya.

Jîr, li vir, her wusa, weke gotineka ku divê ku mirov wê bi teybetî di vê çerçoveyê de werêne ser ziman a. Aqil, weke aliyekî giring ê mirov a. Mirov, bi aqilê xwe re di jîyanê de dijî. Lê li vir, divê ku mirov, werêne ser ziman ku mirov bi tevgerî, di jîyanê de zindîtî û jîndîtîya xwe dide dîyarkirin. Aqilîya mirov, her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov dinerê, mirov dibînê ku bi tevgerên mirov re xwe dide dîyarkirin. Çerçoveya kirin, tevger û gavavêtinên mirov ên di jîyanê de, wê bi ahengîya tevgerî ya bi hevdû re, wê aqilîya mirov a jîrî bide nîşandin.

Her wusa, em di vê çerçoveyê de vê yekê jî, divê ku mirov werênina ser ziman ku hişmendîya mirov, rastteqînîya wê, hertimî, weke pirseka **li pêşîya wê ya.**

Rastîtî. her wusa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîneka biaqil a. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina li ser ziman ku têgîna rastîyê, weke ku mirov bi wê re kifş dike, ast û pîvanaka bi têgînî ya bi hiş dihêne ser ziman. Kurdîye me ya î ro, ku em wê bikardihênin, em bi wate û kirdeyên wê re, divê ku mirov bibêjin ku weke rewşên wê yên berê hê dihênin ser ziman. Di vê çerçoveyê de têgîna ziman û rastîyê, bi hevdû re divê ku mirov li vir werêne li ser ziman. Hizir û ankû weke ku em li vir bi wê hizir dikin aqil, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, her wusa, weke dîtbarîya mirov a ji rewşê bihiş dihê ser ziman. Lê bi darêjk û çerçoveya wê ya gotinî re, çerçoveyeka têgînî û rewîstî jî dihêne ser ziman. Aqil, dîtbarîya jîyanî a razber a.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku tişta ku mirov bi hizirkirinê, aqil, axiftin û her wusa nîşanaka û laşê mirov, her hanîna li ser ziman, wê weke tevgerî û çalakîyeka mirov bê. Hanîna li ser ziman, dema ku weke ku mirov bixwezê bê, wê rehetîyekê bide mirov. Rehetîya mirovî a laşî, wê weke temenekê bê. Li vir, divê ku mirov wê rehetîya bi laşê xwe re baş fahm bike. Rehetîya bi laş re, wê bandûra wê li ser mejiyê mirov jî hebe. Rengê hizirkirina wê, mêl û aliyê wê jî, wê karibê bide dîyarkirin. Laşekî bibîrîn û bîrîndar, wê nikaaribê rehet bê. Heta ku ew bîrîn ne kewê û baş nebê, wê mirov jî rehet nebê.

Her wusa mirov dikarê vê rehetîya xwe ya laşî, di vê çerçoveyê de bişibêne rehetîyeka bi laşê bêbîrîn jî. Mejî, di nava rewşên ku dijî de, dikê ku wan rewşan fahm bike û xwe li gorî wan biadilêne û bihizirê. Li vir, weke ku çawa ku miro nikarê bibêje ku laşekî bi bîrîn, ku nikaribê rehet bibe, wê mejiyekî ne rehet jî, nikaribê, baş bihizirê.

Rehetî, aramî û hêmînîya mirov a. Mirov, divê ku li vir, rehetîyê, weke astekê jî werêne ser ziman. Her wusa, di rewşeka weha d hizirîn û rehetîya bi hevdû re bûda, weke ´aramîya zêhnî´ jî dihêne ser ziman. Ev têgîna aramîya zêhnî, mirov dikarê bi têgîna rewîstî re jî di vê çerçoveya adilîna mirov a di jîyanê de werêne ser ziman. Aramî, weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov werêne ser ziman a. Aramî, xweşîya dil a. Her wusa, dîsa aramî rehetîya zêhnî a di mejî de ya. Mirov, bi hiş re û bi dîtbarîya hişî re, jîyanê dibînê û lê dihizirê.

Temenê rehetî, xweşî û aramiyê çî ya? Pêşî, ew a ku mirov di dilê xwe de û her wusa di mejiyê xwe de rehet bê. Mirov, dest li ti kesekî

nedabê bi xirabî. Mirov, zirer û zîyan nedabê ti kesekî. Dizî, nekiribê. Tenê, ya ku mirov bi maf kiribê, wê hilde. Destavêtinê bi laşî(fîzîkî) û mejî(hizirkirinî) nekê. Mirov, dema ku mêrekî dest avêt jinekî dervî vîna wê, ew pêşî xwe bi keseyetîya xwe re di mejîyê xwe de dikujê. Piştre jî, li ser wê kuştinê re kuştina xwe ya dûyemin a bi destavêtinê re dike.

Em dema ku li ser têgîna zend avesta´ya zerdeşt re dihizirin, em dibînin ku zerdeşt, pîrozîya jinê, di xate yazdaniyê de hanîya ser ziman. Ev pîrozî ya jinê, di xate yazdaniyê de, em bi melekê tawis re jî dibînin, bi Mîtra re jî dibînin, bi Zerdeşt re jî dibînin û her wusa bi Manî re jî dibînin. Her wusa, Bûda jî, destavêtin, weke xalekê red kirîya û mahkûm kirîya. Di vê çerçoveyê de, weke ku di xatekê de hevdû temem kirina. Bi wê re jî, kirina derewê jî, hatîya qadaxa kirin. Derew, dema ku yek bi gotineka ´ne rast´ aqilê yekî ji rê bibe, dihêne ser ziman. Biqasî, derewê û destavêtinê ku xirab hatîya hanîn li ser ziman, dema ku mirov serxoş bibe û ji xwe herê ya. Bo vê yekê, tiştên ku weke ji xwe kirinê û ji hiş birinê, hatina red kirin. Bi hişbûn û di hiş de mayîn, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov werêne ser ziman, li vir bi hizrên Bûda re jî weke ku bi Zerdeşt re dihê ditin bi wî re jî tê ditin.

Li vir jî, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku zorîtî û zordarî û bi zorê û darêzorê dana herêkirinê, ne di hundûrê felsefeya Zerdeşt de heya û ne jî di hundûrê felsefe Bûda de heya. Ya ku ji dilê mirov tê çi ya, ew weke ku dihê esas girtin. Mirov, pêşî xwe û keseyetîya xwe, bi pêşxistin û hişmendîyê re pêş dixe û nas dike. Rê û rêgezên ku ew bi wan xwe pêş bixe, di vê çerçoveyê de tenê hatina hanîn li ser ziman. Mirov, wê çawa fahm bike ku xwe pêşxistîya? Di jîyan de xwe de bi tevgerî ku jîr bê, bi aqil û hişmendî, li ser dîtin, bihîstin, bêhnkirin û destlêdana li xwe re ku zêhnê xwe re yê fahmkirinê pêşxistibê, û di nêzîkatîya xwe de bi çerçoveyî bijî bê, hingî mirov dikarê wê bibêje.

Hemû têgîna ku hatîya li ser ziman, li vir, di vê çerçoveyê de na ku wê çawa jîyan bi rastî, başî û rehetî werê jîyîn a. Ev jî, çawa dihên dîtin û fahmkirin? Mirov, di jîyane xwe de her hal û rewşa mirov, wê bi xwe re rastîyê werêne ser ziman. Bi rêzgezî jîyan kirin, her wusa, wê çawa were jîyîn, ew hatîya kifşkirin. Di dema wê de xwarina taştê, firavîn û şîvê û hwd, wê tenê aliyekî wê kifşkirina di jîyanê de bê. Her tişt li cihê wê û di dema wê de rast a. Her tişta ku mirov ji rê derdixe û ankû mirov derdixe dervî wê rewşa jîyane mirov ku mirov di wê de rehet û xweş a, weke ku hatîya xwestin ku newê kirin. Di vê çerçoveyê de her wusa di jîyanê de çendî ku mirov bi meji û hişê xwe re safî û zelal bû, wê ewçendî jî mirov

di jîyanê de serkevtî bike. Her wusa, wê rehetîya gîyane mirov jî ev bixwe re bêne.

Her wusa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku Bi têgîna Zerdeşt re ya ku mirov kifş dike, ew a ku ´rêya ku diçê yazdan´, Zerdeşt hanîya li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê ya rast çi bê û çawa were kirin, di wê çerçoveyê de hanîya li ser ziman. Em vê rewşê di nava bûdîstan jî dibînin. Her wusa, bûdîstan, ´têgîna rêya ku diçê bûda´ şîrovekirina û hanîna li ser ziman. Di vê çerçoveyê de ew hanîna li ser ziman. Gotinên Bûda, ên weke ´min rast fahm bikin´, ´min baş fahm bikin´ û ankû ´ di rêya min de bimeşin, li vir mirov dikarê weke minaq **werêne ser ziman**.

Li vir, divê ku vê vê yekê jî baş werênina ser ziman, di van deman de hewldana´fahmkirinê´ wê zêdetirî derkeve li pêş. Her wusa, li ser rewşa jîyanê a tevgerî, kirinî û hwd re wê li vacekê di hizirkirinê de li wê were lêgerîn. Jîyane mirov, her wusa, wê çawa baş bibe, li ser wê re hizirkirin, wê mirov, hin bi hin bike ku li ser tevger û kirinan re bihizirê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku fahmkirina biaqil, di vê çerçoveyê de jî wê zêdetirî derkeve li Pêş.

Ev serdemên ku em bahse wan dikin, wê weke serdemna ku di wan de civatîtî hin bi hin pêş dikeve bê. Her wusa di vê çerçoveyê de adilandina li ser tevgerîyan re, wê temenê pêşketina civatîtîyê jî bide çêkirin. Civatîtî, her wusa, li vir, divê ku mirov fahm bike, ku bi fahmkirin û nasînê re wê derûnîya wê komelî û ankû ya girseyî biafirê. Ev derûnîya girseyî, wê temenê bi hevdû re jîyanê bê. Mirov, di nava wê derûnîyê de dike ku xwe ´baş´ bike. Her wusa, derûnîya girseyî, wê temenê pêşketina têgîa civatîtîyê jî bê.

Em li vir, divê ku hinekî li ser civatîtîyê jî bihizirin. Ji ber ku ev jî, li vir, weke ku weke pêwîstîtîyekê ya. Civatîtî, wê tevger, kirin û rengê gavavêtina mirov bide dîyarkirin. Gotinên bi aqil ên ku dihên ser ziman, rengekî rewîstî bi awayê kevneşopî jî bi xwe re bide dîyarkirin. Li vir, her wusa divê ku mirov vê yekê jî baş fahm bike ku li ser vê re Bûda dibêje ku ´hizir, tê wateya gotin û çalakîya zelal´ di jîyanê de. Vê gotinê li ser temenê ku bi şîroveyî weke rewîstîtîyê şîrove bike jî dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de biwasîfkirina aqil û fahmkirina wê, her wusa, wê aliyekî temenê fahmkirinê bê. Aqil, çawa dibê temenê fahmkirinê? Her wusa, piştî ku hizirkirin bû û pê de, wê hanîna li ser ziman bibe. Hanîna li ser ziman, wê rengekî mayîndakirina hizrê jî bê. Her wusa, divê ku mirov giringîyeka mazin bi nivîsandinê û destpêka wê re bipîvîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku aqil, li vir,

dema ku hat hanîn li ser ziman û pê de, wê temenekî hizirkirinê jî biafirê. Êdî li ser wî aqilî re, wê hizirkirina li hebûna aqil û ankû hizirkirinê jî wê pêş bikeve û bi wasîf(nîtelîk) jî bibe.

´Xwestekên civatî´, li vir, divê ku mirov weke gotinekê hilde li dest û li wê bihizirê. Her wusa, ev gotin, wê têgînekê di çerçoveya fahmkirina me ya di xate têgîna ji Zerdeşt û heta Bûda ku pêş dikeve de jî bide me. Li vir, em vê yekê di serî de werênina ser ziman ku hebûna civatî û pêvajoyên wê ên pêşketinê ên van pêvajoyan, wê temenê hizirkirin û adilandina bi hizirînî bê. Mirov, wê bi aqilê xwe re li ser wê bihizirê. Her wusa, mirov di wê çerçoveyê de çawa xwe rehet û di xweşîyê e hîs bike, hinekî jî li ser wê re dihizirê. Zerdeşt, wê bi teybetî, di vê çerçoveyê de, hinek rêgezna werêne ser ziman ku mirov çawa karibê xwe di nava wê jîyanê de bide jîyan kirin. Her wusa, li parastgehê perwerde bûn û hwd, wê di vê çerçoveyê de derkeve li pêş. Li vir, ya ku mirov kifş dike, ew a ku Zerdeşt, wê têgîna civatîtîyê weke ku bi hîskirina bi xwe re de kifş dike û di wê çerçoveyê de hizirkirinekê pêş dixe. Di nava wê jîyanê û rengê ku ew hizir dike de, mirov û erka mirov û berî hertiştî wasîf(nîtelîk)ê mirov divê ku çawa bê û di kîjan ast û radayê de bê, li wê dihizirê. Ev rengê hizirkirinê, her wusa, wê çerçoveyeka civatîtîyê hin bi hin derxe li holê. Ya ku wê bi hizirkirina Zerdeşt re, ´zend avesta, di rengê binetereka hemdem a têgîna civatî de derxe li holê û bide dîyarkirin, wê hinekî jî ev rengê hizirkirina Zerdeşt bê. Ev rengê hizirkirinê ku Zerdeşt bi xwe re kifş kirîya, wê êdî piştî wî re ji aliyê mejiyê Bûda û mirovên weke wî ve jî were kifşkirin. Êdî li ser wê re rengên nûû ên bi pergalî ên hizirkirinê dihên pêşxistin.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku Zerdeşt, hizirkirina wî, serdemekê dide destpêkirin bi xwe re. Lê temenê rengê hizirkirina Zerdeşt jî heya. Divê ku em bi gotinekî jî bê, bahse wê jî bikin. Dema ku em bahse temenê hizirkirina Zerdeşt bikin, wê di cih de serdema Mîtannîyan û pêşketina bi Mîtra û hizrên wî re were berbîra me. Mîtra, di vê çerçoveyê de, li ser keseyetê û her wusa rengekî têgînî ên ku mirov dikarê bi civatî re werêne ser ziman, hizirîya. Hizira wê û felsefeya wê kirîya. Têgîna bawerîyî ya wê, bi hizrên xwe re pêşxistîya. Her wusa, mirov, çawa baştira û dikarê biafirêne û xwe pêş bixe li wê hizirîya. bendên mirov ên ku li pêşîya wî û pêşketina wî dibina astang ku ji nava jîyanê bin û ku di mejî de û bi derûnî û hwd bin, bi awayekî weke ku li wan jî hizirî ya.

Mîtra, hizirkirina wî û rengê hizirkirina wî, wê weke rengekî felsefekî

ê hemdem ku êdî keseyetîyê dike nava xwe de bê. Ji xwe, hizirkirinên piştre ên ku Zerdeşt û piştî wî re Bûda jî dike, wê li ser keseyetîyê û rewşa wê bin. Keseyet, wê çawa pêş bikeve û xwe pêş bixe, li rê û rêbazên wê hatîya lêgerîn. Derûnîya wê keseyetîyê, hatîya kifşkirin û ew hatîya bicih kirin. Ji mirov hatîya xwestin ku li gorî wê bijîn. Di destpêka pêşketina jîyane civatîtîyê de, her wusa, di vê çerçoveyê de, ji ser tevger û kirin û gavavêtinên mirov re bi rêxistinkirin û rêzkarî(disîplîn) kirina mirov û ji wê jî çêkirina fahmkirinekê, her wusa, wê bi jîyanê re û rengê jîyane mirov re tevgerên mirov, rewş û halên mirov ên di jîyanê de, nêzîkatîya mirov a li hevdû û li hemberê hevdû û hwd, di van çerçoveyan de wê hizirkirin bibe. Di vê çerçoveyê de perwerdekirina keseyetîyê, wê derkeve li pêş. Mirov, dikarê Bûda, weke perwerdekarê keseyetê li ser têgîna gîyanê re jî werêne ser ziman. Êdî li gorî wê têgîna gîyanê û keseyeta perwerdekirî ku wê laşê mirov çawa bijî ku êdî li ser wê re ku ew xwe bide dîyarkirin.

Hizra Zerdeşt ew a ku di nava koma civatî ya ku mirov di wê de dijî de ku ji xwe û keseyetîya xwe destpê bike û gavê biavêjê. Yanî, ji xwe gavekê biavêje. Li şûna ku mirov bi nerîna xwe mirovên dîn darazêne, pêşî xwe darêzêne û ji xwe rastkirinê bide destpêkirin. Herkesek, ku ji xwe destpê bike, wê êdî ew di çerçoveya civatî de xwe bide dîyarkirin. Di dewama vê hizrê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku Zerdeşt hanîya li ser ziman, wê Bûda jî, werêne ser ziman ku ´mirov, ji kirin û tevgerên xwe berpirsîyar a.´ Têgîna berpirsîyarîyê, weke têgîneka rewîstî û wijdanî divê ku mirov li wê bihizirê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov dihizirê, têgînên weke ên berpirsîyarîyê, wijdan û merdîtîyê û hwd, wê di vê çerçoveyê de bi rengekî têgînî xwe bidina dîyarkirin. Berpirsîyarî, mesûlîyeta mirov ji kirinên mirov dihêne ser ziman. Wijdan, bi têgîna ´ya ku mirov ji xwe re rast nebînê ku ji yên din re jî rast nebînê´ têgîneka rewîstî û felsefîkî jî ya. Ev têgîn, her wusa, rastîtîyê, bi felsefîkî di temenê xwe de dihawêne. Di jîyanê de li ser tevger û kirinên mirov re li wê dihê nerîn. Mirov, ku ne bêxam bê, weke ku li êşa xwe hizirî li ya li hemberê xwe jî bihizirê, dilê ti kesekî ne şikêne, maf û azadîya ti kesekî din binpê nekê û hwd. Di vê çerçoveyê de, bi têgînna jîyanî, felsefîkî û rewîstî re mirov wê fahm dike. Têgîna merdîtîyê jî, her wusa, ew a ku mirov ne egoîst bê ku tenê ji xwe re bixwezê. Her wusa azwerîya keseyetîyê ku tenê ji xwe re dixwezê, weke nexweşîyekê dikarê mirov bike nava lapên xwe de ku mirov êdî ji wê xilas nebê. Merdîtî, weke têgîna vajî ya qasîsî û egoîsmê ya. Qasîsî,

rengê wê hêsta ku mirov ji xwe û keseyetîya xwe û pê ve, ti kesekî din nabînê ya. Tenê, ji xwe re dixwezê.

Di nava kurdan de mirovê nemerd û qasîs, weke mirov çûrûk dihê bi navkirin û dihê hanîn li ser ziman. Ev rengê mirov, li ti kesekî nahizirê. Tenê li xwe dihizirê. Hertiştî ji xwe re dixwezê. Di nava civate ku dijî de, dixwezê ku herkesek, ji wî re bêne. Dixwezê ku herkesek, wî bibînê. Bo vê yekê ya, ku Bûda jî, weke Zerdeşt, rexne li keseyetîyê û agoya wê kirîya. Hebûna ´keseyetîyê, bi têgîna ezîtîyê´ re di vê çerçoveyê de, weke nexweşîyeka ku mirov divê ku ji wê bi bûhûrê û li wê ne hisêne hanîna li ser ziman.

Keseyet, rengê wê yê ku mirov divê ku mirov werêne ser ziman, ew a ku karibê bi têgînên weke berpirsîyarî, merdî û wijdanî werê ser ziman a. Her wusa, ya keseyetîyeka bi dadî, mirov dikarê vê werêne ser ziman. Li şûna ku li xwe dihizirê û tenê ji xwe re dixwezê, li yên dervî xwe jî bihizirê û ji wan re jî bixwezê. Di vê çerçoveyê de weke keseyetîyeka civatî, hatîya hanîn li ser ziman. Têgîna keseyetîyekê û civatîtîyeka rast, di vê çerçoveyê de rast hatîya hanîna li ser ziman. Civat, ku bi keseyetîyeka biazwer ku tenê ji xwe re bixwezê bijî, ew keseyet, weke keseyetîyeka nexweş jî hatîya hanîn li ser ziman. Zerdeşt jî û piştî Bûda jî, wusa hanîya li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dema ku bahse keseyetîyê hatîya kirin di vê çerçoveyê de jî bahse wê hatîya kirin. Her wusa, Têgîna keseyetîyê, weke têgîneka giring ya ku divê ku mirov li wê bihizirê û wê werêne li ser ziman a. ´Keseyeta rast´, li wê û rengê jîyane wê hatîya lêgerîn. Aqil, bo wê hatîya bikarhanîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku keseyet, di çerçoveya têgînek civatî de li wê hatîya hizirîn. Li vir, divê ku mirov wê kifş bike û werêne ser ziman ku Fahmkirina keseyetîyê, bi têgîna civatî re li wê hatîya hizirîn. Bûda, wê di çerçoveyekê de bihzirê ku biqasî hizirkirina bi aqil, wê giringîya tevger, kirin û gavavêtina mirov jî werêne ser ziman. Her wusa, tevger û kirin ku di hundûrê aqil û bi tevgerî, li wê hatîya hizirîn. Rêzkarî(disîplîn) kirina tevger û kirin û gavavêtinên mirov, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bi têgînî derkeve li pêş. Mirov, çi kirin û tevger kir û da nîşandin, wê şaş û xelat bê? Her wusa, mirov, dema ku divê ku mirov hêdîka bimeşê ku mirov bibazê, dema ku mirov divê ku bêdeng bimêne ku mirov deng derxe, dema ku mirov bi çavekî xirab li yekê binerê, dema ku mirov tiştekî ne rast ku mirov dizanê ku ne rasta( bi derewînî) û werêne ser ziman, dema

ku mirov tiştekî ku ne yê mirov bê û ne aîdî mirov bê û mirov wê ji xwe re hilde û lê xwedî derkeve û hwd, weke tevger, kirin û gavavêtinna ne rast in. Şaş û xelat in.

Her kirina ku mirov di mejîyê xwe de zanibê ku ´ne rast´ a û ankû ´xelat´ a, kirina wê, wê dilê mirov jî rehet nekê. Çendî ku mirov ket farq û zanîna wê de, wê ew zêdetirî mirov di hundûrê mirov de bi zanînî û derûnî, di mejî û dilê mirov de êdî mirov ne rehet bike. Mirov wê ne rehet bê. Her tişta ku li gorî rewşa mirov a jîyanê ku mirov ku ne rast bê û mirov bike, wê mirov jî aciz û ne rehet bike. Ne rehetî, di temenê wê de, ne herê kirina dil jî heya Ne herê kirina dil, ne rast ditina dil a.

Zerdeşt, xwe li jîyane çîlekeş jî danî. Wî gelek demên xwe bi tenê di nava çîle û êşê de bûhûrand. Wî, bi wê êş kişandinê, xwest ku nefsa xwe terbîya bike. Her wusa, jîyane çîlekeşî, di vê çerçoveyê de, weke rêyeka terbîya kirina keseyetê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Gotina ´terbîyê´, em li vir di wateya perwerdekirinê de biakrdihênin. Jîyane êş kişandinê û ankû çîlekeşîyê, her wusa, divê ku mirov weke rengekî perwerde kirinê jî werêne ser ziman. Zerdeşt jî û bûda jî, bi ezîtîya keseyetîyê ya ku pêş dikeve û hertimî dike ku xwe serdest bike re têkoşîya na.

Çîlekeşî, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rêyeka ku bi wê hewl dihê dayîn ku keseyet û rengê jîyane wê were kifşkirin a. Bi wê re jî, bi ego´yên keseyetîyê re sînorê keseyetîyê kifş bikin. Di kîjan sînorê de keseyet, zorê dide laşe mirov û zayîf dikeve, ji wê aliyê ve bi aqil çûyan bi ser keseyet û bi wir de birina sînorê keseyetîyê ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku divê ku weke tekoşîna bi keseyetîyê re werênina ser ziman. Mirov, dema ku bi zanînî bi vi rengî çû biser keseyetîya xwe de êdî mirov weke ku Zerdeşt jî dihêne ser ziman, li xwe ´şîyar´ dibe. Li xwe şîyarbûn, ketina farqe xwe de bi zanebûnê ya. Ji xwe, ew çûyîna ´nîrwana´ a bûdîsmê jî, armanca wê li xwe şîyarbûn a. Ketina farqe xwe, keseyet û rastîya xwe de di jîyanê de. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov têgîna şîyarîyê, weke têgîneka armancî, bi zanînê re di vê çerçoveyê de di temenê wê çîlekeşîyê de jî **werêne ser ziman**.

Jîyane çîlekşîyê, armancên wê ên sereke ew in ku mirov bigihijê rewîsteke(ahlaqekê)î xweşik, hizirkirineka rast û aqilmendîyekê. Her wusa, di vê çerçoveyê de aqilmendî, bi şîyarbûna mirov re wê bibe. Mirov, bi kifşkirina xwe û jîyanê re wê bigihijê wê. Di vê çerçoveyê de êdî li wê dihê hizirîn. Hizirîna li ´rewîsteke xweşik´, di jîyane mirov de bi

jîyankirina mirov re dihê dîtin. Rastîya keseyetîyê, di vê çerçoveyê de weke têgîneka ku mirov weke temen li wê bihizirê ya. Bo vê yekê ya, ku pirr zêde li ser keseyetîyê dihê hizirîn.

Mirov, dema ku bahse qûtkirina têkilîyên xwe ji jîyanê jî, wê di vê çerçoveyê de bi xwe bixwe re mayînê, di temenê wê de dihêne ser ziman. Mirov, li vir, dema ku li wî dihê hizirîn li ´xwezayîya´ wê dihê hizirîn. Armanc, fahmkirin û gihiştina xwezayîya jîyanê û bi wê re li gorî wê jîyan kirina mirov a.

Têgîna xwezayê, li vir, divê ku mirov baş fahm bike. Têgîna xwezaya jîyanê, wê di armanca pirranîya felsefeyên bi vî rengî de bê. Çend ku têgînîn felsefîkî ên weke Bûdîsmê û hwd ku temenê xwe li ser têgîneka civatîtîyê ava dikin jî, lê ji aliyekî ve bi tememî bi rengê jîyane xwe re bi wê najîn. Her wusa, hertimî, bi tememî xwe di nava wê de winda nekirin, weke ku esas dihê girtin. Weke ku ev jî, weke aliyekî ku mirov hertimî bi hişyarî û şîyarî karibê ku bijî, di wê çerçoveyê de dihê kirin. Bûda, di nava rengê kevneşopîya civatîtîyê de pergalîyek perwerdeyê ya kevneşopî, dihêne ser ziman. Lê rengê jîyankirinê jî, her wusa, di vê çerçoveyê de di xwe de û bi xwe re jîyan kirinê dihêne ser ziman.

Keseyet, weke aliyekî wê yê giring ew a ku bi xwe bizanebûna xwe re rabê. Fahm bike. Tevgerên xwe, biadilêne. Bizane bê. Zanibê ku  ku çi dike. Her wusa, ku mirov xwediyê wê karîna kirinê jî bê. Bi keseyetîya xwe re bi berpirsîyarî, merdî û wijdanî tevbigerihê. Di vê çerçoveyekê de keseyetîyeka ku xwediyê rewîstek xweşîk, şîyarbûyî û zane armanc dihê girtin. Rêyên gihiştina vê keseyetîyê, li wan dihê lêgerîn. Her wusa, keseyetîyek ku paqij û ne lewitî, dihê hizrîn. Lewîtîn, her wusa bi kirinên û tevgerên mirov ên ne baş re jî ya. Dema ku mirov nemerd bê, dema ku mirov bêwijdan bê, dema ku mirov ne xwediyê hêsteka berpirsîyarîyê bê û hwd, di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werêne wer ziman.

Di dema Zerdeştîtîyê de û her wusa di nava Bûdîsmê de xwe li parastgehê girtin, ku di wê de mirov bi xwe re bimêne. Her wusa, li xwe bihizirê. Xwe rast bike. Bi jîyane xwe re bi pergalî û her wusa tenê bi xwe re jîyînê, esas digirê. Di vê çerçoveyê de hertimî hizirîna li cewherê, wê di vê çerçoveyê de bê. Her dîtbarî û dîtinên mirovî, bûda dihêne ser ziman ku cewherekî wê yê ku mirov wê fahm bike heya. Bo vê yekê, armanca fahhmkirina wê cewherê, li pêş a. Di nava têgîna cewherê û şekl de wê farqê ku mirov bibînê. Dema ku mirov cewherê fahm bike, wê şekl jî fahm bike. Ya giring, di vê çerçoveyê de fahmkirina cewherê û wê rastîya di hîmê her dîtbarî, dîtin û tiştê de ya.

Her wusa, di jîyane parastgehê de ya giring ew a ku cewherê rêgez û rêzikên jîyanî fahm bike. Dema ku mirov ew fahm kir, mirov wê karibê li ser wan re şîyarîyê çê bike. Hingî, ya qanc û xirab, mirov wê ji hevdû cûda bike. Dema ku mirov cewher û rastteqînîya wê fahm kir, mirov wê êdî bi zanebûna wê, bigihijê ya asta bilind. Armanc, gihiştina ya asta bilind ya cewherê û rastteqînîyê ya.

Jîyane ku xwe dayî bi jîyankirina fahmkirina rastiyê, hertimî weke rastîya ku sînorê heyî fahm dike û ji wê di buhûrê ya. Sînorê zanîna mirov çi ya û li kû ya? Bi tevger û kirinên mirov re, li wê dihê hizirîn.

Li vir, weke aliyekî giring, divê ku mirov werêne ser ziman, ku keseyet, weke aliyekî giring derdikeve li holê. Têgîna keseyetê, nêvî bi nêvî li ser gîyanê û zanebûnê re û her wusa li ser wê jîyane ku di wê de dijî re dihê hanîn li ser ziman. Mirov, bi wê re li keseyetîyê dihizirê.

Kirinên mirov, çawa wê werina fahmkirin, li wê dihizirê. Her wusa, dema ku mirov li ser kirinê re li pêşîya xwe dinerê, wê ancamên wê çawa bin, di wê çerçoveyê de bin, di wê çerçoveyê de li wê dihê hizirîn. Her kirina mirov, wê ancamên wê ên ku piştî bûna wê tevgerê re wê hebin. Wê ancamên wê kirinê û ankû tevgerê baş bin û ankû xirab bin, wê di wê çerçoveyê de li wê were hizirîn. Zerdeşt, dibêje ku ´wê her mirov ji kirinên xwe û ancamên wê berpirsîyar bê.´ Bûda, hinekî din jî, bi wirde diçê û dibêje ku wê ancamên kirinên mirov, nifşên piştî me re ku tên jî wê bi başî û xirabî bijîn. Di vê çerçoveyê de kirin û dîtina pêşîya wê kirinê û tevgerê, bi fahmkirina cewherê wê, rastteqînî û her wusa rastîya ku di temenê dîtbarî, dîtin, kirin û her wusa her tevgerê mirov de ya.

Tevger û ankû kirin û dîtina pêşîya wê, di vê çerçoveyê de li ser cewherê re li wê dihê hizirîn. Şekl û ankû awa, tenê rengekî ku hatîya û dîyar bûya ya. Ew tenê, wê weke qalikekê bê. Lê dema ku mirov herê hîmê wê qalikê û ankû şeklê, mirov wê herê wê rastîya hîmî ku mirov divê ku wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de rêyên xwe gihandina wê rastîya hîmî, li wê hatîya hizirîn. Bûda, li wê dihizirê. Zerdeşt jî, berî wî li wê hizirî ya. Piştî Zerdeşt û Bûda re Manî jî, li wê hizirî ya. Ew rastîya hîmî ya cewherî ku wê mirov bigihijê zanîna bingihîn ya destpêkê jî, li wê dihê hizirîn. Her wusa li parastgehê, çûyîna ´nîrwana´, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin.

Xwe dayîna li jîyane fahmkirina cewherê li parastgehê, wê bi rêyên fahmkirinê re bê. Her wusa, rêyên fahmkirinê û hewldana fahmkirinê û gihiştina cewherê ên weke ´medîtasyonê´ û hwd. Di serdemên Bûda de, wê mirovên ku xwe didina wê jîyanê wê bikin. Bo ku mirov, xwe bide

wê jîyanê jî, mirov, pêşî di nava jîyane xwe de hemû bendên xwe yên li şûn xwe êdî xwe ji wan qût dike. Wan li şûn xwe dihêle. Her wusa, medîtasyon, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê rêya bi hizirkirinê xwe gihandina rastiyê bê. Weke ku li ser hîsa şeşemîn´ re bê ku dihizirê, rewşek xwe bi wê re dide dîyarkirin. Mirov, bi dîtinê, bihîstinê, bêhnkirin, desthilatdan û têjgirtinê û hwd, derka dûnya derve dike. Lê bi hiş û hîskirinê jî, weke rêya li ser aqil re ku weke **´hêsta şeşemin´** jî mirov dikarê werêne ser ziman, wê li ser wê bê. Di vê çerçoveyê de, hizra zêhnê, wê weke hizreka baş bê, ku mirov bi wê li vir fahm bike. Li ser van her pênç rêyên derkkirina dûya derve re, bi girtina bi dîtinê, bêhnkirinê, destlêdanê, têjgirtinê, bihîstinê û hwd re hişkirina ku mirov derkkirî, wê weke aqilê jîrî jî bê. Aqilê jîrî, aqilê hişî ê derkkirina dûnya derve a li ser van her pênc rêyên **girtinê re bê.**

Mirov, bi aqilê xwe re kifş dike. Li ser aqilê xwe re dibînê. Her wusa, di nava têgîna zendê´ de, wê çawa aqil bi zelalîya wê re were bikarhanîn, hinekî jî, mirov di vê çerçoveyê de wê kifş dike. Li vir, bo fahmkirina xwe gihandina aqilê rast û rastîya aqil, her wusa, bikarhanîna rê û rêbaza ´medîtasyonê´ li vir divê ku mirov bibîr bike. Medîtasyon, divê ku mirov li ser rastîya wê hinekî bisekinê. Her wusa, medîtasyon, weke rêyeka hizirkirinê û bi wê re jî ku wê çawa êdî bi aqil dîtinê mirov jîyanê pêş dixe jî dihêne ser ziman. Medîtasyon, bi serekeyî bi du û ankû sê mijaran re wê eleqeder bibe. Pêşketina jîr û zêhnê û her wusa bikarhanîna wê ya di jîyanê de wê, bi medîtasyonê li wê were hizirîn. Medîstayon, her wusa, wê bi zelalîya zêhnê re, di jîyanê de bi wê bi dîtinê û her wusa kifşkirina bi wê re di jîyanê de ji xwe re dike armanc.

Medîtasyon, armanca wê ya din jî, ew a ku mejî û ankû dîtinê weke ku bûdîst jî dihênina ser ziman, ji ´lewitînên zêhnî´ paqij bike dihê kirin. Piştî ku ev paqijbûn bû û pê de, wê êdî aramîbûn, rehetî û zelalî bibe. Her wusa, dîtina rast, weke ku dihê hanîn li ser ziman ku mirov ji lewitînên zêhnî´ ku xwe xilas bike û pê de, dibê.

Yekî ku care pêşî medîtasyona xwe rast kir û gihand sêrî û pê de, êdî wê karibê noqî nava rastîya zêhnê bibe. Wê rastî û rûyê wê yê rast bibînê û fahm bike. Wê şîyarî pêre çê bibe. Wê xwe ji hemû bend û girêdan, êş û elem, ne rastî û ne başîyan wê xilas bike. Weke Zerdeştîyan, wê bûdayî jî, li ser çokên xwe rûnihin û medîtasyonê bikin. Lê Mîtrayîyan, di meşîn di bin tava rojê de û gotinên xwe yên pîroz digotin û dikirin. Lê li vir, ya giring ew a ku mirov medîtasyona xwe bir sêrî, êdî wê şîyarî di mejîyê wî de bibe. Li ser wê re jî, êdî wê aqilê xwe di çerçoveyeke xweza û rast de

bi rehetî êdî karibê bikarbêne. Medîtasyon, bi têgînên weke perspektif ku dihê kirin, wê armanca wê ya sereke ew bê ku serdestî bi aqil û hizirkirinê ku mirov bi xwe re çê bike bê. Bo bidest xistina wê fahmkirinê, wê konsentrayîya zêhnî ku bi xwe re mirov çê dike, şîyarîya ku bi wê ku bi mirov re diafirê, wê weke rengê pêşketin û serkevtin û gihiştina wê medîstasyonê jî bide dîyarkirin.

Medîtasyon, wê li dora têgînekê û ankû tiştekî heyberî destpê bike. Bi wê re, ku mirov li laş, zêhn û bi hewirdora xwe re ku hevnasînê çê dike re, wê bi xwe re hin bi hin aramîyê bi xwe re û zelalîyê bi zêhnê xwe re çê bike. Her wusa, di dema kirina bi vî rengî a medîtasyonê de ku mirov bêhnstandina xwe sehêt(kontrol) bike û bi wê re ji kûrahîya hundûrê xwe karibê ku bide û bistêne. Bi wê standina bêhnê ji kûrahîya xwe, ku li laşê xwe bi ponijê û bi wê re ahengê di nava standina bêhnê û dayinê de ku çê bike. Şîyarîya ku bi fahmkirina mirov re diafirê, wê zelalîyê bi zêhnê mirov re jî bide çêkirin.

Mirov, bi standina bêhnê ji kûr û bi dayîna wê re, wê weke ku di nava xwezayê de bê, wê li xwe û li bêhn standina xwe bihisêne. Wê xwe bi wê re kifş bike. Kifşkirina mirov a xwe bixwe, wê hinekî jî şîyarîya mirov a di hundûrê mirov de jî bê.

Zerdeşt, vê rewşa xwe kifşkirinê û bi xwe re mayînê û çêkirina zelaliyê bi xwe re dişibêne, avaka zelal. Her wusa, bi ´ava kansavê´ minaqa wê dide. Ava kansavê, weke ava ku ji bihûştê ku di harikê li dûnyê jî, dihê bawer kirin. Ev ava kansavê, weke ava herî paqij jî dihê ser ziman. Zerdeştê, dihêne ser ziman ku ´şoşyant´ ku bi têgîna pêxemberekî bahse wî dihê kirin, dihê gotin ku wê ji ava kansavê ji zikê jineka ku ji ava kansavê vexwarî wê derkeve.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî û dûbare binê wê xîz bike ku wê bi medîtasyonê, fahmkirin, şîyarî û gihiştina xawênîyê wê bibe. Xawênî, bi fahmkirina wateyê û gihiştina wê re, wê pêş bikeve. Dema ku mirov gihişt xawêne, wê mirov ji hemû lewîtînên ku bûna wê paqij bibe. Mirov wê ji ´lewîtînên zêhnî´ wê paqij bibe. Xawênî, hêz û qûdreta wê, wê hemû ne başîyan ji holê ra bike. Di ancama xawênê de, wê hemû têrnebûnî(´dukkha´), çenddemitî(´anicca´) û bêezîtî(´anatta´)yê derxe li holê û wê bigihijê ´nîrwana.´ Di dema gihiştina nîrwana de jî, wê mirov bergên bi bineterên ´Dharma´ bike. Wê wan, bixwêne. Wê li wan, bihisêne. Wê bi wan rêya rast bibînê.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî li vir di dewama wê de werêne ser ziman ku mirov wê bi aqilê xwe û zêhnê xwe yê rast, wê êdî

rastiyê kifş bike. Li vir, gihiştina wê astê, wê bi zanebûnê, fahmkirin û şîyarîya hişî re wê bibe. Bo vê yekê, nîrwana, hinekî şîyarîyê bi wate dike bi xwe re.

Fahmkirina xwezayê û hertiştê ku di nava wê de dijî, wê bi dîtina wan re bibê. Lê li vir, weke ku Bûdîstî jî, dihênina ser ziman, wê di temenê her tiştê û dîtinê û dîtbarîyê de wê ´rastîya ku heyî´ wê li wê were lêgerîn. Mirov, dema ku ew rastî kifş kir û pê de, wê êdî bigihijê ya rast. Her wusa, medîtasyon, weke rêyeka ku wê mirov her wusa bigihijêne wê bê. Di vê çerçoveyê de medîtasyon, weke rêyeka fahmkirinê û gihiştina wateyê jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Mirov, çendî ku bi aqilê xwe re kifşkir û fahmkir, mirov wê ewçendî jî xwezayîya xwe û ya xwezayê **jî kifş bike.**

Meditaston, her wusa li vir, divê ku mirov hinekî din jî li ser wê bihizirê. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku medîtasyon, ponijbûn û ankû ´motîve´bûyîna mirov a li xwe û ankû li dora têgînekê ya. Tîrbûna bi medîtasyonê re wê motîveyê bi mirov re li dora wê tiştê, têgînê û mirov bixwe bide çêkirin. Têgîna medîtasyonê, her wusa, giringa ku mirov wê werêne ser ziman.

Di serdeme me de aqil, her wusa serdestîya wê bûya. Di serdemeka ku aqil serdestîya wê bûya, wê têgîna ponijbûna mirov, wê giringîya wê zêdetirî, xwe bide dîyarkirin. Mirov, bi aqilê xwe re dike ku rastiyê fahm bike. Mirov, hertimî di hundûrê xwe de dihizirê. Hizirkirina mirov, wê di ancama ponijbûnekê de bibe. Ponijbûna mirov, mirov dikarê weke medîtasyonekê jî werêne ser ziman.

Di aslê xwe de di her mirovî de rewşeka medîtasyonê ku dike heya. Her mirov dihizirê. Di xwe de dihizirê. Her wusa di ponijê. Çendî ku ponijî, di xwe de hizirkirinê dike. Bi hizirkirina xwe re, dihizirê li ser tiştekî û ankû têgînekê. Ew têgîn û ankû tişta ku li wê hizirî, wê yan rastîya wê kifş bike û yan jî, wê ne rastîya wê kifş bike. Her wusa hizirkirina mirov bi wê ponijbûna mirov re wê jî bi xwe re dihêne li holê.

Mirov, bi hizirkirina mirov re li ser tiştê û ankû têgînê dihizirê. Çendî ku hizirî jî, wê di xwe de, gelek pirsên ku bêbersiv in, wê bersivê ji wan re bibînê. Gelek têgînên ku ne zelal in, wê zelalîya wan bike ku di serê xwe de çê bike. Di vê çerçoveyê de fahmkirinê bi xwe re pêş dixe. Medîtasyon bixwe jî, ji xwe fahmkirin û gihiştina fahmkirinê ya. Gihiştina ditin û fahmkirinê ya. Çendî ku fahm kir û safî kir di mejiyê xwe de, wê zelaliyê bêne. Her wusa, zelalî, wê bi bersivandina pirsên di

serî de ên bêbersiv û ber wusa têgînên ku ne zelal in ku werina zelal kirin re wê **were**.

Medîtasyon wê, weke rêbazaeka ku wê bi wê re wê, hewl bêdayîn ku wê, rehetîyê di laş de bê dayîn çêkirin bê. Li ser hizirandin û ankû fikirandinê re wê, ev wê, bê xwestin ku ew were kirin. Wekî din wê, weke aliyekê din jî wê, bi hîskirinê re wê, xwe bide dîyarkirin. Ya ku mirov hîs dikê wê, li wê bihizirê. Her wusa bi hîskirin û hizirkirinê re ku mirov wê, xwe çawa wê baş hîsbikê wê li ser wê re wê, weke rêyeka rehetkirinê bê. Ev rê û rêbaz wê, di serdemên berê de wê, weke têgîn û rê û rêbazake başkirinê jî wê, were dîtin û wê, li ser wê re wê rêyên başkirinê wê, werina pêşxistin. Weke ku wê were dîtin ´xwe baş hîskirin´, ´xirab hîskirin´, ´ez´, ´ezimtî´ û hwd wê, weke aliyna têgînî ên bi zêhnî ku wê li ser wan re wê li wê were hizirkirin bê. Wê bi wê re wê, hewl bê dayîn ku mirov bikeve farqê de. Wekî din jî wê, çi li pêşşîya ketina farqê de ya wê, hewl bê dayîn ku ew wê kifşbikê û wê, bide têgihiştin. Di bûdismê de wê, laş, hîs, zêhn û drahman wê, weke çarîyên ku wê, bi wan re wê, li ser wan re wê, were hizirkirin û wê, hewlbêdayîn ku bi wê re were fahmkirin. Bi têgîna laş re wê hewlbê dayîn ku rewşek nermkirinê ku ew were pêşxistin. Ku mirov karibê weke ku ew dixwezê tevbigerihê û gava xwe biavêjê. Piştî ku ew bi awayekê hat kirin û mirov di wê de biserket wê, dor were rewşa têkiliya bi laş hîsan re. Ya ku mirov wê hîsdikê ew çi ya wê hewlbêdayîn ku ew were fahmkirin. Minaq ku mirov ´êşekê´ hîsbikê wê bi hanîna li ser ziman wê re wê bi ketina farqê re ku mirov wê, bijî û wê derxê li têgihiştinê. Bi wê re bi hîskirinê re hewldana rengê hîsan gûharandinê wê, bi wê re wê minaq çawa wê mirov xwe baş û rehet hîsbikê ku wê, kifşbikê û bi wê re bijî. Wê bi wê re wê, ya ku ew dihê li xoşa mirov ku mirov wê bijî. Lê bi wê re jî wê, derxistina têgihiştinê wê, weke têgîneka ku wê, li wê were hizirkirin ku mirov bi wê newê girêdan bê. Li vir wê, dema ku mirov xwediyê rewşeka ku mirov bi wê girêdayî ya wê, çawa wê ji wê rewşa girêdayî xilasbikê tevî ku ew bijî wê, weke aliyekê ku wê li wê bihizirê bê. Di wê rewşê de wê, aliyê hîskirinê wê, weke aliyekê zêhnî ê giringî wê, bê derxistin li fahmkirinê. Weke aliyekê din ê sêyem jî minaq hizirkirin bê. Dema ku mirov, minaq di demên xwe yên berê de ku mirov gelek rewşên ku ew ne xweş in ku mirov ew jîyankirina wê, mirov wê çawa wê ji bandûra wan wê xilasbikê wê, hinekî wê, bi rewşa derxistina li têgihiştinê re wê, were dîtin. Di wê rewşê de wê, bi derxistina li têgihiştinê, fahmkirina temen û bingih û sedema wê re wê, mirov wê, li wê serwaxt bê. Di dewama wê de

wê, hin bi hin wê di hizirkirina xwe de wê, hin bi hin wê bikê ku ew cih ji hizirkirinên din ên baş ve jî bihêlê. Carna bi ya bi êş re ku wê têkiliya wê dênê û wê ji wê di ahengekê de wê hizirkirina xwe wê biherikênê li wê. Bi wê re wê, hin bi hin wê xwe ji wê dûrbikê. Ev ne bi şêwayê ku ew li wê ne hizirê bê. Bi şêwayê ku ew ew xwe ji wê hizirkirinê dûrbikê bê. Di wê reşwê de wê, rêbaza dûrkirinê wê yek têgihiştin û derxistina li têgihiştoinê bê. Ya din wê, li ser hîskirina ji wê ku ew biêş a bê. Wê, di wê rewşê de wê, çawa wê, xwe bi wê re wê, weke aliyekê din wê, bijî wê, bide dîyarkirin.

Di wê rewşê de mirov dikarê wê jî wê, weke aliyekê din wê werênê li ser ziman wê weke aliyê dirahman ku wê, rewşa têkiliya zêhnî û laşî wê bikê ku wê çêbikê û wê fahmbikê bê. Wê bi wê re wê, rewşa astengiyên zêhnî ku ew çina ku ew wan derxê li têgihiştinê bê. Ji aliyê din ve jî ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa dirahman wê bi wê rengê wê, rewşên weke astengiyên zêhnî ku ew çi na wê bikê û wan qatagorîzebikê û wan werênê li ser ziman. Ya ku wê li xoşa mirov herê ya xweş, ya ku mirov hês dikê a hêskirî û hwd. Minaq dema ku hêrsbûn bû wê, weke rewşên ku mirov ji wan ji keştî bê. Rewşên tirs ku mirov ji wan bi tirs û di vaciniqê bê. Di wê rewşê de minaq wê dema ku mirov serê mirov tevlihev bê wê, gotina ´tevliheviyê´ wê bênê li ser ziman. Yan jî gotina gûmankirinê wê bênê li ser ziman. Bi wê rengê wê, bi zêhnî wê, ya ku ew mirov di wê de ne zalale ku mirov zelal bibê. Wê derxê li têgihiştinê. Di wê rewşê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa zelalbûna zêhnî wê, di serî de wê, weke armanca wê rewşa fahmkirina bi têgîna medîtasyonê bê.

Aliyê din ê meditasyonê jî wê, rewşa wê ya bi rûniştî ku ew dihê çêkirin bê. Di wê rewşê de wê têkiliya laş, zêhn û bêhnstandin û dayînê ku wê bi hevdû re wê çêbikê û wê bi wê re wê, armanc bikê ku ew xwe bigihênê li rehetîyekê. Di wê rewşê de wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê, mirov wê xwe bikê pozisyonan de. Minaq wê, dema ku ew rûniştî bê li ser çokan. Piştre dest dênê ser zikê xwe û bêhnê bide û bistênê. Di dewama wê de wê, dema ku bêhn derket û stand ku ew bi wê re di dil de rabûn û danînekê bi xwe re bikê. Bi wê re wê, mirov wê hin bi hin ku ew ketina ahanga wê de ku ew êdî hin bi hin bi têgihiştina xwe re ew derkeve li ser wê rewşê û wê weke kesekê din ku ew dema ku ew wê dikê ku ew wê bişopênê. Wê, di wê rengê û awayê de wê, weke rewşeka ku mirov wê, di wê rengê de wê, karibê wê, **werênê li ser ziman bê**.

Di rewşa meditasyonê de wê, bi wê rengê wê pozisyon wê weke aliyekê giring wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşeka pozisyonî de wê dema ku mirov wê xwe bide dîyarkirin de wê, di serê xwe de minaq wê li berfê bihizirê. Wê demê wê hin bi hin wê dema ku konsentra xwe li wê çêkir wê, hizir wê di wê çerçoveyê de wê di meji de wê xwe bidina dîyarkirin. Yan wê, hin serboriyên xweşik ên ku bi berfê re jîyankirina wê bibin û yan jî wê, hinek tiştên din ku ew hatina kirin. Di wê rewşê de wê, hin bi hin wê, rewş wê xwe bidina dîyarkirin. Her rewşa ku xwe dîyarkirin wê, bi gotinkirina wê, aliyekê din ê wê rewşê bi zêhnê re wê, bibin. Di wê rewşê de wê, her çar rewşên weke laş, hîs, zêhn û dharmayan wê bi hevdû re wê, di ahengekê de wê, hin bi hin wê têkiliyekê jîyanî wê bi xwe re wê bidina çêkirin. Ev rewş wê, hin bi hin wê, rewşê bi salixkirina wê re wê, bênê. Minaq di rewşa salixkirinê de ku mirov rewşek bi şahî bijî û bêjê ´şahî şahî´, ankû xweşî xweşî û hwd wê, weke rewşna gotinî ên salixkirinî bin. Dibê ku bal hatibê kişandin ku me, dema ku nivîsand ´ weke ´şahî şahî ´ ankû ´xweşî xweşî´ li dûv hevdû nivîsand. Di wê rewşê de wê, ev gotin wê yek wê bê salixkirin û ya din wê bê navê salixkirinê. Bi gotinên din ên rewşî jî mirov dikarê heman tiştê bêjê.

Di rewşek tevlihevî û ankû gûman kirinê de wê, dema ku mirov god ´tevlîhevî tevlihevî û ankû gûman gûman wê, di wê rewşê de wê, hey wê di wê rengê de wê, biafirê. Ceribandina cerbên bi wê rengê wê, dema ku mirov di rewşekê ku mirov karî wê pêkbênê de ku mirov pêkhanî wê hingî wê, hin bi hin wê, di rewşa rewşên xweşî, nexweşî, gûmankirin, tirs û hwd de wê, bikê ku mirov bikeve farqê de. Wê, ev weke rêyên fêrbûnê ên li ser rewşên xweşî û nexweşîyî, başî û nebaşîyê û hwd bin. Di têgîna meditasyonê de wê, bawerîya bi du hêz û ankû vejenên ku mirov bi bandûr dikin ên weke ´baş´ û ´nebaş´ wê hebin. Di wê rewşê de wê, hertimî wê, weke ku ew herdû di ahengekê de bin. Wê yek wê hertimî wê, bi tahfandinên li ya din re bê. Ev rewş wê, her hebê. Di wê rewşê de wê, dema ku mirov meyla xwe bi kijan aliyê de wê bidiyê de wê weke bi rewşa rêyên meditasyonê û hwd re wê ew wê bên serwaxt kirin. Di wê rewşê de wê, ev rewş wê, weke têyên xwe gihandina aramiya hundûr jî wê, bên dîtin û ser ziman.

Fêdeya wê rêya meditasyon wê, ew bê ku wê li hemberî kesên din wê hêstên weke yên xweşî, nexweşî, hêskirin, hêrsbûn û hwd ku wê, bibin wê, sedema wan çi ya û xwe gihandina wan bi xwe re wê, li ser wê bisekinê. Wê, di wê rewşê de wê, fahmkirinê wê, çêkê. Ji aliyekê din ve jî wê, bi wê bawerîyê bê ku mirov bixwe wê karibê xwe bigihênê ya ku

mirov wê, dixwezê. Minaq xwe gihandina dilxweşî û dilşahiyê. Wê ew weke ku wê di destê mirov de bê wê, were nerîn. Ji aliyê din ve jî wê, bi hîssî û zêhnî û têgihiştinî bi ketina farqîtîya dunya derve bê. Wê, di wê warê de wê, mirov wê, bê xwediyê wê hişmendiyê. Wê, zêdetirî wê, şîyar û hîşyar bê. Wê, wekî din jî wê hertimî wê, di wê rewşê de wê, bijî wê di roja xwe de ku mirov, wê dema ku wê gelek rewşên weke tirs, gûman, xûf, nakokî û hwd wê bijî wê, wan weke çerbeka di jîyane xwe de ku ew bibînê û ew bi wê rengê ew nêzî wê bibê. Meditasyon wê di serî de wê armanca wê ew bê ku ew bixwe bi wê rêyê xwe ji xosletên xwe yên weke hêrsbûn, çavbirçîbûn, tirs gûman, kîbîr, stress û hwd ku ew xwe ji wan rizgarbikê bê. Ev xoslet û yên weke wan wê weke xosletên ku mirov wê, hem hêrs û dilnexweş bin û hem jî wê, weke xosletên ku mirov jî bi wan di çavên mirovan de nexweş û ne baş dibê bê. Di dewama wê de wê, ev xoslet wê, weke xosletna ku wê karibin navbeynê bikina nava mirov û kesên li dora mirov de û ku mirov ji hevdû dûr bikin bin. Wê bi sayeserê wê ku mirov wê, ew wan xosletan wê bibiînê di xwe de û wê, li ser wan bisekinê. Aliyên wî yên ku mirov bi wan diêşihin ku ew wan ji jîyane xwe de derxê. Bi wê rengê nebê sebeba ku mirov ji wî nexweş bibê û ankû ew kesên din ên dervî ku ew di xwe de bi hêrs û nexweş bibin.

Di wê rewşê de wê, ji aliyekê din ve jî wê, meditasyon wê weker têgîneka ku wê, li ser kirinan re wê, hin bi hin wê, kifşkirinan wê bide kirin. Di wê rewşê de minaq dema ku mirov tevgerekê bikê ku mirov di hiş û farqa wê de bê. Mirov zanibê ku mirov wê, bo çi dikê. Minaq dema ku mirov di rê de dimeşê û ankû li ser xwe digerihê wê, hingî wê, ew ji mirov wê fêdeya wan çi bê? Wê ku mirov zanibê. Meşeka li ser xwe wê, bo laşê mirov wê baş bê. Wê bo sarifandina di laş de jî wê, baş bê. Wê ji aliyekê din ve jî wê, di zêhnê mirov de wê, karibê bibê sedema têgîn û hîskirinên nû ku mirov xwe bi wan baştir hîsbikê. Ev rewşên ku mirov dikarê bi wê re kifşbikê wê bêsînor bin. Di dewama wê de wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê rewşa tevgerê wê, di wê warê de wê, bo laş wê, ji aliyê zêhnî, hîssî û dharmayan ve jî wê, rewşên nû hertimî wê bi xwe re wê bide jîyankirin bê. Wê têkiliyek hebûnî û jîyanî wê bi zêhnî û hîssî wê were danîn. Li pêşîya mirov di mejiyê mirov de wê, çi weke astengiyên zêhnî wê hebin ku mirov wan bibînê. Astengiyên zêhnî weke tirs, gûman, xûf, derdên din ên ku mirov wan bijî û hertimî di xwe bikê kûfekûf wê, ew bin. Di wê rewşê de wê, ew bi sedema wan re wê, weke aliyekê din ê wê bê ku mirov wê kifş bikê wê werênê li ser ziman.

Aliyê din ê ku mirov di dewama meditasyonê de ku wê dikarê wê werênê li ser ziman wê ´yoga´ bê. Me li jor hinekî hanîbû li ser ziman lê li vir jî wê, mirov dikarê wê hinek aliyên din ve wê di dewama mijarê de wê, werênê li ser ziman. Ev rengê têgîna bi yoga re wê, weke felsefeya jîyanê a ku mirov wê, di xwe de wê çawa wê bi awayekê rast û tişî wê bijî wê, li ser wê re wê, xwediyê têgihiştinekê bê. LI ser yoga re wê awayên wegotinên ên weke ku **Krişna** li arjuna fêrkiriya re wê, were li ser ziman. Lê ev felsefe wê, dema ku mirov bi teybetî li kurdistanê dîroka wê hilde li dest wê, bi bawerîya mazda re wê, bi hezaran salan wê karibê were birin. BI teybetî li hindistanê û deverên li dora wê ên Asya wê, ev wê bi zêdeyî wê bi kûrbûnekê re wê, were jîyankirin. Felsefeya wê ku mirov wê, werênê li ser ziman wê bi koka wê re wê, ji aliyekê ve wê, li ser têgîna ´nîrwana´ wê ava bê. Ew jî wê, di wateya ji xwe çûyinê û ankû ketina inziwayê û di wê de jîyankirinê de wê, mirov dikarê salixbikê û wê werênê li ser ziman. Ji aliyekê din ve jî wê, bi bawerîya ku mirov di xwe de xwe bigihênê têgihiştinên din ên di jîyanê de. Weke zindiyekê jîyanî wê mirov wê, weke zindiyên din wê, weke rêya gihiştina li rastîya bi aqil jî wê di wê de wê, were li ser ziman. Di wê rewşê de wê, ew wê, weke aliyekê wê yê giring wê were dîtin û hanîn li ser ziman.

Yoga wê, di wê warê de wê, ji aliyekê ve wê, temenê wê, li ser têrbûna menewiyetê re wê, were li ser ziman. Dema ku mirov valahiyê di xwe de dijî û ji xwe diçê wê, bikeve rewşên xirab de. Ew bi xwe bêhêvî û bêbawerî bûyîn wê, weke aliyekê ku wê ji wê re wê bê mijare ku wê li ser wê bisekinê bê. Di wê rengê de ev rengê hizirkirinê wê, dema ku mirov wê weke rê û rêbazaekê wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman wê, di serî de wê, weke têgîneka felsefîkî a ku wê, bi wê mirov xwe bigihênê li rastiyê wê were dîtin. Di rêyên çûyina nîrwana de wê mirov wê bi gihiştina rastiyê a di xwe de wê hin bi hin wê bi wê re wê bilind bibê. Di wê rewşê de wê, ne girêdayî ti hîyararşîyê bê. Di wê rewşê de wê, dema ku wê, di olên semewî de ku wê, ew hîyararşî wê hebê wê, di bawerîyên yazdanî ên weke yên nîrwana û hwd de wê nebê. Yoga wê, bo astmazinbûnekê bê. Di wê rengê de wê were hanîn li ser ziman Filosofê hindî Sri-Aurobindo wê bi gotina ´yoga bo mazinahiya yazdani ya.´ Wê bi wê rengê wê, şîrovebikê û wê bênê li ser ziman. Di dewama meditasyonê de hanîna li ser ziman a yoga wê sedema wê ew bê ku wê, ji aliyê kirinîya wê û ankû pîretizekirina wê de wê, ew jî wê, rêbazên bi wê rengê êmn tevgerî wê, bikarbênê. Têgînên yogayî weke Taoist, zen û hwd wê, bi hemû têgînên wê yên din re wê, di wê warê de wê, tevgerên

ku ew bi wê re wê, hazinandinê bi hizirkirinê û mijulbûnê wê bênina li ser **ziman wê bibin.**

Di felsefeya yoga de wê, ew têgîn hebê ku mirov dervî xwe zirerê nedê ti tiştî û ti kesekî. Wê, di wê rengê de wê, xwediyê felsefeyekê bê. Di wê de wê, kesên ku ew bi yoga wê, bigihijina ´hatha´ wê, ji aliyekê ve wê were wateya ´ya bi hêz´ û ankû ´ya bi qastî´ jî. Bi yoga re wê, ew wê were armanc kirin ku aqil û laş di zindetîya xwe de bê. Yanî bi gotineka din zindê de bê. Weki din wê, bi wê re wê, Ev jî wê, bi gotina ´ahimsa´ re wê, were li ser ziman. Laşekê ku ew baş di zînde xwe de ya wê, hem di tevgerên xwe de wê baş bê û wê di bêhnstandinên xwe de wê baş bê. Di rewşê de wê, aqil û laş wê bi wê re wê li ser rewşa bêhnstandinê û ahenge wê re wê, ji aliyekê ve wê, bi hevdû ve jî wê were girêdan. Mirov di ritmek çawa de bê wê, ew wê rewşa mirov a laşî û ya zêhnî jî wê, bi bandûr bikê.

Di rewşa Yoga de wê, bê bawer kirin ku wê kengî laş wê bigihijê nîheyete xwe. Wê aqilê ku ew di sedemsagerîya wê de dijî jî wê, ew jî wê, serbest bibê. Wê, di wê rewşê de wê, ev wê, weke rewşekê têgînî a têgîna yogayê bê. Li vir wê jî mirov wê, werênê li ser ziman ku wê, yoga wê, weke kirinîyeka ku wê, di nava keseyet, laş, zêhn, hîs û gîyane mirov de wê, ahengekê wê di jîyanê de wê, bide çêkirin bê. Felsefeyên weke yên karma wê tenê wê hinek ji wan têgînên wê yên ku ew li ser wan di meşê bê. Wekî din wê, aliyekê din wê, feslefeyê bê. Di wê têgîna yogayî de wê, hemû hebûn û tiştên jîyanê wê, bi hebûn û bandûra wan re wê, werina dîtin. Roj, heyv, stêr û hwd, hemû tişt wê, di wê rewşê de wê, hebin. Rohnî û şêwayên rohniyê jî wê, bi wê rengê wê, weke elementna ku ew bandûrê li herikîna jîyanê dikin bin. Di wê rewşê de wê, ew werina fahmkirin û wê, ew bandûra wan wê were têgihiştin. Wê, dema ku mirov ew fahmkirin wê, baştirin wê, karibê bi wê re wê bijî. Her tişta ku ew heya wê, bi tefsîr û têsîra wê re wê, mirov dikarê di têgîna yogayê de wê kifşbikê. Wê, di wê rengê de wê, weke têgîneka ku wê, li vejene xwezayê wê konsentre bibê ku ew bi wê re bijî bê. Di wê rengê û awayê de wê, mirov dikarê weke aliyekê wê yên din ê giring wê, werênê li ser ziman.

Di yogayê de mirov dikeve meditasyonê de. Wê, bi wê re wê, sekn û tevgerên durust wê bi xwe re wê kifşbikê wê di wê de wê bisekinê. Wekî din wê, bi wê re wê, têkiliya gîyan û laş, laş û xwezayê û hwd wê, li ser têkiliya jîyanî a vejenî re wê bikê wê kifşbikê. Di wê rewşê de wê, mirov dikarê weke aliyekê giring wê, werênê li ser ziman ku wê, weke têgîneka ku wê, di felsefeyên batînî de ku wê bigotina ´rastteqiniyê´ wê were li ser

ziman wê, di wê rengê de wê, xwediyê konsentrebûnekê bê. Di wê rewşê de mirov dikarê wê jî wê, weke aliyekê din wê, dikarê werênê li ser ziman ku wê, yoga wê, di rewşa xwe de wê, weke felsefeya jîyanê a ku wê, bi temenê wê re wê, bikê ku ew nepeniyên jîyanê wan kifşbikê û bi wan bijî bê. Di rewşa têgîna têkiliya nava Krişna û Arjuna de ku wê, were li ser ziman wê, li ser esasê xwe radestkirinê re wê, xwediyê têgihiştinekê bê.

Yoga wê, weke aliyekê din wê bikê ku ew bigihijê fahmkirinê û li ser wê re bigihijê rengê jîyane wê û ankû bi wê re jîyankirinê. Di wê rengê de wê, mirov dikarê weke aliyekê wê yê giring wê, werênê li ser ziman. Di bawerîya yoga de wê, ya ku wê bi serdestî ku wê dijî û di dide dîyarkirin wê gîyan bê. Minaq têkiliya nava laş û gîyanê ku ew xirabû wê, êdî wê, laş wê, ahenge wê xirabibê. Wê, nikaribê, weke ku ew dihê xwestin ku ew bi tevger bê. Hişmendî wê di temenê wê de wê xwediyê kifşkirinekê wê hebê. Di yoga û felsefeya wê de wê, bi têgîna nîrwana re wê, weke ku wê mirov bigihijê cewherê û di wê de wê kûr bibê wê, were hanîn li ser ziman. Di wê rengê de wê, ji ya têgihiştî bi ber laş ve rewşa bandûrê û têkiliyê wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku ew wê fahmbikê bê. Di wê çerçoveyê de wê yoga wê, pêwîstî bi wê bide dîtin ku ew li laş, zêhn û ezîtîya keseyetî ku wê li serwer bê.

Yoga weke olekê hanîna li ser ziman wê, weke têgînerka cewherî a hemûyan ku mirov wê werênê li ser ziman wê rasttir bê. Wê weke têgîneka ku wê, di wê rewşê de wê, di çerçoveyek ahengî de wê, di yekîtîyekê de ku wê, hebûn wê xwediyê herîkîna xwe ya di jîyanê de bê. Wê, di wê rewşê de wê, xwediyê rewşek heyînî û jîyanî bê. Di felsefeya yoga de wê, heta ku mirov bi têgihiştina wê re ne serwer bê wê, ne weke ji wê bê. Wê kengî wê, ew têgihiştina wê girt wê, weke ji wê bê û wê, karibê di wê de nav bistênê.

Di lêkolîna yoga û ankû meditasyonê de wê, were dîtin ku wê, gelek rengên têgînî ên weke ekolên teorîkî wê, bi demê re wê pêşkevin bi wê re di nava hîndîûsmê de. Wê, bi wê re wê, kûrbûnek wê, bi demê re wê, bi wê re wê bibê û wê pêşkeve. Lê li vir di aslê xwe de wê, dema ku mirov li hebûna wê ya li kurdistanê û mejuya wê dinerê wê, mirov dibînê ku wê, çawa wê, weke rêbazaek başkirinê a temndûrîstî ku wê were bikarhanîn bê. Di wê rewşê de wê, têkiliya nava jîyane û hebûnê û ya hebûnê û xwezaye wê de wê, bikê ku wê fahmbikê di temenê jîyanê de. Li kurdistanê wê, dema ku mirov dîroka wê, di hilde li dest wê, di aslê xwe de wê, ji gelek aliyan ve wê, heta berî Zerdeşt û mîtra jî wê, mejuya

wê herê. Di serî de wê, weke aliyekê giring wê mirov **dikarê wê, werênê li ser ziman**. …

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku zelalî, çendî ku mirov bi xwe re çê dike, ew çendî jî wê rehetî û aramî di serî û dilê miirov de biafirê. Mirovekî serdema aqil, çendî ku pirsên bêbersiv ku di serî wî de hebin û têgînên ne zelal ku di serê wî de hebin, wê ne rehet bê. Wê hertimî bihizirê ku wan pirsan bi bersivêne û nezelalîyan zelal bike. Di vê çerçoveyê de çendî ku mirov bi xwe re pêşketin bi fahmkirinê re çê kir, wê rehetî û aramiyê jî bi xwe re çê bike. Her wusa, her pirseka ku ne hatî bersivandin, mejiyê mirov li bersiva wê digerihê di xwe de. Ev jî, wê hertimî mejiyê mirov bide hizirandin. Mejî, heta ku bersivê di xwe de ji wê pirsê re nebînê, wê rehet nebê. Ev jî, wê weke bendekê bê ku mirov bi wê nezanîyê re ku bi xwe ve girêdide. Her wusa. Têgîneka ku mirov bi wê re di mejîyê xwe de ne zelal bê, wê ew ne zelalîya wê têgînê, wê weke bendekê bê. Wê ne hêle ku mirov rehet bibe.

Her ne zelalî û ne zanîn, wê weke bendekê bê di serdemeka aqil de bi mirov re. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê têgîna medîtasyonê, werênina ser ziman ku bi awayekî xwezayî wê hertimî bi mirov re wê hebe. Heta ku mirov dihizirê, mirov medîteyîyê dike.

Ev rewşa medîtasyonê, di vê çerçoveyê de bi xwezayî hertimî bi mirovê bi aqil re wê hebe. Lê tenê, li vir, ya ku ji mirovê bi aqil re pêwîsta, tenê ew refarans û perspektifa ku bi wê re wê medîtasyonê ku bike bê. Di vê çerçoveyê de dema ku rêyên mirov ên fahmkirin hebin, mirov wê di wan de bimeşê.

Aqilê mirov, hizirkirin, weke teybetîya wê ya. Hertimî dihizirê. Hizirkirin, ponijbûn a. Ponijbûn jî, tîrbûn a. Tîrbûn, di temenê wê de motîveyek heya. Ev motîve, ku li dora tiştekê bê û ankû li dora têgînekê bê. ..

Aqilê mirov, dike ku rastiyê di xwe de kifş bike. Mirov, di mejiyê xwe de li rastiyê digerihê. Çendî ku rastiyên ku dike ku xwe bigihêniyê de ku xwe digandiyê de, wê aramî û rehetîyê bide çêkirin. Her wusa rehetî û aramî, di wê gihiştina rastiyê de wê xwe bi mirov re bide dîyarkirin. Mirovê herî baş ku xwe gihandîya aramî û rehetîyê, mirovê ku xwe di mejiyê xwe de gihandîya bersivên pirsên ku di serê wî de û têgînên ku nezelal ku di serê wî de hena ku ew zelal kirina na. Di vê çerçoveyê de medîtasyon, bi perspektîfa gihiştina rastiyê re weke rêya aramî û rehetîyê ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di roja me de,

weke ku herêmên asyaya dûr bi dibistanên zen bûdîsmê re dihê ditin, ji nivîsandina zêdetirî giringiyê didina ponijbûnîya rûhanî. Di vê çerçoveyê de her mijara ku divê ku were fahmkirin, li ser wê rê û rêbaza medîtasyonê, weke rêya hizirkirinê û ´çareserîyê´ dide nîşandin. Zen bûdîsm, di roja me de, rengê xwe yê ku da der, ew a ku zêdetirî bendên ego´yê û ankû ezîtîyê kêm û lawaz bike. Di vê çerçoveyê de mirov, weke ku çendî ku ji wan bendan xilas kir û rizgar kir, wê weke ku ew **Azad kiribê bibe**.

Di jîyane de her tişta ku heya, bi heyîn a. Her wusa, dema ku mirov li wê dinerê, mirov wê dibînê. Dîtbarîya ku li berçavên mirov, her wusa wê rastiyê dide dîyarkirin. Mirov, dema ku li tiştê dihizirê, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku tişt, bi têgînekê heya. Ew têgîn, her wusa, wê wê tiştê bide dîyarkirin. Lê tişt bixwe jî, rast a. Mirov, bizêhnê xwe re wê di mejiyê xwe de diafirêne. Dîtina mirov, wê di mejî de her wusa weke rêyeka dîtinê bê.

Mejî, tişta ku dît, di xwe de qayd dike. Ev rengekê girtinê ya. Bi dîtinê, bêhnkirinê, bihîstinê, destlêdanê û her wusa têj(tahm) kirinê re mirov wê dike. Rêyên girtinê, wê me di jîyanê de bigihêne wê tişta ku heya ya. Her wusa li vir divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku aqilê mirov, hîskirina mirov, hişê mirov û hwd, wê di çerçoveyeka girtinê de bi aqilê mirov re biafirin. Her wusa, mirov, nikarê tenê, tiştê, tenê bi wê girtina wê re werêne ser ziman. Her wusa, bi têgîna wê re jî, divê ku mirov nirxên weke hêzkirinê, şabûnê û her wusa jê kêfxweşîyê ku mirov dike jî, bahse wê bike. Ev hêstên mirov ên ku mirov, biwan xweş a, divê ku mirov bahse wan jî bike.

Xweşî û dilxweşî, şabûn û dilşahî, û hwd, wê aliyna ku mirov bi zêhnê xwe re wan diafirênê jî bin. Her wusa, Zerdeşt, bahse fahmkirina li ser xweşîyê re jî dike. Li vir, ev jî, wê weke têgînekê bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna şabûnê, wê bi zêhnî û jîrî, xwe weke tevgerîyekê û kirinekê jî bide dîyarkirin bi mirov re. Her wusa li vir, divê ku mirov bi wê re jî, wê fahm bike.

Her wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîn û tişt, bi hevdû re, wê çerçoveyekê bidina me. Her wusa, lê têgîn bi serê xwe bi zêhnî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke aliyekî ´rûhanî´ wê di vê çerçoveyê de bi têgînî xwe bide dîyarkirin. Li ser têgînê re fahmkirin, wê me di nava têgîna zêhnî de bibe. Her wusa li vir, wê têgîn, hertimî, xwe di nava xwe de bi ber kifşkirina bi dîtinê ve bibe. Aliyê jîyanê ê fîzyolojîkî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, bi têgînê re

wê bi tevgerî xwe bide dîyarkirin. Her tevgerên ku em dikin, mirov dikarê wan weke afirandinna jî werêne ser ziman.

Her tevgerên ku mirov wan dike, mirov divê ku di serî de wan bi kirin, tevgerî û sedemên wan re kifş bike. Kirin, wê xwe di vê çerçoveyê de bide dîyarkirin. Kirin û tevger, rengê tevgerîya jîyanê jî bi xwe re didina dîyarkirin.

Li vir, dema ku em bahse kirin û tevgerê bikin, bi wê re hinekî jî divê ku mirov bahse ´pêşîya tevgerê´ bike. Yanî bi gotinaka din, piştî ku kirin bû û pê de, weke ancamên wê, bandûra wê çawa dibê, divê ku mirov hinekî li ser wê re bisekinê. Li vir, têgîneka ku mirov dikişêne ber bi heyîderîyê ve heya. Her wusa, her kirina ku mirov ew kir, mirov di farqê de ya ku wê çi ancamê di wê dema xwe de û di demên pêş de bêne û bide dîyarkirin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku fahmkirina tevgerê, di vê çerçoveyê de wê me hinekî jî, di nava têgîneka ku em ji baxtewarîyê, dûr nikarin werênina ser ziman, wê xwe bi wê re bide dîyarkirin. Zerdeşt, dibêje ku ´mirov, kirinên xwe berpirsîyar a.´. Her wusa, Bûda jî, dibêje ku ´mirov, dema ku î ro kirinek ne baş kir, wê nifşên me yên piştre jî, ancamên wê kirinê bibînin.´ Yanî bi gotineka din kirin, tenê weke kirinekê namêne. Ji wê zêdetirî, ancamên wê, divê ku mirov bi wê re li wê bihizirê. Bo vê yekê ya, ku kirin, her wusa di vê xate bawerî û felsefîkî de, pirr zêde li ser wê hatîya sekin in. Ji tevger û kirinan gavavêtin û her wusa ber pêşxistina aqilekî ve çûyîn, wê weke rewşeneka şenber ya têrker bê. Her wusa, dema ku mirov, di vê çerçoveyê de li wê tevgerê dihizirê, mirov wê bi kirina wê re û bi ancama wê re wê bibînê.

Kirin, dema ku mirov bi vê têgînê re li wê dihizirê, mirov bi wê re dibînê ku kirin piştî ku bû û pê de, wê têgîna xwe bide dîyarkirin. Her wusa, wê rengê xwe yê baş û ne baş bide dîyarkirin. Kirin, di vê çerçoveyê de weke tiştekî şenber û têrker a heyberî, di vê çerçoveyê de têgînekê dihêne li holê bi xwe re.

Mirov, dema ku li tevgerê dihizirê, her wusa mirov bi hizre tevgerê re li wê dihizirê. Lê her tevgera ku bû, wê bi hizra xwe re xwe bide dîyarkirin. Ev jî, weke aliyekî wê yê dîyarker a.

Tevger û zêhn, her wusa, wê di vê çerçoveyê de di jîyanê de xwe biafirêne. Mirov, dema ku kirinek kir, mirov, divê ku zanîna wê de bê ku ew kirin, wê ancamaka wê jî hebê. Her wusa, wê ew tevger, ancama wê heya. Ancama tevgerê û ankû kirinê, di jîyanê de xwe dide dîyarkirin. Her wusa, wê xwe di çerçoveyeka afrînerî de bide dîyarkirin.

Dema ku mirov li ancamê dihizirê, her wusa, li vir, têgînek zêhnî, xwe bi hîsî dide dîyarkirin di mejiyê mirov de. Zêhn, tenê hizreka. Di têgîna Zend avesta de jî û di ya zen bûdîsmê de jî ya ku ji mirov di mejiyê mirov de dihê xwestin ku mirov ji wê jî karibê xwe bide bûhûrandin. Zêhn jî, li deverekê, weke bendeka ku girêbide, wê xwe bide dîyarkirin.

Her wusa li vir, dema ku mirov li mejiyê mirov dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov ya ku dibînê ku miirov xwe di parzinîyekê de derbas dike. Her wusa, bi aqil, ya ku bi têgînî di mejî de kifş dike, wê di çerçoveyek têgînî û vacî de bide derbas kirin. Li vir, li ser wê re, ew çerçoveya ku piştre êdî ku mirov di mejî de xwe gihandiyê de ku weke ´ya makûl a´ di mejî de, wê çerçoveya vacî ya wê rengê gihiştinê jî bide dîyarkirin. Mirov, çawa dibînê, her wusa, wê li vir, weke rengekî wê yê jîyanê bê. Salixkirina tiştê, kirin û tevgerê, dûnya û gerdûnê, wê weke têgînna ku mirov dike ku xwe bigihêne wan bê. Di aslê xwe de bi vê têgînê ew mejiyê ku mirov xwe dike ku bigihêniyê de, wê weke aliyekî gerdûnî ê ku mirov xwe bigihêniyê bê. Li vir, dema ku rewş ev bê, hingî, bi têgînî divê ku mirov bahse wê keseyeta gerdûnî, weke ku Bûda, bi xwe re dihêne ser ziman jî bike. Mirovê ku ne li gorî ´rastîyên jîyanî û ên civatî ku hena´ ku ne hizirê û ku dervî wan mabê bi têgîn û mejîyê re jî ya. Her wusa, mirov çendî karibê, bi mejî û têgîna xwe re derkeve dervî wê wê civatîtîya ku mirov bi wê re bijî, wê mirov weke ku di nava wê gerdûnê de bike keseyetek gerdûnî. Têgîna ´ezîtîyê, her wusa, mirov dikarê li vir, bi du awayan hilde li dest û fahm bike. Yek, bi wê civatîtîyê re ya. Ya din jî, bi ezîtîya xwe bixwe re ya. Zaroyek piçûk, dema ku care pêşî, bahse ezîtîya xwe kir, gelo wê ´çi û kîjan ezîtîyê´ werêne ser ziman? Keseyet, hertimî, wê di çerçoveyek gerdûnî de hertimî bêhn bike û bike ku xwe bigihêne tiştna. Dibêt, hertimî ne di farq û hişê wê de jî bê. Weke ku çawa ku dihê gotin ku gîyan, laş û çermê laşî weke kiras li xwe dike û di wê de dijî, bi heman rengî wê keseyet jî, di hundûrê têgîna gotina ´mirov´ de bijî.

Mirov, li vir, dema ku dihizirê ku tenê bi xwezaya re bi ´aqilê zelal´ têkilî danîya, di aslê xwe de ew tenê li ser gotinan re di têkiliyê de ya. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têkilîya aqilî, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku hertimî, weke nerînekê heya. Heta ku mirov bi mejiyê xwe dibînê, mirov nikarê wê red bike.

Mirov, çawa dikarê derkeve dervî têgîn û zêhnê? Zêhnê, bi dîtina mirov a aqilî re ya. Ew jî, bi hizirkirina mirov re ya. Her wusa, li vir, divê

ku mirov vê jî bibînê ku zêhn, weke rengekî wê dîtina me ya. Mirov, dema ku bahse xwe paqij kirina ji ´lewitîyên zêhnî´ her wusa, bahse wan têgînên ku ew ji wan re bi têgînî beyenî ya dike. Bi wan re ne rehet a. Li wan ne serwaxt a. Dixwezê ku ji wan derbas bibe û rehet bibe. Her wusa, li vir, têgîna rehetîyê, di mejî de kengî ku mirov weke ku bûdîst dibêjin ku ´têkiliya xwe ji hemû tiştî birrî´ û tenê bi dûnyê re danî, wê bike. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku têkiliya ku dihê danîn jî, di aslê xwe de li ser gotinan re ya. Rengê gotinê û têgîna wê ya ku di mejî de şenber bûyî û hwd re, bi wê dihê nerîn.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dema ku mirov li ser têgîna zend avesta re dihizirê, her wusa ya ku mirov wê kifş dike, ew a ku mirov bizanebûnî fahm bike û wê bijî, wê dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de fahmkirina, sazûmana gerdûnê û her wusa pêşketina têgîna gîyanê û rêgezên wê, bi wê re wê bi fahma ku mirov bi wê bike re wê xwe bide dîyarkirin. Weke Zerdeşt, wê bûda jî bibêje ku ´li şûna girêdanîyaka bi korî, mirov divê ku bizanebûnî bibînê, fahm bike û têbigihê û piştre bigihiê rastîyê.´ Yanî li ser fahmkirinê re ku mirov bimeşê û xwe bigihêniyê de. Li vir, bûda, wê jî dihêne ser ziman ku mirov, tenê bi gotin û ziman, wê nikaribê, gerdûnê û rastîya wê bi tememî fahm bike. Her wusa di hizir û hizirkirinê de, herîkînîyekê pêşnîyar dike. Bi wê re fahmkirinê, derdixe li pêş.

Li vir, dema ku mirov bi têgîneka felsefîkî li têgîna Bûda binerê, weke têgîneka felsefîkî û ya zanînî wê xwe bide nîşandin. Her wusa, bi wê re her zindiyê ku dijî bi gîyanî wê bimrê û piştre wê cardin were dûnyê. Bi têgîna ´reankarnasyonê´, vê yekê di vê çerçoveyê de dihêne ser ziman. Lê Zerdeşt, bi têgîna zend avesta, hanîya ser ziman ku heyîna ´gîyaneka giştî´ ya serdest ku dide kifş jî dihêne ser ziman. Gîyane ´yazdan´, her wusa, di vê çerçoveyê de wê bi felsefe û têgîna zend avestaya Zerdeşt re were li ziman.

Em dema ku bahse jîyanê bikin, her wusa, di nava jîyanê de her tişt, wê bi baxtê xwe re bijî. Wê di jîyanê de weke ku dixwezê wê bijî. Lê dema ku gîyane mirov mir û pê de, ew ew jîyandina mirov hemû jî bi başî û ne başîyên wê re wê ku hatî nivîsandin wê derkeve li ber me. Her wusa, têgîna zend avesta, di vê çerçoveyê de ew hîyererşîya wê ya ku bi awayekî hanîya li ser ziman, wê di vê çerçoveyê de cûdahî û teybetîya wê ya bi serê xwe jî bide dîyarkirin.

Di jîyanê de mirov hertiştî dijî. Ti tişt, li pêşîya jîyan kirina mirov ne astang a ji gîyane xirab û pê ve. Her wusa, wê gîyane xirab, hertimî, bike

ku rêyên ne baş li pêşîya mirov dêne û bike ku mirov di wê re herê. Lê aqilê baş, wê hertimî, vajî, ya rast ji me re werêne ser ziman û bikê hişê mirov de. Di vê çerçoveyê de li ser kirinên mirov re wê weke ku têkoşîneka başî û ne başîyê jî wê hebe. Li vir, bo vê yekê, divê ku mirov ya xirab û ne baş, zanibê ku çi ya. Ev jî bi hizirkirinê, ponijbûnê û tîrbûna li wê, wê xwe **bide têgîhiştin**.

Her wusa, li vir, divê ku mirov hinekê bi hiş û hişarîyê re li mijarê bihizirê. Zanîn, giringa ku mirov wê fahm bike. Ya ku mirov, li vir di serî de werêne ser ziman ku ya ku mirov ji zend avesta fahm dike, ew a ku zend, dûnya dervî mirov weke ku dihê ditin ku were fahmkirinê, dike ku bike. Her wusa, dûnya dervî mirov, mirov, wê çawa wê fahm bike. Li vir, ev gotina, fahmkirina dûnya dervî mirov, ku weke ku heya ku mirov wê fahm bike, weke gotinaka ku divê ku mirov li ser wê bisekinê.

Dema ku mirov, bahse fahmkirina dervî mirov, her wusa, di vê çerçoveyê de jî, mirov dikarê fahm bike ku ´ya ku dervî hişarîya me(der bîr), ku mirov wê fahm bike. Mirov, ku hişarîya xwe bi şibêne mezelekê û ku mirov di hundûrê wê mezeleyê re dinerê û fahm dike, weke ku bibe. Lê dema ku mirov derkeve dervî hêtên wê mezelê û ankû mirov ji aliyên hêtan ên hundûrê herê aliyê hêtan ên derve û mirov binerê û bike ku fahm bike. Gelo derfeta mirov heya ku dervî hişarê, ku mirov fahm bike? Têgînaka felsefîkî ku hema bêja di hundûrê pirranîya têgînên felsefîkî de cih digirê û dibêje ditin bi hişkirinê re dest pê dike, her wusa, dema ku mirov, bibêje ´dîtina dervî hiş´, weke ku mirov dervî vê gotina ´dîtina bihiş´ bi gotinî bike û werêne ser ziman.

Her wusa, ev gotina bi ´dîtina dervî hiş´, bi wê re di dewama wê de gotinên weke ´ji pêş-bîryaran´, ´pêş-dîtinan´, ´pêş-demîngirtinan´ û ji ´pêş-rastîyan´ ku mirov xwe ´rizgar´ kirî û dinerê, di çerçoveyeka bi vî rengî de têgîna vê gotina ´dîtina dervî hiş´ xwe di mejî de bi hiş dike. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ´pêş-dîtinên´ mirov, wê hertimî, weke ´pêş-kifşkirinên´ mirov jî bin. Dema ku mirov pêşî xwediyê demîngirtin(şertandin)an dibê di serê xwe de, wê fahmkirinên mirov jî di wê çerçoveyê de bin. Her wusa, ev şertandin dikarê pêşîya aferîndêrîya mirov ya têgînî û hizirkirinî jî bigrê. Şertandin, weke girêdanaka bendî ya bi mejî û hişê mirov jî, mirov dikarê wê werêne ser ziman. Her wusa, dema ku mirov ji vê aliyê ve lê binerê, di vê çerçoveyê de mirov wê rastîya wê kifş dike.

Li vir, em di serî de, weke ku em bi têgînê tê digihijin, ew derfeta mirov heya ku mirov ´dervî hiş´ bibînê? Her wusa, carna em di jîyane

xwe ya asayî de dibêjin ku ´bi çavên rût, mirov dinerê.´ Her ditin, ku hiş bê, mirov dikarê dervî hiş bibînê? Li vir, her wusa, weke pirseka ku mirov divê ku hinekî li vir, li wê bihizirê ya. Têgîna zend avesta, vê têgînê bi me re dide çêkirin. Her wusa, bi têgîna zen bûdîsmê re jî mirov, dema ku mirov dihizirê, mirov wê têgînê bi şêwayna di wê de jî kifş dike.

Li vir, bêgûman, dema ku mirov di vê çerçoveyê de dihizirê, mirov divê ku mirov werêne ser ziman ku ev têgîna zend avestayî, her wusa, wê têgîneka pêş-dîtinî a metafîzîkî di hişê mirov de bibîr bike. Pêş-dîtin, bi serê xwe her wusa, dema ku em li ser zend avesta re li wê dihizirin, ew rengê hizirkirinê, wê me bi têgîna wê ya metafîzîkî re bi xwe re bide hizrandin. Weke têgîna mereq kirina, pêşîya bûyînê çi hebû? Ji kû û çawa destpêkir û hwd?.

Pêş-dîtina mirov, hinekî jî, weke ku mirov bi têgînî kifş dike, her wusa, pêşîya destpêka jîyanê û ankû aliyê din ê gerdûnê, bi têgînî di mejiyê mirov de dike ku mirov li ser wê bihizirê. Sûmerîyan, her wusa, dûnya di şibandina tepsîyekê. Dihizirin ku dema ku mirov hat kevîya wê tepsîyê, mirov wê bikeve xwerê de. Piştî ku mirov ket xwerê de, wê bikeve li kûderê û ankû kû ket, wê bikeve kû(?) li wê dihizirîn.

Mejiyê mirov, hertimî, piştî ku bidest hizirkirinê kir, mereqî berî hizirkirinê û ankû aliyê din ê hizirkirinê ku nehizirkirinê kir. Her wusa, di vê çerçoveyê de xwest ku wê fahm bike. Xwest ku xwe bigihêne wê. Ev jî, wê bi serê xwe di nava sînorê hiş de, wê serûwene hişkirinê hin bi hin bi xwe re pêş bixe. Çendî ku mirov hizirkir û pê de, ew mereqe mirov, wê mirov, bike ku li wê jî bihizirê. Lê dema ku mirov, li wê ´ya dervî hiş(der bîr)´ ku mirov dihizirê, tenê reşîyek di mejiyê mirov de dibê û hwd. Ji wê û pê de, mirov kifş nakê. Di nava wê reşîyê de, mirov dike ku ronahîyekê bibînê. Bi wê re, êdî kifş bike. Têgîna kifşkirinê, her wusa, ev mereqa dinava reşîyê de vêşarî weke dilperîya wê heya.

Der hişê mirov, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke valahiyeka ku mirov, hîs dike ya. Der hiş, vajî hundûr hiş, weke ´heyîneka valahîyî´ li wê mirov dihizirê. Ji vir ve, dema ku mirov dinerê, mirov wê gihiştina wê têgîna ´valahiyê´ a Bûdîstan jî mirov fahm dike. Her tişta afrîner, weke keseyetîyê, ezîtî û hwd, têgînên hundûr hiş in.

Der hiş, her wusa, weke aliyê din ê hiş mirov a. Bi gotinaka din, her wusa, dema ku mirov bihizirê ku mirov dervî wê hizirkirina xwe ya hişî ku karibê bibînê. Ev têgîna derv hiş, mirov dikarê di vê çerçoveyê de jî bixwêne û ji wê ancamakê derxê. Her wusa, derv hiş, her wusa weke rewşeka ku mirov karibê derkeve dervî wê hişê ku mirov hiş kirîya ya.

Her wusa, mirov, dema ku hiş kir, ew hişê mirov, weke têgîn û nerîna mirov a li jîyanê jî xwe dide dîyarkirin. Her wusa, derketina derv hiş, bi têgîna ku mirov ji hundûrê mezelekê derkeve derve û binerê jî, mirov dikarê wê werêne ser ziman. Her wusa, ev rewşa bi têgîna derketina dervî mezelê, têgîneka azadiyê jî bi mirov **re bi xwe re dide çêkirin.**

Li ser têgîna zend avesta re her wua têgîna der hiş, weke aliyekî giring ku mirov li wê bihizirê ya. Her wusa, der hişî, li ser wê pirr zêde hî hatîya hizirîn. Di zend avesta û têgîna wê de, dema ku bahse ahrîman, Ahûra Mazda û zerwan dihê kirin, di çerçoveyek gerdûnî de bahse wê dihê kirin. Dûnya, tenê beşek ji wê jîyanê ya bi ´sînor´ dihê hanîn li ser ziman. Mirovên ku ji xwe derbas kirina, wê karibin, wê ´gerdûna bêsînor´ bijîn. Ahûra Mazda, ahrîman û zerwan, wê gerdûnê dijîn. Heta ku têgîna gerdûnê, bi gelemperîya xwe re bi navê zerwan re jî hatîya hanîn li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku gerdûnîya zend avesta, her wusa bi têgînî di wê de sînorê wê nîn a. Zerdeşt, dema ku bahse aqil dike, bi sînor bahse wê dike. Her wusa, li gorî wî, mirov nikarê bi sînorê aqil re sînorê gerdûnê û fahmkirina wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de dema ku Zerdeşt di zend avesta de bahse aqil dike, dervî ahrîman, ahûra Mazda û gerdûnê bahse wê dike. Aqil, wê hertiştê di jîyanê de ku dihên jîyîn, wê di hundûrê xwe de bigrê. Bi jîyanê re aqil, bahse wê dihê kirin di zend avesta de. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku jîyane ku em î ro li dûnyê wê dijîn, tenê darêjkeka jîyanê bi gelek cûreyên wê re heya. Lê dema ku mirov derdikeve dervî dûnyê, her wusa, mirovê divê ku bahse gelek darêjkên din ên jîyanê jî bike. Ew darêjkên din ên dervî dûnyê û jîyane dûnyê jî, dervî hişên aqilê jîyane dûnyê na.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênina ser ziman ku aqilê gerdûnê, her wusa, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, weke ´aqilekî kosmikî´ jî, mirov dikarê bahse wê bike. Aqilê kosmikî, ku dervî hişê mirov a, di vê çerçoveyê de li ser zend avesta re weke ku perwerdeya wê jî hat kirin di mejiyê mirov de li ser gotinên ku di zend avesta de hatina ser ziman.

Her wusa, têgînên li ser ahûra Mazda(hûrmûz), ahrîman û zerwan re ku dihên ser ziman, dema ku bi xwandina wan re bahse wan dihê kirin, wê perwerdekirinekê li ser têgînên gerdûnî ên der bîrê re di mejiyê mirov de di çerçoveyek hemdem de bidina çêkirin. Her wusa, hemû têgînên hemdem ên bi aqilî ku bi gerdûnî û hwd, hatina li ser ziman, wê weke

şîroveyna li ser van rewş û gotinên ku weke ku li ser wan re di mejiyan de perwerde kirinek dihê kirin bê. Her wusa, Mîtra, dema ku têgînên xwe dihêne ser ziman, wê di çerçoveya kosmoginîyekê de werêne ser ziman. Her wusa, wê li şûna ku dûnyê bi aqilê re weke sînor werêne ser ziman, wê fezeyê weke sînorê gerdûna hizra xwe werêne ser ziman. Dûnya ku em di wê de dijîn jî, wê tenê weke beşek ji wan dûnyayên ku di wê fezeyê û ankû gerdûna kosmîkî dijn bê.

Her wusa li vir, dema ku dem û rewş bi têgînî dihê dema Zerdeşt, her wusa wê Zerdeşt, bi teorîyeka wê têgîna kosmogenikî bike bi zend avesta re. Têgîna teorîkî ya kirinî(piretikî)a kosmogonikî a zend avesta, her wusa di vê çerçoveyê de berfirehîya wê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê bibîr bike. Li ser zend avesta re, perwerde kirina ku li ser wê re bi gotinan hatî kirin, her wusa, wê pêşketinaka têgînî bi aqilî bi wê re di mejiyê mirov de bi hişî û hîsî bide çêkirin. Her wusa, aqilê kosmogonikî, weke têgîneka ku mirov wê weke der bîrê divê ku werêne ser ziman a. Her wusa aqilê hişî ê salixkirinî ku dibê ya. Lê aqilê gerdûnî ê kosmikî û kosmogonikî, weke aqilê ku mirov divê ku wê fahm bike ya. Ev aqilê kosmîkî û kosmogonikî jî, weke aqilê der bîr, mirov derdixe dervî hişê mirov. Dema ku mirov li wê dihizirê, mirov hundûr bîra xwe weke mezeleka ku mirov di hundurê wê de girtî bê ya. Lê ku ev mezel jî di hundûrê gerdûnê de bê. Dema ku ew mezel, ji her çav aliyên wê ve ku hêtên wê ketin ardê wê weke ku mirov rastî bêsînorîyekê werê.

Ya ku aqilê mirov ê hundûrê hiş, weke ku dike berlêpirsînê de jî ev têgîna gerdûnî a kosmîkî ku bi gotinên zend avesta re ku weke ku bi wan mejî weke ku hatibê perwerde kirin jî bê. Têgîna zend avesta a kosmîkî û kosmogonîkî jî, weke wê fezeyê ji xwe re weke gerdûn û dûnyayê bike mal û malgeh. Her wusa, fahm kirina gerdûnî û têgîna wê, wê di vê çerçoveyê de giring bê ku mirov wê fahm bike.

Fahmkirina têgînê, wê di vê çerçoveyê de giring bê. Her fahmkirin, di aslê xwe de weke ku mirov di vê çerçoveyê de bi têgîna zend avesta re kifş dike, weke ku ´sînorekî´ mirov jî bê. Her wusa, her fahmkirin, weke têgîneka ku mirov piştî ku kir û pê de, ku mirov êdî ji wê derbas bibe ya. Ya ku li vir, weke ku mirov bi teybetî wê hilde li dest jî li vir wê bi giringî ev bê.

Em li vir, divê ku têgîna der hiş, bi giringî li vir wê hildina li dest. Her wusa, dema ku mirov li ser wê têgîna der hiş re dimeşê, her kifşkirina di fezeyê û têgîna gerdûnê de ku bi têgînî ku mirov dike, weke pêpelokeka ku mirov bi wê re bilind dibê ya. Her wusa, her kifşkirin, di

vê çerçoveyê de pêşve çûyîneka. Têgîna gerdûnê, di nava kurdan de di vê çerçoveyê de bi vegotin, çîrok û çîvanokên wan de jî pirr zêde bicih bûya. Her wusa, têgîna ´şahmaran´ li vir divê ku mirov bi giringî werêne ser ziman. Dema ku bahse şahmaran dihê kirin, dihê gotin ku ´ew deh hezar salî ya.´ Her wusa bi wê re jî, dihê gotin ku ´şahmaran, hemû tiştên ku di demê de bûna û buhûrîna û demên ku wê werin û mirov bijî ku di wan de çi hena û bûna û wê bibin, wê dizanî. ´ Ev gotina ku şahmaran hertiştê demên buhûrî û demên ku wê werin ku dizanî´, weke têgîneka gerdûnî jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Têgîna şahmaran, li vir, weke têgîneka gerdûnî jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Jîyane wê, di nava sînorê gerdûnê de ya. Ew ne di nava sînorê hiş de dijî. Şahmaran der bîrê dijî. Û ankû şahmaran der hiş dijî. Yanî, bi gotinaka din, ew dervî fahmkirina mirov a bi aqilê mirov a li dûnyê dijî.

Ev têgîna gerdûnî a kosmogonikî a bi têgîna şahmaran re, her wusa mirov, bi rengê jîyanî ê zend avesta re jî wê dibînin. Her wusa, têgîna zend avesta a kosmogonikî, mirov di vê çerçoveyê de bi jîyaneka gerdûnî re tacîdar dike.

Têgîna gerdûnê a kosmogonîkî, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de weke qadaka mirov li wê bihzirê bê. Her wusa çendî ku mirov bi wê re dihizirê û kifş dike, çerçoveya aqilê mirov û sînorê wê jî berfireh dibê. Li vir, ya ku berfirehîya aqilê mirov û sînorê hiş weke ku dide dîyarkirin, bi têgîna zend avesta re ku mirov bibêje wê têgîna gerdûnê a gelemperî bê. Têgîna gerdûnê a teybet jî, aqilê mirov ê dûnyayî û sînorê hişê mirov a.

Li vir, divê ku mirov, hinekî din jî bi wê re bi fahma xwe re pêde herê. Her wusa, têgîna zend avesta, weke ku vê ji mirov dixwezê ku mirov wê sînorê hişê ê di nava sînorê aqilê mirov ê dûnyayî de mirov xwe negrê. Her wusa, mirov ji wê derbaş bibe. Ew sînorê hundûr hiş ê aqilê mirov, dema ku mirov di vê çerçoveya têgîna der bîrê de dihizirê, weke bendekê, pêş-dîtinekê, ´pêş-bîryarakê´, ´pêş-rastîyekê´ ku mirov di cihê mirov de bi dîtina mirov re zant dike û digirê, xwe dide dîyarkirin. Ji vê aliyê hizirkirinê ve dema ku mirov li Zend avesta jî û zen bûûdîsmê jî dihizirê, her wusa ya ku mirov kifş dike ew a ku dixwezên ku miirov ji nava van sînorên hiş xwe derbas bike. ..

Sînorê hişê mirov, her wusa, di nava têgîna gerdûnê de mirov weke ku di mezelekê de dihêlê. Ev hîskirina bi têgîna zend avesta û zen bûdîsmê re, wê her wusa, weke têgîneka aferîndêrî jî bê. Yanî, bi gotinaka din,

têgîna zend avesta, her wusa der bîra me, nîşanî mirov dike ku mirov li wê bihizirê. Her wusa, mirov, weke ku xwe ji ser hêt biavêjê aliyê din. Dema ku mirovek di zindanê de girtî bê, hertimî dixwezê ku xwe ji nava wê zindanê û çar hêtan rizgar bike û xilas bike. Her wusa, dema ku mirov di vê çerçoveyê de dihizirê, wê têgîna zend avesta, bi têgîna der bîrê re vê têgînê bi me re çê bike. Dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di wê çerçoveyê de dihizirê ku weke ku dema ku mirov xwe ji ser hêt re derbasî aliyê din ê der bîrê kir, mirov wê rastî rewşeka din were. Li vir, ew hizirkirina li wê aliyê din ê hiş ê der bîrê, her wusa, mejiyê mirov hertimî dixwerêne ku mirov li ser wê bihizirê.

Hizirkirina li der hiş, wê di vê çerçoveyê de weke artarnatifa wê têgîna gerdûnê bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Dema ku mirov li nava çîrok û çîvanok û vegotinên civatî ên civate kurd dihizirê, her wusa weke artarnatifa der bîrê, wê têgîna gerdûnê, werê hanîn li ser ziman. Her wusa mirov dikarê vegotin û çîroka civate kurd ´çîroka şahmaran´ li vir bi minaqî bide. Ev çîrok, her wusa, weke çîrokeka ku ne dûnyayî ya. Weke çîrokekak gerdûnî ya.

Aqilê mirov ê gerdûnî, di vê çerçoveyê de weke aqilê ku mirov di nava xwe de dide jîn kirin a. Her wusa, aqilê gerdûnê, dema ku mirov li wê dihizirê, weke ku çawa ku mirov wê dihêne ser ziman, aqilê hişkirî, di nava wê de weke beşna ji wê ên hatina têgîhiştin jî dihê ser ziman. Têgîna zend avesta, her wusa vê yekê bi vî rengî dihêne ser ziman. Bi wê re jî, têgînên weke ên zend avesta, têgînên weke zen bûdîsmê jî, di vê çerçoveyê de armancaka ku derkevina dervî hiş, ji xwe re weke ku kirina armanc. Her wusa di vê çerçoveyê de dikin ku derkevina dervî wê. Dikin ku dervî wê hişê, gerdûnê kifş bike. Her wusa, kifşkirina ji aliyê din ê hiş çi ya, dike ku wê kifş bike. Têgîna kifşkirina li aliyê din ê hiş, wê xwe di vê çerçoveyê de weke têgîneka felsefîkî jî bide dîyarkirin.

Mirov, dema ku wê aliyê der bîrê kifş bike, wê çi di wir de kifş bike? Her wusa, weke pirseka ku wê mejiyê mirov pirr bi têgîna gerdûnê re bide hizirkirin bê. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna gerdûnê, weke têgînaka giring a weke artarnatifa têgîna hişmendiya aqilî yê mirov ê ku hatî pêşxistin a. Her wusa di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê, biaqilê gerdûnê re werêne ser ziman. Aqilê gerdûnê ê ne hişkirî û aqilê aqilî ê hişkirî, her wusa di vê çerçoveyê de, wê bi vê têgîna dûaliteya têgînî ya zendî re xwe werêne ser **ziman.**

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werênina ser ziman ku Têgîna zerd avesta, her wusa, weke têgîneka ku em divê ku ji du

aliyan ve wê hildina li dest a. Her wusa aliyê wê di hundûrî hiş de ku weke aliyê aqilî û hişî ku hatîya têgînkirina. ev alî, her wusa, jîyane ku mriov wê dijî re dihê ser ziman. Lê aliyê der hiş jî, weke aliyê dervî hiş maya, ku mirov dikarê werêne ser ziman. Ev jî, mirov dikarê bi têgîna kosmogonikî a gerdûnê re werênina li ser ziman.

Hizirkirina li gerdûnê, weke rengekî hizirkirinê ku gelekî gelemper û dilperîyê di dilê mirov de çê dike ya. Mejiyê mirov, dike ku wê fahm bike. Lê mejiyê mirov çendî dikarê hemûgir bê. Sînorê meji û dîtina bi wê re heya. Lê li vir, çendî ku dike li ser wê dîtina xwe re hizir bike û hîs bike, bi wê re dike ku bi zêhnî biafirêne û fahm bike. Ev jî, weke fahmkirinaka razber a. Mirov, li vir, divê ku vê yekê jî, werêne ser ziman ku heta roja me, gelek teorîyên di derbarê fezeyê de ku hatina çêkirin hena. Mirov çendî dikarê wan bi azmûn û ceribandinê bike? Ev jî, weke aliyekî din a. Berî çûyina mirov a li fezeyê li ser heyvê û hwd, mirov pêşî bi hiş û aqil û xîyalîya xwe çû. Piştre jî, ew çûyin bi fîzîkî pêk hanî. Her wusa di vê çerçoveyê de jî mirov dikarê li vê afirandina fahmkirina razber binerê.

Têgîna bi gotina fahmkirina razber re ku ez dihênima ser ziman di vê çerçoveyê de ya. Her wusa, mirov, pêşî, xiyal dike. Di mejiyê xwe de diafirêne. Piştre jî, di nava şert û mercên wê de mirov wê dike. Heta roja me, ev çerçova di vê çerçoveyê de hatîya kirin. Divê ku ez hinekî din gotina fahmkirina razber li vir, kûr bikin. Ev gotin, wê karibê, hinek têgînên ku ez dixwezim wan werênima ser ziman bi xwe re werêne ser ziman. Her wusa, mirov, fahmkirina razberê, di vê çerçoveyê de bi têgîna ku mirov ji temen ve ne bi azmûn kirî re dikarê werêne ser ziman.

Xewn, xiyalkirina mejiyê mirov a. Her wusa, sînorê xiyalkirinê di xewnê de tûna ya. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna xewnê, weke aferîndêrîyeka mejiyê mirov a. Ku em mejiyê xwe, di vê çerçoveyê de bi xewnê re bihizirin, her wusa, mirov dikarê xewnê weke xwemalîyeka wê ya giring jî dikarê werêne ser ziman. Xewn, rengê hizirkirina mirov a xwemalî ku mirov bixwe jî ku ew bi tememî fahm nekirî lê ku bi wê re ew sînorê hişê, ku cih bi cih weke ku ji wê di wê xewnê de ku dihê bûhûrîn a.

Bi gotinaka din, dema ku mirov li ser xewnê re dihizirê, weke ku mirov, hinekî der bîrê ya. Di vê çerçoveyê de, hîsek weke ku mirov re çê dibe. Lê bi rastî, mirov dikarê bibêje ku mirov der bîrê ya? Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku xêva mirov di temenê wê dîtina xewnê de heya. Yanî, dîsa di xateka girtî a di xêvê û mejî de ew xewn

dibê. Lê xewn, rengê hizirkirinê ê giring ku dikarê derkeve dervî wê derbîra me. Her wusa xewn, di vê çerçoveyê de weke ku me li vir salix kir, weke ku di bê çerçoveyeka ku di wê gelemperî û gerdûnîya heyînê de ku dijî ya. Bi jîyankirina wê têgîna gerdûnê re, keseyet jî, weke keseyetek gerdûnî, dibe xwediyê wê wateyê.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku ya ku li vir dihê ditin û fahmkirin, weke ku derketina der bîrê, weke keseyetîyê bi rengekî gerdûnî jî dihêne ser ziman. Her wusa keseyetîya gerdûnî li vir, weke ku bi wê der bîrê re derdikeve li holê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna zendê a avesta, wê li vir bi têgîneka keseyetî ku ´xwe ji xwe bûhûrandinê´ re ji wê hişê mirovê heyî ku mirov derbas bibe re dike ku bigihêne wê têgîna gerdûnê. Bo vê yekê, hertimî aliyê din ê hişê ku me di mejî de kirî, dike ku bi hîsî û hwd, li ser wê hiş û aqilê ku me kirî re bike berbîra mirov de. Li ser vê re jî, êdî ku mirov li wê bihizirê û weke ku bi xwezê ku wê hişê derbas bike.

Pêşnîyara Bûda a derbas kirina hiş, her wusa, di vê çerçoveyê de xwediyê wateyekê bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku têgîna gerdûnê, weke li aliyê hişê mirov ê din a, wê hizrê dike ku di serê mirov de çê bike. Mirov, aliyê din ê hiş, yanî der hişê ku bihiş bike. Her wusa li vir, hemû karê hizirkirinê li vir, di vê çerçoveyê de bi hizirkirinê re bike ku wê derbasiyê bike. Her wusa, her tişta ku mirov, weke zêhn û hwd, ku xwe di wê de dît, êdî mirov wê êdî wê derbas nekê. Her wusa, bo vê yekê, her zêhnê ku hatî kirin jî, bûda weke ´lewitîna zêhnî´ hanîya li ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, bi ketina farqê wê zêhnê û ji wê derbaskirinê, di vê çerçoveyê de dihêne ser ziman.

Derbas kirina ji hişê li aliyê wê yên din, wê di vê çerçoveyê de temenê wê bi têgînî di şîroveya zendê a zend avesta de jî xwe bide dîyarkirin. Têgîna zend avesta, li vir, giringa ku mirov hinekî di wê de kûr û dûr herê. Her wusa wê, ew çûyina me, bi keseyetîyeka gerdûnî û di gerdûnê de bê.

Hizirkirina li gerdûnê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku mejiyê mirov li wê hizirîya. Ji serdemên sûmerîyan û bi vir ve, çendî ku aqil pêşketîya, li azmana hizirîya. Li fezeyê hizirîya. Li gerdûnê hizirîya. Her wusa, têgîna çûyina azmana, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de keseyetîya ´yazdan´, derketin û ankû derxistina wê ya li azmana, mirov dikarê weke keseyetîya gerdûnî ya mazin jî werêne ser ziman.

Li azmana, dûnyayên ku hena, di wan demên berê de tevê ku ti kesek

ne çûya azmana, lê di mejiyê xwe de çûya azmana û ew bi wê hizirkirina di mejiyê xwe de re kifş kirîya. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna çûyina azmana, wê weke têgînaka gerdûnî bê.

Hizirkirina li heyvê, li dûnyên din ên li azmana û hwd, û têgîna bi fahma ´hebûna jîyanên din li azmana´, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Ku rast, jîyanên din li azmana hebin, tevî ku heta vê kêlîkê mirovan ew bi şenberî kifşkirina, lê bi têgîn û xîyala xwe mirovê dûnyayî, bi wan re hevnasîn kirîya.

Hizra zendî a zend avesta, di vê çerçoveyê de weke hizreka gerdûnî mirov dikarê bi wê hewnasînê re werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de li ser keseyetek gerdûnî weke ya ´yazdan´ re ew çûyîna li azmana û bi têgîna jîyane gerdûnî re mirov ew bi xwe re kirîya. Her wusa têgîna yazdan divê çerçoveyê de bi têgîna gerdûnê re dema ku mirov li wê dihizirê, hizreka baş ya gerdûnî didêt me. Fahmkirina, wê gerdûnê, heta nûha, ji rengê jîyane ku mirov li dûnyê dijî, gav hatîya avêtin û ew weke ku hatîya xiyal kirin û ankû tasawûr kirin.

Mirov, bi hişê aqilê xwe re wê aliyê din ê gerdûnî ê der hişê, weke ku hîs dike. Her wusa, li ser wê hîskirinê re li wê dihizirê. Ev têgîna ku weke hizreka metafîzîkî ya, di vê çerçoveyê de weke hizreka giring a ku mirov dide hizirkirin a. Her wusa hizirkirina mirov a di mejiyê mirov de di vê çerçoveyê de bi wê hîsê û têgînê re pêş dikeve.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima li ser ziman ku têgîna perwerdekirinê a zendê jî divê ku mirov li wê bihizirê. Ev têgîna perwerdeyê, weke ku der hişê mirov bi mirov re perwerde dike bo kifşkirinê û bo ku bihiş bibe bi mirov re. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastîya perwerdeya zendê, werêne ser ziman. LI ser perwerdekirinê re gotinek, di roja me de pirr zêde dihê bikarhanîn. Dihê gotin ku ´mirov, bi perwerde kirinê bi zane dibê.´ Di çerçoveya vê gotinê de ez dixwezim ku vê jî werênima ser ziman ku tişta ku mirov ne di hişê wê de bê, mirov dikarê wê bihiş bike? Li vir, dema ku mirov, nezanînê bi perwerde re bizane bike bê, wê çaxê, ew aliyê din ê hişê ku weke der hişê, ew jî hingî, weke ku mirov wê di vê çerçoveyê de bihiş dike. Her wusa weyneka perwerdeyê û perwerde kirinê di vê çerçoveyê de êdî derdikeve li holê.

Têgîna zendê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku bi me wê der hişê dide bihişkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de rewşa ku dihê ditin ev a. Mirov, li vir, ji ya zane bi ber ya nayê zanîn ve

gavê diavêje. Wê dike ku fêr û fahm bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi ber wê ve diçê. Zerdeşt, di vê çerçoveyê de giringîyê dide hizirkirinê. Her wusa, têgîna ku ew dide mirov, di vê çerçoveyê de ew a ku mirov ji ya ku mirov bihişkirî, li aliyê wê yê din a ne hizirî bihizirê.

Têgîna ku mirov, wê karibê xwe bigihêne her tiştî bi aqilê xwe û ankû wê nikaribê xwe bigihêne hertiştî, wê bi aqilî û felsefîkî, wê êdî piştî ku aqilê felsefe pêşket û pê de, wê **zêdetirî bibe**.

Aqilê mirov, bi dîtinê re bidest pêşketina xwe dike. Her wusa, dîtin û aqil, weke du heyînên ku hevdû diafirênin jî, mirov dikarê wan werêne ser ziman. Em li vir, divê ku vê yekê jî werêne ser ziman ku ´zêhnê di hundûrê hiş de´, li vir, weke gotinaka ku em dikarin li ser aqil û dîtina hişkirî re werênina li ser ziman. Li vir, em dema ku li gorî têgîna zendê a zend avesta dihizirin, ev întîba û têgîna ku mirov dema ku bihizirê mirov wê bigihijê ´zêhnê der hiş´ ku wê bihiş jî bike. Her wusa li vir, ev weke aliyekî giring ê ku mirov di vê çerçoveyê de bi wê têgîn û keseyetîya gerdûnî re ku karibê kifş bike ya.

Zêhnê der hiş, weke zêhnê gerdûnî ê ku bi întîba û têgîna ku ew heya lê ne hatîya bihişarî û hişkirin, ew dihê ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de ´zêhnê bihişar´, weke ya salixkirî û ku mirov bi wê bizane ya, mirov li vir wê dikarê werêne ser ziman.

Li vir, di nava xate têgîna zend avesta de jî û piştre bi têgînên weke zen bûdîsmê ku pêş dikevin re jî wê were ser ziman ku ew zêhnê der hiş, ku divê ku armanc bê ku mirov xwe bigihêne wê. Her wusa, ev jî, wê bi wê bibe ku mirov pêş-dîtin, ´pêş-aqil, pêş-bîryar, û hwd ku xwe rizgar bike re mirov dikarê xwe bigihênê de. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna der hiş, wê têgîneka bi yeqînî bi xwe re bihawêne û werêne ser ziman ku dervî wê hişê ku me kirîya, wê hişekî din hebe ku mirov wê karibê wê bihiş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman ku weke ku dema ku mirov ji wê zêhn û hişê me yê ku bûyî ku mirov ji wê derbas bike, mirov wê weke ku li ser hêt re biqavizê li aliyê din û bi der hişê re weke ku me bi hişê re hevdîtin kirî, mirov wê bi wê re jî hevdîtinê bike.

Her wusa, li vir, hertimî, nepenîyek li şûn hiş di vê çerçoveyê de heya. Ev nepenî, weke mistisme têgîna zendê jî mirov dikarê wê werêne ser ziman. Her wusa, têgîna zendê, di vê çerçoveyê de bi têgîneka gerdûnî xwe dide dîyarkirin. Dema ku em bi hişê wê re li ´der hiş´ê wê jî ne hizirin, wê weke ku di hizirkirina wê de kêmesîyek bi hizirkirina me re biafirê, mirov di mejiyê xwe de digihijê întîbayekê.

Têgîna gerdûnî a zend avesta, em dibînin ku mohra xwe li vegotinên civatî ên civate kurdistanî jî xistîya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna gerdûnî a zendê, her wusa, wê bi berfirehîya xwe ya ku heya bi têgînî, her timî bi aliyê xwe ve mejiyê me û hizirkirina me bide kişandin.

Her wusa, ev rengê kişandinê, her wusa wê bi têgînî, weke ku mirov di nava reng û mengna de bide birin û hanîn. Her wusa, têgîna gerdûnê, ew têgîna kişînê a berfirehiya wê, dema ku ez li wê dihizirim, têgîna kişînê a li fezeyê dihê berbîra min. Aliyekî vê rengê kişîna gerdûnî heya ku mirov bi xwe re dide kişandin. Li ser wê kişînê re jî, dike ku mirov bide hizirandin.

Fahmkirina wê têgîna kişînê a di têgîna berfirehîya gerdûnê de, li vir, weke aliyekî afrîner ê der hiş ê bihiş jî mirov dikarê wê werêne ser ziman. Çendî ku mirov bi wê re û bi wê de diçê, mirov weke ku derdixe li hiş. Ev hîs û întîba, wê bi têgîneka hizrî û felsefîkî re di mejiyê mirov de bi afrînerîyekê hertimî bide hizirandin û afirandin. Ev jî, weke afirandinaka gerdûnî ya bi têgînî mirov dikarê wê bi nav bike û werêne ser ziman. Her wusa, li vir divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna gerdûnê, her wusa, ardnîgarîya wê, weke ku hiş û ankû weke ku zend avesta bi wê întîbayê dide me ku ew zêhnê der hiş a. Mirov, çendê ku bi wê re kifş dike û bi wê de diçê jî, mirov hişkirinê û fahmkirinê di wê çerçoveyê de fahm dike.

Dema ku mirov li vê dihizirê, her wusa, mirov wê rastiyê jî fahm dike ku Bûda ji ber çi li wê der hişê, weke ku li hiş bihizirê hizirî ya. Her wusa, Zerdeşt jî, li wê der hişa gerdûnî weke ku li hiş bihizirê hizirîya û kirîya ku wê bihiş bike. Hewldana fahmkirinê, di vê çerçoveyê de bi têgîna zend avesta re weke ku di rêwîtîyekê de ya. Bo vê yekê ya, ku zêhnê mirov ê bihiş ê ku heyî, weke astengîyeka ku mirov li wê dialiqê jî ji di vê çerçoveyê de hatîya hanîn li ser ziman. Zêhnê bihiş, di vê çerçoveyê de, weke çerx û ankû zivreka ku mirov di nava wê de xwe dûbare dike jî dihêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî di dewama wê de werênina li ser ziman ku zêhnê mirov ê ku bûya, piştî ku bûya, weke ´pêş-dîtin´, ´pêş-bîryar´, ´pêş-gotin´ û hwd jî, mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Têgîna zend avesta, her wusa, di vê çerçoveyê de bi têgîna gerdûnê re dike ku ji wê derbasbûnê bide çêkirin. Bûda, hinekî din jî bi wir de çûya û zêhnê bihiş ku bûya, weke ´lewîtîna zêhnî´ jî hanîya li ser ziman. Her wusa bûda, bi têgîna der hişê li hiş dihizirê. Ev têgîn û rengê

hizirkirinê, Mîtra, hinekî pêşxistibû û bi pergal jî kiribû. Dema ku dem tê dema Zerdeşt, wê zerdeşt şîrove û teorîya wê têgînê bi hişî bike. Her wusa, li ser vê re jî, êdî hizirkirin û pêşxistina aqil dibê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werênina li ser ziman ku têgîna gerdûnê, divê çerçoveyê de weke asta hizirkirinê ya herî bilind a.

Fahm kirina têgîna gerdûnê, her wusa wê mirov hertimî çendî ku bi fahmkirinê re pêşketîya, gav bi gav hizirkirina mirov jî bi pêş de biriîya. Hizirkirina zend avesta û hizrên wê, weke têgînna perspektifî ên di çerçoveya hizirkirina gerdûnî na. Aqilê mirov, ji ber ku di vê çerçoveyê de hertimî dihizirê, her hizirkirina ku kir, li ser wê dike ku hizirkirina xwe ya bilindtir bike. Ev jî, weke hîseka ku aqil û ankû hişê mirov, dike ku xwe bi ber gerdûnê ve bidiyê de ya.

Hişê mirov, her wusa, weke refaranse wê, hertimê li ya ´der hiş´ dihizirê. Dike ku wê bihiş bike. Wê kifş bike. Vê jî, dike ku gav bi gav bi têgîneka ku hizra gerdûnê bi aqilê re ji xwe re kirî ardnîgar re dike.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têgîna zend avesta, di vê çerçoveyê de weke têgîneka hişî ya dike ku der hişîya gerdûnê bihiş bike û fahm bike. Li ser vê rastîyê re aqilê mirov bi têgînek gerdûnî bidest hizirkirinê kirîya. Têgînên zend avesta û her wusa ên zen bûdîsmê û hwd, weke têgînên ku mejî û aqilê mirov di vê çerçoveyê de dikin ku perwerde bikin in. Bi fahmkirina gerdûnî, wê têgîna der hişî, bi xwestin ku were bihişkirin. Her wusa, têgîna zêhnê bihişar´, di vê çerçoveyê de bi afrînerîyekê têgînî a gerdûnî re li ser şîroveya zendî re dihê **pêşxistin**.

Têgîna gerdûnê, her wusa weke têgînekê wê di kifşkirina hizrên mirov û hizirkirina mirov de jî xwediyê bandûrê bê. `Hizra destpêkê´ û ankû ´zêhnê destpêkê, her wusa, di vê çerçoveyê de care pêşî bidest kirina hizrê û hizirkirinê re dihê ser ziman. Lê ne bi rengê weke ku min hizrek bi dest xist re ev têgîna hizra destpêkê xwe dide dîyarkirin. Her wusa, li ser tevger, kirin û hwd re bi nerînê re xwe dihêne ser ziman.

Têgîna kirin û hizir, her wusa zêhnê bihiş û ê der hiş û hwd, bi têgîna dûaliteya jîyanî re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku çendî ku têgîneka dûaliteyî heya jî, weke ku hin bi hin peresendina wê bi ´yek´ re dibê. Di nava têgîna dûaliteye ´birahman û atman´ de wê birahman derkeve li pêş. Her wusa, hevgirtin û gihîna hevdû ya atman û û birahman, wê şîroveyeka nû ji ya ahrîman û ahûra Mazda a başî û ne başîyê cûdatir pêş bixe.

Li vir, li ser vê rastiyê re wê êdî bi têgînî hewldana fahmkirinê

derkeve li pêş. Têgînên ´zen´ê, wê her wûsa tevgeran ji nivîsên nivîskî zêdetirî derxina li pêş. Her wusa kirina di jîyanê de wê li pêşti bê. Di vê çerçoveyê de weke ku bi zen bûdîsmê re dihê ditin, wê tenê gotinên têgînî ên refarans werina hildan li dest û ji wê êdî bidest hizirkirinê bê kirinê Gotinên bûda û hwd, wê rê û aliyê hizirkirinê, weke ku wê bidina dîyarkirin.

Li vir, dema ku mirov li têgîna zen bûdîsmê dinerê, her wusa, bi têgîna kifşkirinê re wê her wusa hanîna li ser ziman bibe. Zend avesta jî, di vê çerçoveyê de dihêne ser ziman. Her wusa, zend avesta, bi wê têgîna xwe ya ku mirov bi têgîna gerdûnê e bihizirê û bi wê hizirkirinê re bike ku kifş bike re, wê temenê hizirkirina li jîyanê biafirêne.

Aqilê mirov, ji ya dizanê ber bi ya nayê zanîn ve di vê çerçoveyê de dihizirê. Her wusa, di çerçoveya têgîna zend avesta de dema ku mirov dihizirê, ew têgîna ji zêhnê bihiş ber bi aliyê din ê zêhnê bi hiş yê der hiş re wê hizirkirinê dide kirin.

Li vir, têgîna aqilê zelal, divê ku mirov bibîr bike. Bi vê rengê hizirkirinê ê ji zêhnê bihiş ber bi aliyê din ê zêhnê bi hiş yê der hiş re wê hizirkirinê dide kirin û hwd re wê li ser têgîna aqilê zelal re were kirin. Ankû, vê têgîn û gotina ´aqilê zelal´, mirov bi rengê ´hişê zelal´ divê ku bixwêne. Bo vê hişê zelal, her wusa, ji xwestekan dûrketî û azwerîya mirovî ku heya ku mirov xwe ji wê rizgar kirî bê, wê bi wê re xwe rehet bike. Her wusa bigihêne, hişê zelal jî.

Li ser zêhnê re ya ku dihê ser ziman, ew a ku mejiyê mirov, berî fahm bike, gotinan û awayan dihilde hundûrê xwe. Dema ku aheng di nava laş û gîyanê de bû, wê hingê, bi wê re di çerçoveya têgîna kirde û tiştê de wê mirov bigihijê têgînaka ji hevdû cûdakirinê a jîrî. Dîtina rast zanîn û helweta rast jî nîyeta. Zêhn, di aslê xwe de di nava valahiyê de ya. Lê ku zêhn nebê jî, wê darêjk, ti tiştî newêne ser ziman. Dema ku darêjk jî nebê, wê zêhn jî nebê. Her tiştê di nava hevdû de buhûrîya û bi hevdû ve girêdayî ya. Bi rêya dîtin, bêhn, bihîstin, destlêdan û ziman re û her wusa bi fêrs(´yeti´)a mejî re hiş diafirê. Lê mirov nikarê weke ´rastîyan´ herê bike. Her wusa di dewama wê de, li ser têgîna ´ezîtîyê´ jî ya ku dihê gotin ku ´di aslê xwe de ezîtî nîn a.´ Darêjk jî, ne rastî na. Dema ku darêjk nebê, wê zêhn jî nebê. Bo vê yekê jî, ji ber ku zêhn nikarê xwe dervî darêjkê werêne ser ziman, ew jî valahîyek a.

Em dema ku li zêhnê dihizirin, her wusa weke têgînekê li pêşîya zêhnê çi heya, weke ´valahîyekê´ xwe dide dîyarkirin. Li ser vê gotin û têgîna ´valahîyê´ re dema ku mirov dihzirê, her wusa, weke aliyê

destpêka têgîna nirxî, ya bihişkirinê, mirov bi wê re dihêne ser ziman. Lê ew zêhnê ku mirov bi dest xistîya, çi di wê de heya, li vir,bi têgina valahiyê re bersiva wê dihê dayîn. Vê gotinê, dema ku mirov bi sîmset bike, weke mirov bibêje ´hiş nîn a´, û hwd, wê têgînekê li ser wê gotina valahiyê bê ku dihê hanîn li ser ziman bê.

Her wusa, dema ku mirov li ser zêhnê werêne ser ziman, têgîna salix nekirina zêhnê, li vir, wê xwe bi wê re werêne ser ziman. Di dewama wê de, têgîna salix nekirinîya ´nirxê´, wê li vir, bi wê re balê bide kişandin li ser ezmûnê û fêrê û fêrbûnê. Li vir, têgîna ´tişt di aslê xwe de nîn a´, wê weke têgîneka ku wê neyînê û gotina valahiyê bike bi hiş zêhnê re werêne li ser ziman.

Têgîna zêhnê, wê weke mijaraka giring a ku mirov di vê çerçoveyê de pirr zêde serî li ser wê biwastêne bê. Her wusa, pirsa fahmkirina zêhnê, wê li ser wê were sekin in. Minaq, şagirtekî Tao, ji wî dipirsê ku ´zêhn çî ya´, ew dibêje ku ´dema ku ez birçî bim xwarinê bixwûm û ku wastaham razihim´ a. Di vê çerçoveyê de kirinên mirov ên ku dihên kirin bo domandina jîyanê de, li ser bi hişkirinên wan re salixkirina zêhnê dikê. ...

2005. Cizira bota, kurdistan, Abdusamet Yigit

,,,,,,,,